

XWEZAYA CIVAKÎ Û ŞARISTANÎ

A- CIVAKA XWEZA

- 1- Civak Çiye?
- 2- Mirov û Civakbûyîn
- 3- Avabûn û Pêşketina Civaka Exlaqî-Polîtîk û Zihniyeta Wê

B- ŞARISTANIYA NAVENDÎ

- a- Weke Têgîn û Teorî Şaristanî
 - 1- Bajar, Çîn û Dewlet
 - 2- Şaristanî
 - 3- Desthilatdarî
 - 4- Desthilatdariya Hegemonîk a Navendî
- b- Civaka Hiyarerşîk-Dewletparêz, Zayîna Civaka Koledar
- c- Di Şaristaniya Koledar de Bîrdozî, Çîn, Bajar û Dewlet
- d- Serdema Şaristaniyên Koledar
 - 1- Şaristaniyên Misr û Sumer
 - 2- Şaristaniyên Greko-Romen
- e- Civaka Dewletparêz a Feodal-Civaka Koletiyê ya Stewiyayî

XWEZAYA CIVAKÎ Û ŞARISTANÎ

DESPEK

Reva ji rastiya civakî, ji texmînan jî wêdetir zehmet e. Bi taybetî, eger mirov bi nijad û kokê, bi civakê ve girêdayî be, ev rastî hê wisa ye. Pêşbirka pêvajoya civakîbûnê bi dayikê re, li derdora heft salî dest pê kir û bi gotina gelêrî heta heftê salî wer diçe. Bi awayekî ilmî û zanistî jî hatiye tespîtîkirin ku dayik hêza bingehîn a civakîbûnê ye. Gunehê min bi xwe yê yekemîn ew bû ku min ev mafê dayikî bi guman dît û min pir di temenekî piçûk de biryara civakîbûna xwe da. Li gorî tespîtên dawî yên ilmî, di gerdûna me ya bîst mîlyar salî de civaka mirov bi awayekî taybet afirandiye, minê curet û cesaret bikira bê efendî û dayik bijiyama û ev mijareke bi serê xwe hêjayî lêkolînê ye. Eger min guh bida hişyariyên diya xwe û hewldanên wê yên fetisandinê li ber çav bigirta belkî rê li serhatiyên min ên trajîk venebûna. Lê belê dayika min, semboleke dawî ya bermahiya xwedawendên hezar salan bû ku hem diqediya û hem jî bermahiyeke neçar bû. Ez bi wê zaroktiya xwe hem ji vê sembolê netirsiyam û hem jî min hewceyî bi hezkirina wê nedît ji bo ez xwe azad his bikim. Lê min dizanîbû şertê jiyana min bi parastina namû"s û şerefa wê dibe, min ev yek jî ti car ji bîr nekir. Minê şerefa wê biparasta, lê bi awayekî min çawa rast dizanîbû. Piştî ku min ev ders ji xwe re derxist, êdî dayika min ji bo min tinebû. Ew bermahiya xwedawendan li bala min nebû û min hîç meraq nedikir ji bo min çi his dike. Veqetîneke zalimane bû, lê rastiyeke bû. Ez nizanim kehanetên wê bûn yan jî nifirên wê bûn, gotinên wê di kêliyên giran ên trajîk de timî bi bîr dihatin. Gotinên wê rastiyeke mezin bûn, hozanekî hêja jî nikarîbû tespîtên wer bikirana. Rastiyeke wê ya mezin jî ev bû; 'Tu bi hevalên xwe pir ewle yî, lê tê tenê bimînî.' Lê rastiya min jî hebû, minê bi hevalên xwe re civakîbûn ava bikira.

Çîroka min a jiyaneke bi vî awayî dest pê dike. Eger diya min bixwesta jî jiyaneke wê ya bida min nebû. Ji mêj ve hatibû belavkirin. Ew li qulpek an jî misteke jiyaneke digeriya, bi xwe ji dest

revandibû, lê ji bo bide min dixwest. Her çenda çîroka bavo cuda be jî ji ya wê dûr nebû. Min rastiya malbata xwe, her tim weke bermahiya klanek xwe ferz dike, lê ji hêzketî, belavbûyî û mîrateyeke ti îdfaya xwe nîne, dît. Civaka gund û civaka dewletê ya fermî a bi dibistana seretayî ket jiyana min, ti car dilê min lê germ nebû. Jixwe min pir tişt jî fêm nekiribûn. Ya xuya dikir ew bû ku min zanîngeha ilmê siyasî ku dihat naskirin û kevin bû, heta sinifa dawî, bi serketineke mezin xwendibû. Encam ew bû, qabîliyeta hînbûnê derbeke xedar a mirinê xwaribû. Paşê min dibistana şoreşê hilbijart ku ew jî mîna kevirê aşekî bêrehim bû, jiyana dihêra.

Şertê hebûna cinsê mirov civat e. Ji cinsê prîmat (famîlya herî nêzîkî mirov) yê beriya xwe veqetiyaye û bi civatê bûye mirov. Ev tespît a herî nêzî rastiyê ye, ji aliyê Ilmê Civakî ve tê qebûl kirin. Ferdê bi tenê û jiyana bi civat, çiqas ji hev bêne kirin bila bêne kirin, bi teorîk îspat a wê zehmet e. Ji ber ku ferdê bi serê xwe nîne. Dibe ku ferdê civaka wî hilweşiyayî hebe, lê hîç nebe ew ferd bi bîranînên civaka xwe ya hilweşiyayî li ser piyan dimîne. Ew bi wan bîranînan jî ji bo kêliyê dibe civakî. Cinsê mirov, bi temamî hêza xwe bi asta têtîliya xwe ya bi civatê re bi dest dixê. Hejar û qelsxistina ferd, şewazê herî hov ê kolekirinê, tenê hiştin, tecrîd û îzolekirinê ye. Keriyên koleyan, gundiyên serf, karkerên li bajaran dîsa jî civat in. Car caran îsyana dikin û hebûna xwe bi bîr dixînin. Li aliyekî din, tenêtiyê dijwar hîn dike. Di dîrokê de pêvajoya sulûk û înzîwayê ya hemû zana û peyxemberên navdar vê rastiyê nîşan didin.

Ferdîyet heta tu bibêjî têtîneke bi nakok e. Aliyekî rûyê wê li dijî civakê heye wek xelesa zincîrê ya jê bibe û serbest bikeve. Em ji rêzik û pîvanên civakê yên ne bi zorê re dibêjin exlaq. Ferdîyet zorê dide vî exlaqî. Ya rastîn di şaristaniya Ewrûpayê de ferdîyet bi qelskirina vî exlaqî pêş dikeve. Di şaristaniya Rojhilat de serdestiya civakê li pêş e, lê di civata şaristaniya rojava de ferd li pêş tê. Ji ravekirin û bi navkirina ferd a bi vî awayî du encamên cuda tên bi destxistin. Ferdê serdest û mijok derdikeve tebeqa împaratoriye, ferdê mehkûm û tê mijandin jî koletiyeye dijwar dijî. Pir xweber û tesaduf nîne, ji koletiya dijwar a sîstema kapîtalîzmê ku li gelemperiya civakê belav kiriye, di sedsala 20. de rûyekî hovane derdikeve holê. Pergal û sîstema ew çend bi efendiyan tê meşandin ku ji nirxên xwe yên bingehîn bûye, ji hêrsa xwe ya kar û qezencê, dikare her hovîti û dînîtiyê bike.

Eger gunehkî min hebe, ew jî ewe ku min jî hinek ji mîkrobên çanda şer û desthilatiyê wergirtine. Wexta ji bo azadiyê, desthilatiya dewletê û şer mîna fermaneke Quranê bi bawermendî hat fêm kirin, ezê jî tevî lîstîkê bibûma. Hema hema her kesê li ser navê bindestan rabû û têtîkoşiya, nekarî xwe ji vê nexweşiyê xilas bike. Li ser vî hîmî, ez ne tenê li hemberî sîstema serdest, her wiha ez li hemberî Têtîkoşîna Azadiyê ya min her tiştê xwe ji bo wê danî holê jî gunehkar im. Ezê di vê mijarê de rexne lixwegirtinê ne tenê bi teoriyê, ezê di pratîka esîl a tenêbûna xwe de heta dawiyê bimeşînim. Lê sîstema ku civak û gelek bi zorê û hîleyan ji xwebûnê derxistiye, wê çawa xwe bide efûkirin. Eger mehkemekirinê adil bibe, divê li îdeayên her du aliyên jî were guhdarîkirin û li gorî wê biryar were dayîn. Mehkemekirineke têtîliya xwe ji zanistê qutbûyî ti car nikare adil bibe. Eşkere ye, Ilmê Civakî wê sîleha min a bi tenê be, ezê serî lê bidim. Ez bi qasî ku xwe pê rohnî bikim, ezê karibim li ser rêya rast bimeşim ku ev jî yek ji şert e, ji bo mirov bi şeref û rûmet bibe.

Avahiya agahî-zanîne ya sîstema dinya kapîtalîst, herî kêr bi qasî amûrên danehev-hilberîn û desthilatdariyê di nav krîzê de ye. Ji ber ku xwezaya avahiya zanîn-agahiyê derfet dide guftûgoya azad, li ser hêmanên krîza zanistî îmkana şîroveyeke berfireh pêşkêş dike. Rola agahî-zanîna di nava civak û desthilatdariyê de bi ti demê qiyas nebe dikare xwe bigihîne asteke maneyê. Amûrên agahî û înfomatîkê yên jiyana civakî şoreşeke dîrokî pêk tînin. Pêvajoyên şoreşî weke buhranê bi xwe bi rola gera li rejîmên heqîqetê radibin. Hegemondarî bi tenê li qadên danehev, hilberîn û desthilatdariyê bi cih nabe; di qada zanîn-agahiyê de jî em li têtîkoşîneke dijwar a hegemonîk şahidiyê dikin. Di qada zanîn-agahiyê de ti avahiya hilberîn-danehev-desthilatdariyê xwe rewya nekiribe demeke dirêj nikare hebûna xwe mayînde bike.

Zanistên pozîtîv ên heta dema nêz hukimraniya xwe dewam dikirin, çawa ku tên nîşandan xwedî perspektîfa antî-metafizîk û antî-dîn nînin, herî kêr bi qasî têtîgînên metafizîk û dîn xwedî asteke metafizîk û dînî ne, ev rastî êşkere bûye û tê guftûgokirin. Serketina zanistên xwezayê yên dikin malê civaka Yewnan a Klasîk û dema Rohnîbûnê ya Ewrûpayê, di himbêza zanistên xwezayê bi xwe de derbên herî girîng dixwe. Têtîgihîştina li ser xeteke rast timî pêşveçûn aliyê herî qels û lawaz ê zanistên pozîtîvîst e. Ji ber ku mirov nikarin armanc û avahiyeke bi vî rengî ya

gerdûnê tespît bikin. Çi dinya jêr-atoman, çi gerdûna kozmolojîk, nikarin ji dualîteya çavdêrî û ya çav lê tê gerandin rizgar bibin. Ji ber ku serwextbûna mirov jî di çarçoveya vê pêvajoyê de ye. Nikare pêşbîniya rola wê derkeve derveyî çarçoveyê bike. Potansiyela bê sînora cudabûnê bi xwe hewcedariyê bi şîroveyan nû dibîne.

Sosyoloji avahiyê wê ya zanîn-agahiyê ya navend Ewrûpayê heye. Çawa ku hewesdarên zanista pozîtîv ên fizîk, kîmya û biyolojiyê civakê jî diyardeyek bi heman rengî dihesibînin, bi heman awayî sosyoloji jî nêzik dibe û ji îddîayên bi vî rengî wêdetir naçe. Civaka mirov xwediyê xwezayê gelekî cuda ye. Çawa diwêrin wê weke objeyê bigirin dest û li ser rawestin. Nêzikatiyê bi vî rengî berevajî yeqînan wê rê li ber rohnîbûnê ne, wê li rê li pûtbûnê çor veke û nikariye xwe ji vê rizgar bike. Gavavêtinên felsefeyê yên îdeologên Elman ên ji bo dewletên neteweyên avahiyên agahî-zanînê bigihînin, zanista polîtîka ekonomiyê ya îdeologên Ingilîz û sosyolojiya filozofên Fransî her yek ji wan amûrekî rewakirinê yê mekanîzmeyên danehevê yên sermayeyê û desthilatdariyê ne. Guftûgoyên zanistî yên roja me ya îro vê rastiyê têra xwe eşkere dikin. Li gorî analîza dawî felsefeya Elman, polîtîka ekonomiya Ingilîz û sosyolojiya Fransî ji milliyetgiriya dewleta neteweyê ya mezin dibe xizmet kirine û nikarîne xwe ji vê yekê rizgar bikin. Ev sosyolojiyên bi tevahî navend Ewrûpayê ne, em bi hêsanî dikarin bibêjin avahiyên zanîn-agahiyê yên sîstema dinya kapîtalîst ên navend Ewrûpayê ne.

Lê gotin û destnîşankirina van ras anî derneketin holê. Ekoleke din a dijber teoriya wan a îzafiyeta zêde ye. Ne tenê bûn avahiya agahî-zanînê ya sîstema dinya kapîtalîst, belkî jî ji ber ferdparêziya xwe ya zêde, em dikarin bêjin wan ji kapîtalîzmê zêdetir ji ferdparêziya wê re xizmet kirin. Nêzikatiyên anarşîst jî di nava vê de cih digirin. Rexnekirina kapîtalîzmê û di gotinê de gelekî dijbertiya wê, weke ku gelek caran tê dîtin mirov dixêrê xizmetkariya wê. Di vê de jî bi awayekî bingehîn nêrtina paradîgmâtîk, şaşî û kêmasiyên di avahiyên agahî-zanînê de bandorê dikin û rê li vê yekê vedikin.

Ne zanistên fizîkî bi qasî ku têne gotin bi xwezaya fizîkî re (kîmya û biyoloji jî di navê de ye) girêdayî ye, ne jî zanistên ji wan re beşerî têne gotin weke wêje, dîrok, felsefe, polîtîka ekonomiyê û sosyoloji bi tenê bi xwezaya civakê re têkildar in. Herdu zanist dikarin di têgîna zanista civakî de bigihîjin hev û mirov dikare vê erênî bibîne. Ji ber ku her zanist divê civakî be.

Li ser danasîn û terîfa zanista civakî lihevkerin pirsgrêkê çareser nake. Ji vê jî ya girîngtir ew e, wê çî weke modela bingehîn were girtin, bi gotineke din di analîzkirina civakê de kîjan komîk, yeke an jî şaneyê esas bê dîtin. Eger mirov bibêje “Yekeya bingehîn bi tevahî xwezaya civakî ye”, ev yek ji bo zanista civakî zêde maneyekê îfade nake. Ji nava bêhejmar têkiliyên civakî yên girîng neqandî ji bo nêzikatiyê manedar a teorîk tercîha pêşî ye ku divê were kirin. Ew yekeya civakî ya were hilbijartin çiqasî giştî rave bike ewqasî wê manedar tiyan pirsgrêkê çareser nake. Marks û Engels weke fikra dijber derketin, lê têra xwe eşkere bûye ku sosyalîzma wan an jî sosyolojiya wan şîroveyekê herî seresere û çor (vulger) a civakê ye. Tevî hemû îddîayên wan ên dijber, ji lîberalîzmê -îdeolojiya fermî ya kapîtalîzmê ye -zêdetir ji kapîtalîzmê re xizmet kirin û nikarîbûn xwe ji vê rizgar bikin. Em vê yekê bi sosyalîzma pêkhatî, bi ekol û tevgerên demokrasîya sosyal û rizgariya neteweyî, sîstemên dewletan têra xwe dikarin fêhm bikin. Tevî rêûresma wan a têkoşînê ya gelekî esîl, hem jî li ser navê neteweyê û çînên bindest ketina wan a vê rewşê, ji nêz ve bi avahiyên wan ên zanîn-agahiyê ve têkildar e. Avahiyên agahî-zanînê yên xwe spartîne, tevî aliyên wan ên erênî û neyênî tevahî dijberî xwestekan encam dane. Eger di avahî û paradîgmayên wan ên bingehîn de qusûrên ciddî û şaşiyên zincîrwarî nebûna, encamên bi vî rengî bi hês bibe.

Sîstemeke ev çend bandor li civakê kiribe, wê hilweşandin û texrîbatên wê yên xwezayê neyên ji bîrkirin. Helwesteke femînîst û ekolojîk wê karibe me bigihîne jiyana civakî ya xwezayî. Yek ji mijarên sereke divê baş were ravekirin, alternatîfa polîtîk a gelan demokrasî ye. Ev ji bo destnîşankirina çareseriyê girîng e. Globalîzm, piyasa serbest a mal ku wek fetîşîzmekê pêşkêş dike, mîna alternatîfê bi tenê dixemilîne û datîne pêşîya me, ya rastîn bi vê yekê, dizek û desteserkerê berê ye. Emê jî bi vê zanebûnê, alternatîfa xwe ya demokratîk û ekolojîk hê jî rave bikin û ala jiyana xwe ya nû li ba bikin. Emê bi vê yekê, îdealên wekhevî û azadiyê yên di dîrokê de zêdetir rojane bi cih bînin û bijîn, di heman demê de emê îspat bikin ku hewldanên di vî warî de têk neçûne. Çawa ku di xwezayê de ti tişt tine nabe, ti nirx û buhayên ji bo civakê jî tine nabin û naçin.

Di parêznameyê de ez ji nû ve li ser rastiya civakbûyînê rawestiyam, ev yek bi ponijandina min a felsefî ve têkildar e. Felsefe wek Ilmekî Civakî divê mîna pêvajoya zayînê rola xwe îro jî bilîze. Li dijî ilmê bûye desthilatdar vegera li felsefeyê şert e ji bo civaka azad derkeve. Demokrasiyek xwe nespêre felsefeyê, bi hêsanî dikare ji rastiya xwe dûr bikeve û di destê demogogan de bibe amûrekî zalimane ji bo rêvebirina gelan. Di dîrokê de bêhejmar mînakên vê rastiye hene. Ji bo pêşî li vê were girtin, divê aliyek etîk û aliyek jî zanist têkoşîna siyasî were meşandin. Bi vê berpîrsiyariyê, em dikarin ji krîza sîstemê bikevin meşa jiyane ya xwe dispêre azadî û wekhevîyê û dîsa bi vî awayî em dikarin jiyana li ser hîmê wekhevî û azadiyê biafirînin.

A- XWEZAYA CIVAKÊ

1- Civak çiyê?

“Civakbûn mercê hebûna curê mirove. Bi ji curê prîmat (Famîlya herî nêzî mirov) yê beriya xwe qutbûnê buyîna mirov, bi asta xwe ya civakbûnê rastiya herî nêzî zanista civakî ya ser hespî diçeye.” Rêber APO ku mirov weke mîkro kozmos pênase dike, di berhema xwe ya binavê Parastina Gelekê de bi danasînên kirî, bi tevgera ji gûherîn û vegûherînên di rastiya cakî de tîn jiyana kirin, li ser encamên gihiştîyê, danasîna kes yan ji civakekê pêktîne.

Civak weke têgeh danasînek razbere (soyut). Di bîngeh de ya ku jibo vê danasîna razber misogerî dide qezenç kirin, têkiliyên mirovan dinavbera xwede saz kirineye. Taybetmendîya herî girîng ya mirov weke curek ciyewaz di gerdûnê de hebûn bibîne, qazanç kirina hêza wate û zanistê ye. Bi wate kirina tiştên (nesne) ji dervey xwe, ji tevgerîna van watekirinan gihiştina encamên nu, bi gotîneke din ked dayîn taybetmendiyek ya xweserê mirove. Têgîna zanîne, weke encamek ya derbaz kirina lewaziyên mirov li beramberê xweza û nîfşên din jiyana dike tîn nirxandin. Ango bi bandoriya ajoya jiyana biyolojiya mirov weke rêbazek ya bersiv dayîna bandoriya ji derve ya xwezayê tê nirxandin. Heman nêzîkatî, zanîne weke pêşbaziyek biyolojîk ya lebeta em jêre dibêjîn aqil ku weke awayê têkiliya bi tiştên ji dervey mere saz kirî jî di nirxênî. Nêzîkatîyek cuda ya din li têngîna zanîne jî, wê weke heyînek binavê xweda weke razber ku hertiştê afirandî, weke ku mirov jibo wê xizmetê bikin aniye holê, bi şeweyê xelat (mükafat) digre dest. Ev herdû nêrînen ku bi sedsalane dibin mijara cureyê, di felsefê de weke pîrsgîrêka bîngehîn hebûna xwe dide domandin.

Di girtina dest ya civakê û herwiha têngîna mirov de, ya heya niha herî diyarker ev herdû nêzîkatîyên felsefîkin. Gelo rastî jî mirov bes berhemê aqil û berhemê xweda yê bes aqile, yan ji vadanek hêsan û pasîf ya cihana ji derve ku rastiya û bes misogerê xwezayê ye? Ev dualîtî wê hîn bê cure kirin. Divê mijarê de Rêber APO vane diyar kiriye: “Mirov di kîjan pêngava zihniyetêde şekil girtiye mijarekî giringiya xwe hîn di parêziye. Bivê ve girêdayî (ilintili), gelo divê pêşengî bê dayîna zihniyetê yan ji bê dayîna çêker û amêran? Bersiva vê pîrsê girînge... Weke sinurên dawî yên zanist gihiştîyê ‘kuantum’ û ‘kozmos’ nêzîkatîyên pîr balkêş pêşkêşî me dike. Weke parçegoka binatomê (atomaltî) û fîzîka pêl, kuantum herêmên pîrcurda vedike. Ji sazûmaniyên pêhes û azadiyên bi xwestek bigrîn, di heman keliyê de bûyîna du tiştên ciyewaz, jiber çêkera mirov ne diyarbûnê rêzîka heya bi tu şeweyî tam ne derbaz kirinê tê gihiştina çespanandin (tespitler). Têgîna heybera ne zindî û tund (kaba), bi temamî tê dayîna aliyekê. Berevajî, gerdûnek di asta jorde azad û zindî tê pêşberê me. Livêderê nepeniyên (muamma) bîngehîn, di mirov de, bi taybet di rewşa zihniyetê de tê jiyana kirin. Em qala ketina îdealizmê, subjektivîzmê nakîn. Em nakevîn nîqaşên felsefeya dişibin hev yên pîr tîn kirin. Bi temamî tê fêmkirin ku di gerdûnê de gihiştina evqas curbunan, di sinurên kuantumê de rê li pêşî vekirîye.

“Em jibo mirovê li navenda kuantum û kozmosê radiweste dibêjîn ‘mîkro kozmos’.

“Ger em şîroveya xwe ya mirov hîn pêşbêxîn, em dikarin van ferazetan (varsayim) derxîn pêş: Ger taybetmendiyên azadî, pêhesî, zindîti û tevayî keresteyên mirov pêkaniyî neba, weke rave kirina giştî ya tevayî van taybetmendîyan, azadî, pêhesî û zindîtiya mirov jî pêş nediket. Ji tiştê tune yî, tiştê nu na xulîqe. Ev çespanandin (tespit) têngîna me ya heybera ne zindî di rizênî. Bêgûman heya nîfşê mirov nebe sazgerî û civak, heyîna zana pêşnakeve. Lê heya taybetmendiyên azadîxwazî, wateyî, pêhesî, zanistî ya keresteyên (materyal) di van sazûmankarî û civakan de rol dileyze nebe jî, ne dîtina laş ya zanîne mijarek tê fêmkirine. Ger di cewherê

wêde tiştêk nebe çima were afirandin? Ev nirxandin, ne tam vedanek hêsan ya ji xwezaya derve, ne ji şîroveya rastiya mirov di encama ramanîbûna Descartesvarî de zanabûye piştrast dike. Nêrîna hîn nêzî rastiye, jiyankirina taybetmendiyên di gerdûna kozmos û kuantum ya pêkhatîdeye.

Nêrîna hîn bêhtir nêzî rastiye, jiyankirina taybetmendiyên pêkhatinê yên gerdûna kozmos û kuantum ya di mirovan de ye. Ji xwe di bingeha xweseriya xwede ev zagonane tên rêvebirin (işlenmektedir).

Bi herdû nêrînen felsefîk yên cûda ku me li jor diyar kirî ji niqaşên destgirtina mirov, fikarên (sakıncalı) yek ji wan weke misoger rast pejirandin, ji wergirên (alıntı) me yên ji berhema Rêber APO ya binavê Parastina Gelekê jî tê fêmkirin. Bi nîqaşên bivî awayî jiber danayên di dest de xwe çespanandin ne gengaze. Ji hêla fêmkirina mirov ya xwe di bingehê têgîna zanîne de, nêzîkatiya herî nêzî rastiye bi asta fizîka kuantum gihiştîye dikare gengaz bibe.

Jibo tiştê em jêre dibêjîn hiş vegere têgîna mirov dike mirov, wate afirandin û mîsogerî qazanç kirina wê şerte. Ev hilberîniya weke kedê tanzîna mirovê. Bê ku hiş mîsogerî qazanç neke, jibo vê bê kû keda em jêre dibêjîn afirîn nebe, tiştên em dizanîn em nizanîn. Bi vê rêgezê ketina rê dikare were gotin ku, kedê û hiş du rewşên têgînek ya bi awayek berdeham hevdû di hilberîni û tîmar dike rave dikin.

Jibo ev herdû têgîn mirov weke heyînekî cûda û xweser derxe hebûnê divê herdem herdemiyê pêşkêş bike. Her weke pîjîqîna derdor ya berûyên dara berû û şînbûna darên berû yên nû. Ger emê hiş û kedê di mirovbûnê de weke du hêmanên bingehîn bigrîn dest, heyîna em jêre dibêjîn mirov tê wateya qazançkirina herdemiyê ya van herdû têgînan jî. Ya em ji herdemiyê qal dikîn; ne aktiviteya zanîn û afirîna mirov ya ji di pêvajoya ji dayîkbûn heya temenê xwe yê dawî pêktineye. Ger domdariya (süreklilik) di hiş û kedê de bi vî şeweyî hatiba meşandin, mirov wê neçar mayî ba ku tevayî tiştên jibo jiyanê xwe pêwîst ji sifirê fêr bibe. Ev ji wê bi xwêre bi tu şeweyî pêşketina mirov ne anîba yan ji wê encamekî pêşketina leza nêzî lawiran bi xwêre baniya. Dema lewaziya biyolojîk ya mirov li pêş çav tê girtin, ev ji weke mirov tê wateya ne xwedî hebûnekî. Lê rewşa li holê ya mirov, piştrast dike ku têgîna herdemî di şewazek hîn cudatir de pêş dikeve. Wê demê mirov weke rastiyeke jiyan dîtin ne tenê bi hiş û kedê, bi hiş û keda herdemî qazanç dike pêktê. Jibervê jî pêdivî pê heye ku ji nîş heya nîş hiş were ragihandin. Xala herî girîngê eve. Kardariya vê pêktîne jî, sazgeriya em jêre dibêjîn civake. Ango civak, navê din yê xebata hiş û keda mirov ya vegerîna têgînen mirov dike mirove yan ji dikare were gotin jibo zindî derfetê afirîna jiyanê pêktineye.

Ji van rastiyan bingehîn ketina tevgerê ku sazmanageriyeke ev têgînen bingehîn

, pîrsa hiş û kedê ya em jêre dibêjîn civak, têgîna xwe divegerêne berhem bi taybetmendiyek çawa şekil distêne derdikeve holê. Jiberkû tiştêk weke raman ku pîr razbere, di cihde vegerîna wê ya kedê yan ji pêşxistina ramanê ya kedê bi şeweyê dibe û nabe ne gengaze. Em dikarîn vê ji kardariyên xwe yên jiyanê rojane jî têbigehîn. Encama em ji vêderê bigehîne, bi saz kirina têtikiliyên ji rêzê mirov derfetê jibo bûyîna mirov nabîne. Bi taybet dema pêvojoyên despêka mirovahî ku pêşketinên zihni nu nu pîrîskên (zerrecik) wateyê di afirînin û hê derfetên teknîk yên pêdiviyên bingehîn yên jiyanê berhev bike di dest de tuneyî bi hizirîn, wê bi xwe derkeve holê ku sazûmaniya hindirîn ya saz kirina civakî bi xwe, tiştê herî girîngê ya jiyanê dike hebûne. Encama ji vê xweseriya civakê derdikeve, ewe ku em wê bi her şeweyekî nagrîn dest. Dema têtogin civak, li ruxmê tevayî bê derfetiyên pêşwazî kirina zoriyên xwezayî yên xweza li ser hebûna em jêre dibêjîn mirov ferz dike, li ruxmê vane tevan, em qala bi pêkanîna jiyanê û herdemîkirina wê dikîn. Divê rê li pêşiya kardariyekî hêzên mezintir ji hêza lewaziyan derbaz dike bi afirîni, yan ji divê divê şewazê de bê damezrandin. Bi ketina tevgerê ji daneyên di dest de û encamên ji pêşketinên jiyanê dîrokî derketin, têtgeha civakê bi awayek hîn mîsoger pênase kirin gengaze.

Bi diyar kirineke hêsan civak, rastiya li rexhevjiyan kirina mirovane . Qala me ji jiyanê rexhev; em behsa li rexhev mayînek jimarî nakîn. Weke jimarî her li rexhev mayînek jî ne civake. Di wateyek civakî de li rexhev jiyan kirin, bi parvekirina nirxên hevbeş gengaze. Ya ku gengeşiya mirovan yan ji çêkera wan ya jimarî weke civak bi wate dike eve. Cardin pêwîste di mirov de hişê pêdiviya mirovan bi hev heye were hilgirtin. Lewaziya biyolojîk ya mirovên despêkê, di serî de rêjeya wê bi gelek zindiyên re, pêvajoya dem dirêj ya zarokatiya wê de, parastina wî, ji hêla

mirovek din ve tîmar kirina wî, mezin kirin û bi civakê dayîna qazanç kirin weke şert dihat girtin. Jibo kurêmirov jiyan bike di despêka zarokatiya wê de pêwistiya wî bi piştgiriyê heye. Di şêkil girtina civakî ya despêkê de û di tevayî pêvajoyên dîrokê de ev xweseriya mirov, weke dayîk berpirsariya tê anîna cih dertêxe holê. Ango jibo civakê amadekirina endamên nu ger tenê biyolojîk yan ji di mijara pêkanîna zanabûnên jimarîde ji be, dayîkê di damezrandina civakbûnê de weke bingehîn û dest jê neveger nîşa dike. Ger civak, derbazkirina lewaziyên fîzyolojîk yê mirovbe û lewaziyên di mirov de bi xwere pêdiviya bi hevdû tîne, ev rêgez despêkê navbera dayîk û zarok de tê saz kirin, neçare bê saz kirin. Herwiha ya ku vê weke tovîk di pejirêni û zindiya (organizma) li ser vê mezin dibe civakbûne.

Ji têtikiliyên xweber (gelişigüzel) yê me hewl dayî li jor diyar bikîn, rastiya mirov nikare nîfşê xwe bi xwe bi domêne, pêdivî bi çêkerê ya hîn xweser û bikare lewaziyan derbaz bike heye, çespendina herî baş ji têtikiliya dayîk-zarok bi rehetî tê dîtin. Divê têtikiliya tovîk de zarok ji hêla biyolojîk, hiş û ked de, bi qasî nikare bi serê xwe jiyan bike lewaze. Dayîk weke aliyê van lewaziyan derbaz bike, kedek mezin dide. Di wateya em dizanîn de, bendewariya ji vê kedê tune. Jiberkû weke bendewariya herî mezin mirov tê afirandin. Di mirovê tê mezin kirin de, nîrxên mirovî yê bingehîn yê weke rêzdarî, heskirin, girêdan û ji dayîkêre dilsoz pêşdikeve. Dayîk dema vê keda bi zehmet lê pîroz xerç dike, weke pêdiviya rêgeza di dîyalektîka hiş-ked ya ku em xebat dikîn vegotin bikîn, herkû diçe pêşketineke zihnî hîn bi lez jiyan dike. Pêşketinên tînan jiyan kirin, nîşan dike ku ev rêgez di sedê notû heştê dîroka civakî de pêktê.

Bi ji têtikiliya tovîk ya civakê ketina tevgerê dema em jibo pîrsa civak çîye li bersivê digerin, emê derfetê gihiştina hinek rastiyan bingehîn û li ser van bersivan re derfetê pênase kirinek nêzî rastiye bi dest bixin. Ger em ji têtikiliya despêk ya civakê nîrxandinekî giştî bikîn, em dikarin danasînek bivî awayî bikîn: Civak; pêkhatineke ku mirovê lewaz di hindirê wê de dike hêz, mirovê bi hêz û kêrhatî jî divan taybetmendiyên wê de kur dike. Dema lewaziyên mirovan hat derbaz kirin, ger em behsa bi hêzbûna kurbûna aliyê bi hêz ya vê lewaziyê derbaz dike dikîn, ev piştrast dike ku rêgeza ji van lewaziyan hêz digre hîn di dome. Wê demê di têtikiliya civakî de lewazî û hêzek misoger (mutleq) tune, hevdû temam kirin heye. Wê demê civak; rastiya mirov di her wateyê de li her qadê hevdû temam dikeye. Jibo ev pêdivî bînan cih anîn, sazûmaniya pêwîst weke neçariyekê bi armanca pêkanîna berdewamiya jiyanê derketina holêye. Di vê berdewamiyê de ya bingehîn mezinbûn û mezinkirina beramberheve. Armanç mirovbûne. Hiş qazanç kirin, hatina asta dayîna kedêye.

Hebûna têtêha dayîkê di bingeha hiş û keda civakê saz kirî de, xisleta (karakter) hiş û keda di têtikiliyên mirov de jî diyar dike. Weke weledek mezinbûn, di heman demê de tê wateya jibo weke kesayetek yê civakê bê rewşa bikare tevî bibe. Pêşketina hestiyarî û ramana zarokek li beramberê dayîka xwe hîs dike, ya weke wê yan ji ya weke di şibe wê li beramberê civakê jiyan kirin, encamek xwezayî ya vê pêşketinê ye. Weke pêdiviya rêgeza nîşakirina pêşketinê ya hişê, bingehên pêkhatina despêkê, pêvajoyên piştî wê jî diyar dike. Li rexa vê mirovê ku demek dirêj ji hêla dayîka xwe ve tê parastin û tîmar kirin, piştî demê bi hiş û keda xwe despêkirina tevîbûna civaka xwe, dema ket wê ferqê ku lewaziyên wî ji hêla endamên din yê civakê ve tînan derbaz kirin, ger mezin ji bûyî be, dîsa jî li hemberê zoriyên xwezayî yê xwezaya ji derve hîs dike û têtêgehe ku ew zaroke ke. Bivî awayî civak, weke dayîkek nu di hişê wî/wê bi cih dibe. Bi vê wateya xwe civak weke çêkerê ya di her wextan de erkên xwe yê bingehîn yê weke diparêze, mezin dike, hiş dide, lewaziyan derbaz dike rave dike. Civaka ku mezin dibe û bi qazanç kirina kurbûna di nava xwede sazîbûnên cûda di afirîne, tê wateya têtêha dayîktî ya ji hêla heyberî-rewanî ve mezinbûn û pêşketin qazanç dike. Di çêkera sîstema despêkê ya civakê de, sirra weke xwedawend pîroz kirina jinê li vê derê veşartîye. Ev pîrozî, li gorî pêdiviyên zagonên hebûna tevayî heyberî-rewanî yê di bingeha têtêha dayîktî de hatiye mezin kirin, vedana hiş ya bi hêzbûna mezin a ev hêza ne diyar ku mirov hebûna xwe diyar dikeye.

Jiberkû civak li hemberê lewaziyên mirov li beramberê xwezayê jiyan dike weke şêwazek ya bersivê pêşketiye, di hebûna civakî de rastiya xweza jî di çêker û diyarkirina têtikiliyên civakî de weke bandorekî girîng rastiya rol leystinê dertêxe holê. Encamên xwezayî yê gûherîn û vegûherînên di pêkhatina hindir ya xwezayê bi xwede derxistî holê, dîsa weke encama curbûna xwezayî (tabî), bi qasî derfetên nîfşên zindiyên din yê xwezayê jibo mirovan bi cih aniyîn, xeteriyên afirandî jî, serkeftinên di tekoşîna çavkaniya li rexhev bûyîna mirovan bi dest xistî, ji

hişê saz kirina civakî raste rast vedanê aniye. Li rûxmê ku divê tekoşînê de heyîneke lewaze jî, bi dest xistina derxistina holê ya potansiyela domandina nîfşê xwe, di têtikiliyên civakê de têt saz kirin de danasîna rêgezêk dine. Ev serkeftin piştrast dike ku têtikiliyên mirovan di civakê de naşibin têtikiliyên bi gurup yê zindiyên. Di civakê de têtikiliyên mirovan taybetmendiyek xwe ya xweser qazanç dike. Di têtikiliyên civakê de yek ji zagonên diyalektîk yê kardar (işleyen); civakê ji kombûna jimarî ya kesan derxistine. Civak tam di şibe biyolojiya mirov. Çawa ku ji yek hucre têt despê kirin heya sîsteman û ji sîsteman jî laşê mirov bi xwe têt tamam kirin û divê tamamkirina hev de ger her hucre, tevin, lebet yan ji sîstem kardarî û taybetmendiyek nu qazanç dikin û ger ev ji nasnameyek nû be, di civakê de jî yek yek mirov bi têtikiliyên dişibin hev hebûna wan pêktê. Di têtikiliya civakî de mirov sirf weke heyînekî biyolojîk ne ew bi xwe ye. Di nava pêşketina dîroka civakê de, yê tevayî kêrhatinên hatî afirandin girtî, ya ku bivan kêrhatinan nasname qazanç kirî hîn bi hêztir û tiştek pir cudaye. Di bingehê civak weke egera heyîna bûyîna mirov pêkanîna de, ev serhev ve neçûn zagone. Civak bi têtikiliya xwe ya navbera xwezayê de, bi taybet pêşketina mirov di hişê de jiyân kirî, encamên bi balkêş dertêxe holê. Hem weke bîra (hafîza) civakî xwecih mayîna hişê, hem jî weke ked mîsogerî qazanç kirin, ji her gava têt avêtin re yek ya nu lê zêdekirin, gûherîn û vegûherînê bi xwere tîne. Yek ji encamên civakê jibo mirovahî aniyî eve. Bi tevgerîna ji vê rastiya bingehîn, ji civakê re dikare were gotin mekanê komkirina qazancên mirov. Weke mayîna de û weke afirîna mirov pêkanîna, bingehê xwe ji vê derê digre.

Bi pêşketinên vê pêkanîna de bi cih aniyî ku mirov digehe ferqa xwe, dema zêdebûna hêza çawanî (nîtelîk) ku çavkaniya xwe ji çêkera lebetîna ya civakê digre, di hişê xwede bi şewazê em jêre dibêjîn bawerî bi gihêne wateyê, bi vê em dikarin bêjîn civak derbazî pêvajoyek nu bûye. Jiber sedema civak çêbûnek weke derxistina holê ya mirovê bi hişbûyî yan ji ghiştî ferqa xwe nîşa dike, di rastiye de giringî û wateya bingehîn di deyne holê. Civak ne tenê vehaya cenneta mirovê afirênera, di heman demê de depoya nîrxên zanebûn û tecrûbeyan ji nîfşekê di ragihênin nîfşek din pêktîneye. Dema wext û cihê wê hat, bi şeweyekê şehêna dadê ya yekteşe (sitandart) kû van nîrxane di navbera endamên xwede parve dikeye. Ev yan ji saz kirina têtikiliyên dişibin vê yan ji weke berdewamiya wê, civak ji zindiyekî herî guneh-mirov, tîne rewşa îro buye tevahiya zagonên bigihe hêza çêkera bi kare kurbûnên xweza û feza kişf bike û pêşbêxe.

Çawaniya civakê ya mirov dike hêz, herdem serê mirov xerîk kiriye. Hêlaye ku mirov vê rêgeza civakî bi bingeha hiş de di zihnê xwede razber bike, herwiha derdora xwe bi van razber kirinan bi wate bike. Endamên despêkê yê civakbûna xwediyê ramanên ji baweriyê bar, di navbera xwede û têtikiliyên xwezaya ji dervere, divê bingehî de bi zagona exlaq pêkhatiyê. Herwiha di despêkê de civak weke teorîk û kardarî dinava xwede bi van herdû têtgehên di bingeha dikare were gotin bi zanebûn pêktîye. Bi tevgerîna ji van herdû têtgehên bingehîn, ger di pêkhatina civakbûnê de bawerî û exlaq nebe nabe. Li vêderê qala ji baweriyê têt kirin baweriyaya xwedayekî razber, qala ji exlaq têt kirin jî di wateya ya jiyana rojane de têt karanîna ne exlaqe. Baweriyê weke yekem afirandina wateyê ya aqil, exlaq jî divê weke rewaniya mirov li rex hev digrin were fêm kirin. Bi ketina tevgerê ji van herdû têtgehên xalek din ya ku were diyar kirin, bi civakbûnê mirov di cewherê xwe de ji xwe bawer dike, bi ghiştina ferqa pêdiviya wan bi hev heye jî, hîlbijartina jiyana hestyariya bi hevdure dinava rêzdarî û girêdanê de jiyân kirinê. Bivî awayî ev herdû têtgeh weke zagonên bingehîn yê civakê, di xwezayê de pêşketina heyînen bi hest, aqil û çespanî yê tevayî gerdûnê, gav gav bi rakirina ji holê ya astengiyên li pêşiya xwe afirandina wê dibin kelem, bi xwere xuliqîna afirêneriyên pir xweser anîna bi dest têtê.

Civak têt wateya, pêkhatina tevayî nîrxên çandî yê mirovahî di pêvajoya hebûna xwede afirandî, li vane yê nu zêde kirin, gûherîn-vegûherîn û dubare dúbare dom kirina vêye.

Di encamê de civak; rastiya mirovê pêktê bi xweye.

2- Mirov û Civakbûyîn

Mirov dikare ji du milan ve nêzî pîrsê bibe: weke cinsekî biyolojîk û pêşketina civakî. Divê mirov bi awayekî herdu şewê hevdu tamam bikin û wan bigihîne hevdu bi nav bike.

1- Weke cinsekî biyolojîk mumkin e behsa zêhnê mirov were kirin. Ji bo mirov karibe bi hostatî li mijarê temaşe bike divê mirov di sîstema zindiyên de bi pîvanên makro û mîkro bipirse ka aqil di çarçoveyê gerdûnê de xwedî çî maneyê ye. Fikrên di çarçoveya perçikên jêr atoman

de tène hûnandin pircuretiyê, cudatiyê û tevî van ji bo ravekirina pêşketinê bivê nevê mirov pêwîst e behsa aqil bike. Motora sereke ya tevahiya pêşketinên di gerdûnê de li mekanekî piçûk ê bi qasî atomê û dîsa bi lezên ku mirov nikaribe bifikire bi tevgerên pircure yê pêlan û perçikan vediguherin hev û bi vî awayî rê li pêşketinê vedibe. Ne tenê di alemajêr atomê de, di alemên fizîkî û biyolojîk de jî pêşketin weke pircuretiyê di vê çarçoveyê de diqewimin. Haya me ji me hebe ku em di nava sînoren metafizîkê de digerin.

Em bi heman rengî dikarin gerdûna makro jî bigirin dest. Gerdûn bi xwe bi kategoriyên mîna zindî-nezindî, bi dawî-bêdawî, cuda-wekhev, madde-enerjî, dahvdan-kişandin hebûna hebûnan e. Ango yekpare ye. Jêr atom û jor gerdûn dualîteya diyalektîk a bingehîn a heman yekpareyê ne. Zeman bi yekîtiya kûrahî û berfirehiya mekan diqewime yan jî wan dide fêmkirin û nîşan dide. Pirsra çima gerdûn heye têgihîştina metafizîkê tîne hişê mirov, lê mirov nikare bibêje pirseke tewş e, an jî li cih nîne. Em ji bîr nekin ku yê pirsê dike mirov e, ew jî civakî ye. Fenomenolojî ji hiskirinên me wêdetir ji hebûnan zêde bawer nake. Em çiqasî his dikin û heta em difikirin em ewqasî jî hene. Metafizîk jî bi xwe hebûnek e, bi his û fikrê xuya dibe. Haya min ji vê dualîteyê heye ku çiqasî mirovî heyranî xwe dike û bi girîngî destnîşan dikim ku divê mirov wê ji hev derxîne û jê bibihure. Wer xuyaye ku mirov bi van dualîteyan nikare gerdûnê fêmkirî bike. Cihêkirina fikir û bedenê felsefeyeke herî zêde jiyanê înkâr dike û heta jirêderketineke dînî ye. Pirsgerêkeke welê ya gerdûnê tineye.

Em di rêxistinkirina zindiyê herî pêşneketî de jî hêmanekî seyr ê mejî dibînin. Xisleta pêşî ya em dibînin ew e ku ev mejî xwe di nav kêliyan de dabeş dike û bi vî awayî meyla xwe ya bê dawîbûnê nîşan dide. Ti zindiyê pêşî xwe çêkiriye tine nebûye. Berxwedana vî zindiyê xwe bi xwe çêkiriye, herî dawî weke cinsê mirov rê li potansiyela mejî vekiriye. Potansiyela di şaneyekê de pêkhatina zindîtiyê, çawa çêbû ku weke mirov xwe kir pircure û rê li zindiyekî muazam ê xwedî jîrekiyê, mirov vekir? Dibe ku ne tenê ji bo şaneya zindî, heta ji bo gerdûnê herî mîkro jî xwe zêdekirin, bi hawîrdorê xwe xwedîkirin û ji bo vê jî xweparastin esas e. Perçikên jêr atoman bi awayekî tine nebin zêde dibin, pêdiviyên xwe yên zêdebûnê û xwe xwedîkirinê dibe ku bi tenê bi vî şeweyê gerdûnê mîkro pêk tînin. Sînoren wan ên ku wan sînordar dikin, yên ewlekarî, xwe-xwedîkirin û bêserûbinî-pirbûnê ne. Em bi kêmanî be jî dikarin bersiva pirsra xwe ya der barê mejiyê gerdûnê de li vir bibînin. Em vê gerdûnê li derveyî xwe nebînin. Gerdûnê em behsa wan dikin li hawîrdora me tijî ne û dor li me girtine. Dibe ku gera me ya li ewlekarî, xwedîkirin û pirbûnê bi van gerdûnê mîkro vê dinya me ya yekbûyî îfade dike. Belkî gerdûna makro jî bi heman awayî heye û xwe çêdike. Ew (gerdûna makro) di nava sînoren bêserûbinî de bi awayekî ku zorê bide zeman û mekan di mejiyekî ewle û mezinbûnê de biryardar e. Heye ku gerdûna makro jî xwe di mejiyê mirov de nîşan dide.

Haya min ji min heye ku ez zêde mijarê dihûnim. Lê em nikarin potansiyela mejî ya mirov weke ji tine peyda bûbe şîrove bikin. Em çiqasî dikarin bi hebûn û beridandinê mejiyekî neberbiçav bifikirin? Mirov mejî weke ku bi tenê xisleteke mirov be, bibîne çiqasî rastbîn e? Mirin bi xwe jî ji bo jiyan an jî hebûn were fêmkirin weke ku pêdivî pê heye tê qebûlkirin. Em têderdixin ku mirin nebûya, haya me wê ji jiyanê nebûya. Bêyî guherînê jiyanê bêdawî, ya rastî nejiyîn e. Ji ber ku di rewşekê de haya mirov ji tiştê nebe, di wê rewşê de ti tişt nîne. Di vê rewşê de jî ya rastî mirin ji bo jiyanê weke pêdiviyeye hewcedarî pê heye xuya dike. Baş e, mirin a divê weke nîmetekî were dîtin, çima mîna dawîya jiyanê bê em jê ditirsîn? Li şûna ku em jê bitirsîn, em hewl bidin, jiyanê ew dike ku mumkin be, fêmkirin. Ji wir jî mirov biçe encamê û li gorî vê yekê tevî gerdûnê bibe, baştir e. Mirov çawa nikare ji destê mirinê xilas bibe, mirov nikare ji destê jiyanê jî xilas bibe. Ya rastî, bi van dualîteyan em dikarin bi sira gerdûnê derxin û ev weke armanca yekane li pêşiya me xuya dike.

Baş e, piştî ku ev dualîte ji hev hat derxistin, mirov wexta xwe bigihîne maneya jiyanêke hosteyane hingî ya diqewime û bi cih tê çî ye? Ev pirs ji bo min hem tewş e, hem jî gelekî hewce ye. Kengî mirov bigihîje sira gerdûnê hingî mirov dikare behsa serketina dawî ya jiyanê bike. Çi cenneta di Pirtûkên Pîroz de, çî jî di Bûdîzmê de xwe gihandina Nîrwanayê, yan jî di tesewifê de rewşa tam a wecdê mirov dikare weke pîrozkirina jiyanê û rewşa timî pîrozkirina cejn û roşanê şîrove bike.

Hin fikirkarên Rojavayî, li gor çavdêriyên tîne zanîn gotine; jiyanêke bi sînora a li dinya me bi temamî xweber pêk hatiye û kengî sîstema rojê biqede wê dinya me jî di nava kozmogoniyekê

bêmane de wenda bibe. Ev jî dişibe tesewireke mîna ya cehennemê. Hêmanên ku hûnandina bi vî rengî jî xwe dispêriyê, hene. Lê ev, îdeaya jihevderxistina jiyanê hûnandineke herî bêber e. Em ne tam bi gerdûnê dizanin, ne jî em maneya jiyanê bi hostayî dizanin. Sedemên hûnandina dabaşan bi vî awayî têra xwe bi hêz nînin. Dinya me bi xwe çawa ku rê nade jiyanêke têra xwe rewşa wê ya hebûnê tineye, bi wî rengî jî biqasî ku li gorî potansiyela xwe atmosfera jiyanê ji her ruhberê dema wê hatî re çêbike, zindî û adil e.

Pir girîng e ku mirov çîroka çêbûnê ya cinsê mirov neke eznavend û neke ji rêzê, naxwe ev yek ê ji gera gerdûnê ya seyr re bibe bê hurmetî. Metafizîka herî xirab pozîtîvîzm e ku mirov ji tevahiya gerdûnê şûştiye û hewl daye behsa wî bike. Ez yeqîn dikim, em kengî pozîtîvîzma ku materyalîzma herî çor e, têkiliya wê bi kapîtalîzmê re destnîşan bikin, em ê manedartir û ewqasî jî bi rêz nêzî jiyanê bibin.

Weke encam; wer xuya ye, weke cinsekî biyolojîk mirov di gerdûnê de herî zêde xwedî şens e ku hay ji gerdûnê hebe. Mirov haya xwe ji vî potansiyelê hebe tiştek e, bi cih anîna wê tiştekî din e. Di fikra Rojhilat de gotina 'çi hebe di mirov de ye' mîna ku haya xwe ji vî rastiyê heye. Divê ez dubare bînim ziman ku fikra ber bi navend-mirov ve çûye, zindî-nezindî bi tevahî xwezayên din di xizmeta mirov de dibîne ku ev têgihîştina zemînê felsefa têgihîştina desthilatdariya totalîter, otorîter û hiyarkerîk e, diyar e mirov digihîne aqlekî hûnandinê yê herî zêde ji jiyanê dût. Ya rastî, ev yek berhema aqil e. Hin aqlên berevajî xuya dikin jî hene. Hin felsefeyên ekolojîst ênku mirov bi tevahî bela serê xwezayê dibînin jî di encamê de ji têgihîştinên ku me qala wan kirî dût nînin. Felsefeya ku mirov weke belayeke serê xwezayê dibîne, têkiliya wê bi jiyanê re qels bûye û bêber e. Eger qîmetê nede beridandineke heta gihîştîye mirov, wê wextê yan tayê wê yê bi jiyanê re zirav bûye li ber qetîna ye, yan jî têkildarî sîstemên li ser hîmê mêtinkariyeke zêde hatine hûnandin e.

Beridandineke gihîştîye sînore mirov, pirsên gelekî ciddî yê exlaqî datîne pêşîya me. Beriya ku em derbasî vî mijarê bibin, divê em bikaribin têkiliya aqil a bi civakê re rave bikin

2- Cinsê mirov potansiyela xwe ya mejî çendîn bike civakî, xwediyê wê qabîliyetê ye ku wê karibe vî potansiyela xwe ya mejî nîşan bide. Ya girîngtir, çêbûna mirov a biyolojîk civakîbûnê ferz dike. Civakîbûneke ku di ti zindiyên din de nayê dîtin, mirov neçarî wê ye. Zarokeke mirov piştî panzdeh salan dikare ji zaroktiyê derkeve ku ev pêvajoyê jî bêtir civakîbûnê nayê bihurandin. Zarok pir qels ji malzaroka diya xwe dibe. Çêlikên heywanên din di nava çend rojan de heta di demên hin kin de dikarin jiyanê xwe bi xwe tedarik bikin. Civakîbûna mirov gelekî tevlihev e û divê hûrûkûr bê fêmkirin. Cinsê mirov ê civakbûna xwe wenda bike, yan wê weke cinsekî nêzî meymûnê ji nû ve biberide ku ev beridandineke berevajî ye û mumkin e; yan jî wê tine bibe. Bi tevahî zindî hem weke cins, hem jî weke tevahiya cinsan hewcedariya xwe bi bihevrebûneke xweser dibînin. Civakî xweseriyeke cinsê mirov e û ji bihevrebûnê wêdetir xwediyê xisleteke hebûnê ye.

Weke têgînekê civakî mîna xwezaya duyemîn tê binavkirin ku ev helwesteke hîn hûrûkûr e. Kengî potansiyela mejî dikeve pêvajoya çalak, civakîbûn destpê dike. Ji bo kom û civatê timî hewcedarî bi fikrê heye. Pêşketina civakî ya esas pêşketina fikrê ye. Bi wê derfet û îmkanê wê yê hebûnê çêdibin. Civakîbûn çiqasî mezin dibe, ewlekarî, zêdebûn û xwe xwedîkirin jî ewqasî pêş dikeve. Ez dixwazim bi awayekî eşkeretir bibêjim; ewlekarî, zêdebûn û xwe xwedîkirin li cem tevahiya zindiyên nîşaneya aqil e. Bi awayekî herî çor, hînbûna bi ajoyên hundirî ne. Tevgerên hînbûnê yê tevgerên zindî ne. Eger em ji bo giştî bibêjin; bi tevahî pêşketina gerdûnê mejî û hînbûnê tîne hişê mirov. Weke xwezaya duyemîn civakî, bi şiklekî qonaxa jor a xwezaya yekemîn an jî rûyê wê yê xuya dike ye.

Pir girîng e ku mirov tespît bike, hêza zêhnî ya di encama beridandina biyolojîk de digihîje mejiyê mirov, bi beridandina civakî hem çalak û hem jî jê cihê dibe. Min berê jî diyar kiribû ku civakîbûn bi xwe rewşeke zêhnî ya ji xew şiyar dibe û timî dixebite mumkin dike. Wexta zêhn timî bixebite bi awayekî xwezayî weke encameke beridandinê mejî jî pêş dikeve. Herçiqasî demeke dirêj biçe jî jiyanê civakî ya çalak, ji bo pêşketina zêhnî sedema bingeşê e. Ravekirinên der barê dehayên şexsî de mirov nikare zêde pê bawer bibe. Di bin her rewşa mejî de xweseriya civakî heye.

Xisleta herî girîng a mejiyê hisî têkiliya wî ya bi jiyanê re ye. Fonksiyona wî ya bingeşê parastina jiyanê ye. Di warê parastina jiyanê de gelekî pêş ketiye. Ev aliyê wî divê hiç biçûk neyê

dîtin. Hema bêjin hîç şaşiyê nake. Ez vê yekê bi maneya yekser bersivdana wî dibêjim. Bêparbûna ji vî mejiyî di jiyânê de têra xwe rê li tehlûkeyan vedike. Nirxdan û rêza ji jiyânê re bi asta pêşketina mejiyê hisî re têkildar e. Tewazun û wezna di xwezayê de li ber çav digire. Mirov jêre dikare bibêje; mejiyê jiyana xwezayî mumkin dike. Em dinya xwe ya hisan bi temamî deyndarê cureyê vî mejiyî ne.

Li cem cinsê mirov pêşketina komple ya mejiyê hisî, şensê têkilîdanîna di navbera hisan de zêde dike. Di serî de hisên dîtin, deng û tahmê di nava xwe de hev his dikin û tevgerên jîr datînin. Komên mirovan demeke dirêj bi zimanê îşaretan bi hev re danûstendin, piştî ku şertên fîzyolojîk ên axaftinê pêşketin xwe gihandin zimanê 'sembolan'. Zimanê sembolan hîmê xwe li ser peyvan e. Bi van peyvan fikra neberçav pêş dikeve. Li şûna îşaretan bi têngînan danûstendin di dîroka mirovatîyê de şoreşeke mezin e. Êdî ya mirov divê bike ew e ku nav li obje û bûyerên bersiva pêdiviyên wî dide bike. Navlêkirin qonaxeke mezin e. Têkiliyên di navbera navên curbicur de bi xwe re çêbûna têngînan pêş dixîne. Çi xisletên objeyên bi nav têne temsîlkerin, çi jî fonksiyonên di nava wan de rê li ber lêker û daçekan vedikin. Bi hevokdanîna re şoreşa ziman bi ser ketiye

Ev şeweyekî nû yê fikrê ye. Di zêhn de bicihkirina peyvan, mumkin dike ku mirov bêyî obje û bûyeran li ser wan bihizire. Em li destpêka pêkhatina mejiyê dikare bûyeran bihûnîne ango ev mejî dikare teoriyê bike ne. Ev pêşketineke mezin e. Aliyê çepê yê mejî beşê loba pêş bi vî cinsê mejî dibe pispor. Bi qasî aliyê xwe yê kêrhatî, ev beş dikare rê li ber rewşên bi tehlûke jî veke. Yek ji xisleta wî ew e ku ji hisan qut dixebite. Mirov dikare vî mejiyî weke FIKRA ANALÎTÎK an jî mejiyê bûyeran dihûne jî bi nav bike. Mejiyê analîtîk an jî aqil avantaja wîya herî mezin ew e ku bêyî xwe biwestîne, dema pêwîst bike dikare di heqê tevahiya gerdûnê de bifikire. Qabîliyeteke wisa ye ku bê sînor dikare xeyalan bike. Mejiyê analîtîk bi awayekî pir seyr dikare dinya form û qaliban biafirîne. Qabîliyeta wî ya pîlan, dafik û bêbextiyê bi pêş dikeve. Dikare xwezayê teqlîd bike û her cure vedîtinê peyda bike. Bi pîlan dikare dafikê vedeû bi her cure bêbextiyê bigihîje xwesteka xwe, ev jî li derve û hundirê civakê wî dike çavkaniya sereke ya her cure pirsgerêkan.

a- Mirov destnîşan bike ku Serdema Qeşayî ya Dawî li derdora bîst hezar sal berê bi dawî bûye, ev yek di pêşketina dîroka civakî de qonaxeke girîng e. Di dîroka Rojhilata Navîn de ku bi vê dîrokê dest pê dike, nexasim di dema destpêkirina vê dîrokê de sistema li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê û herêmên çol ên cîran ji bo cinsê mirovî bi awayekî awarte derfetên qût û zad, ewlehî û îmkânên zêdebûnê hêsan dike. Wexta ev hersê hêman têne cem hev an jî bi hev re peyda dibin, ji bo cinsekî zindî sensekî awarte yê jiyânê tê hesibandin. Cinsê mirov ê ji Efrîka Rojhilat derketiye û beridandina wî li derdora heft mîlyon salan tê qebûlkerin, seranserê Efrîka Rojhilat derbas dike, ji Deryasor di qûntara çiyayên Rojhilatê Deryaspî re heta Rîfê (qelşa kutleya du erdên sereke pêk tînin) diçe Torosan xetê belavbûnê ya xwezayî xêz dike. Bi qasî ku tê tespîtkirin herî kêr ji mîlyonek salî ve timî mirov herikîne Asya û Ewropayê. Kevana Toros-Zagrosan di vê rêwîtiyê de misêwa bi rola stasyonê bingehîn rabûye. Bi vî awayî em girîngiya jeolojîyê baştir fêhm dikin. Herî kêr bi qasî van qûntarên çiyayan, çolên cîran ên di dema xwe de gelekî bi bereket jî bi roleke bi heman rengî rabûne. Bi dawîbûna Serdema Qeşayî ya Dawî re şert û mercên mayînê li van stasyonan peyda dibin û ev yek dihêle ku di dîroka cinsê mirov de qonaxeke nedîtî dest pê bike. Em îro ji vê cografya û erdnîgariyê re Rojhilata Navîn dibêjin. Girîngiya herêmê ya jeolojîk, biyolojîk û civakî ji ber vê rastiya nêz a dîrokî ye. Rojhilata Navîn êdî parçeyekî cografyayê yê ha yellah nîne, wî mekanî pêk tîne ku li ser dika wê dîroka gerdûnî wê bê listin.

Li gorî qenaeta hevpar a zanistî cinsê mirov heta piştî serdema qeşayî ya dawî bi rêxistineke tîpa klan a ji 25-50 kesî pêk hatî, nebihurîye. Civaka klan weke yekîneyên pêşî yên kominên piçûk hatine dîtin û ev yek 'şovenîzma şaristaniyê ye' ku piştî pêşketiye. Mirovatîyê ji sedî 98'ê dîroka xwe bi civakeke bi vî awayî derbas kiriye. Klan, di pêkhatin û çêbûna civakê de bi rola hucreya dayik an jî sereke radibe. Çawa ku di pêkhatina zindiyên de bi hewldana mîlyaran salî ya hucreya dayik gav ber bi pêkhatina tîpên nebat û heywanan hatiye avêtin, serhatiya jiyânê ya mîlyonan sal a civaka klan jî derfet daye ku gav ber bi civaka heterojen ve bê avêtin. 'Şoreşa Civaka Pirranî' yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye. Kengî 'zimanê sembolan' şûna 'zimanê îşaretan' girt, mirovatîyê ev qonax derbas kir. Zimanê sembolan ê mirov, ji ber awayê xwe yê qirik û bedenê, xwediyê potansiyeleke mezin a pêşketinê ye. Derfeta zimanê sembolan wê şoreşa fikrê jî mumkîn bike.

Dîrok herçiqasî di çarçoveya avahiya jeobiyolojîk a Efrîkayê de texmînî behsa bike ku divê zimanê sembolan beriya serdema qeşayî ya dawî li derdora 100.000 salî pêk hatiye. Di vê mijarê de zanyar hemfikir in. Agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî yê zelal hene ku komên weke Semîtîk têne binavkirin li derdora şeş hezar sal berê ji Sehra Mezin heta bi çolên Erebiistan û Îranê yê ji aliyê dar, pel û pincaran ve dewlemend li dora zimanê Samî 'sîstema qebîleyan' bi awayekî berfireh pêk anîne. Ji zimanên Efrîkayê yê îşaretan ên gelekî dewlemend, derbasbûna sîstema qebîleyan a xwe dispêre awayê zimanê sembolan ê Semîtîk, yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye. Ev koma çand û ziman, çî di şoreşa cotkarî ya neolîtîk û heywan xwedîkirinê de û çî jî di şoreşa bajêr de (medeniyet, şaristanî) wê bi roleke mezin rabe.

Duyemîn şoreşa mezin a zimanê sembolan li ser avahiya jeobiyolojîk a sîstema çiyayên Toros-Zagrosan komên sîstema qebîleyên Aryenîk pêk hatiye ku weke koma Hind-Ewrûpa jî têne binavkirin û ev yek jî dîsa bi xebatên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hê zelaltir hatiye piştrastkirin. Rola vê komê di şoreşa bajar û cotkariyê de jî sereke ye ku ev jî xisleteke girîng a rastiya piştrastkirî ye.

Sêyemîn koma mezin a zimanê sembolan li başûrê daristanên Sibîryayê ji aliyê sîstema qebîleyên weke koma zimanê Ûral-Altay têne binavkirin pêk hatiye. Ev komên behsa wan têne kirin, piştî serdema qeşayî heta bi Çîn, Moxolîstan, Tirkîstan û Fînlandiya îro belavbûne û bi qasî herdu komên pêşî nebe jî di dîroka gerdûnî de hem di warê şoreşa neolîtîk û hem jî di warê şoreşa bajêr de, kêrhatîbûna wan girîng e.

Li Qafqasan, Emerîka û hin komên din ên îzolebûyî bi awayekî marjînal be jî çî di warê zimanê sembolan, çî jî di warê şoreşa bajêr û cotkariyê de rola wan heye û di vî warî de agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hene.

Bi tevahî xebatên zanistî yê jeolojîk, arkeolojîk, antropolojîk, etnîsîte û zimên piştrast bûye ku şoreşa gund-cotkariyê bi awayekî bingehîn li sîstema qûntara çiyayên Toros-Zagrosan ku di dîrokê de weke 'Hîlala Bi Bereket' jî tê binavkirin, li ser avahiya jeobiyolojîk û girêdayî cureyan pêşketiye. Ev qonaxa şoreşê di dîroka gerdûnî ya mirovatiyê de bingeh e. Ez neçarim careke din destnîşan bikim ku mebesta min ji şoreşê ew e; cewherê wê û çawa pêk hatiye. Girîngiya vê şoreşê pirralî ye. Yekemîn, civak ji qonaxa civaka klan a demdirêj (komên piçûk ên homojen-yên dişibin hevdu) derbasî qonaxa 'sîstema qebîleyan' a heterojen (pirriyên cihêreng) bûye. Sîstemên qebîleyan ên xwe dispêrin zimanê koka wan hevpar, nivkoçer û nivbicîhbûyî ne, di nava xwe de tiştên weke diyariyan pevdiguherin, perestgehên wan ên hevpar hene û bûne xwediyê mekanên lê miriyên xwe veşêrin, şêweyekî civakî yê demdirêj in. Erdkolanên arkeolojîk ên li Girê Navikê yê li nêzî Ûrfayê ye, ji bo rohnîkirina dîroka mirovatiyê weke 'supernovayê' tê qebûl kirin. Di erdkolanên li Girê Navikê de kevirên tîk ên perestgehê yê 10.000 salan B.Z. hatine avakirin, nîşan didin ku sîstemên qebîleyan ên berî şoreşa cotkariyê weke têne zanîn ewqasî paşvema yî nînin, berevajî, avahiyên civakî yê têra xwe pêşketî ne, û ev yek jî weke keşfeke girîng a dîrokî derdikeve pêşberî me. Ev kevirên tîk ên perestgehê yê hatine verotin û bi awayekî xelekwarî li kêleka hev hatine danîn, nîşan didin ku li Girê Navikê jiyanekê xurt a fikir û hisan pêk hatiye. Divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku jeobiyolojiya Ûrfayê ji bo pêşketina sîstema van qebîleyan, rewşeke îdeal pêşkêş dike. Li ser vê sîstema qebîleyê û çanda wê, divê xebatên dîrokî û analîz ji sedî sed bêne kirin û ev xebat çiqasî bêne kirin, bêguman wê dîroka gerdûnî hê baştir zelal bibe.

Duyemîn, pêkhatina gundan heta niha bi şoreşa cotkariyê ve girêdayî hatibû nirxandin. Bi perestgeha Ûrfa-Girê Navikê piştrast bûye ku mirovan ji sîstema qebîleyên nivkoçer gav avêtine avabûna gundan û ev rastiyeke din a civakî ya girîng e. Berê min derketina bajêr û dewletê bi perestgehên rahibên Sumeran ve girêdabû. Bi heman awayî divê ez bi girîngî diyar bikim ku rêveberiyên komin û gundan ango demokrasiya destpêkê ya resen û orjîn jî li dora sîstemên hevpar ên perestgeha van qebîleyan pêk hatiye. Her perestgeha hevpar a bicîhbûyî, dibe hîmê danûstendina destpêkê û şoreşa fikir (huner) û hissa hevpar.

Hingî xusûsa sêyemîn a mirov dikare bîne ziman jî ew e; şêweyê bazirganiyê yê destpêkê û orjîn bi danûstendina diyariyan, di hevdtînen li perestgehên hevpar de pêşketiye. Ya çaremîn, di çavkaniya derketina dîn û huner de jî perestina li perestgehên hevpar heye. Ev herdu kategorî di

destpêkê de bi hev re ne, û hêmanê bingehîn ên çanda manewî ne. Li Girê Navikê wêneyên perestgehê yên gelekî nêzî nivîsê bûne, asta pêşketina fikir û hissan piştrast dikin. Hunerekî welê heye, mîna ku ji mêj ve xeber didin ku wê nivîsên Sumer û Misriyan bên. Mirov hê jî dikare xusûs û şîroveyên bi heman awayî pêşde bibe û bike.

Xusûseke din a girîng ku divê mirov destnîşan bike ew e; ev çand ji ber xisleta xwe ya nîvkoçeriyê xwediyê karektereke gelekî nerm û zû belavbûnê ye. Ev çand di dîrokê de di navbera salên 15.000 û 10.000 B.Z. de di serî de Rojhilata Navîn di asta gerdûnî de belav bûye. Bi vî awayî destnîşankirina vê xusûsê wê vegotinên dîrokî têra xwe rohnî bike. Li gorî qenaeta min a şexsî, vê çandê tevahiya Asya, Efrîka, Ewrûpa, Emerîka û heta Awûstûralyayê ji aliyê çandî ve fetih kiriye.

3- Avabûn û Pêşketina Civaka Exlaqî-Polîtîk û Zihniyeta Wê

Meqseda min ji civaka xweza ev e; cins û cureyê mirov piştî ku ji prîmatan qut bû, komên mirovan sîstemek meşandin heta civaka hiyarersîk. Pêvajoya piştî prîmatan dest pê dike û heta civaka hiyarersîk dewam dike, civaka xwezayî ye. Ev sîstem a komên mirov e. Bi gelemperî ev komên mirovan ên ji 20-30 kesî wek klan têne bi navkirin û bi sedema alav û amûrên ji keviran bi kar anîne jî wek serdema mirovatîyê ya Paleolotîk û Neolotîk jî tê bi navkirin. Ev komên mirovan di xwezayê de nêçîrê dikin, gîha û pincaran berhev dikin û çî hazir dibînin xwe pê xwedî dikin. Bi gotineke din, debara xwe bi hebûnên amade yên xwezayê dikin. Hinekî mîna cinsên heywanan ên dişibin wan xwe xwedî dikin. Lewra em nikarin behsa pîrsgirêkeke civakî bikin. Klana me, wê timî lêkolîn bike; dema bibîne wê yan berhev bike, yan jî nêçîrê bike. Her ku alet û amûran vedibîne, agir keşif dike, berhemên wan zêde dibe û wek cins pêş dikeve û bi lez ji prîmatan dûr dikeve. Rêzik û pîvanên beridandin û tekamulê pêşketinê diyar dike.

Mirovê civaka xwezayî klanê ku endamê wê ye, herî kêr wek hemû endamên din ên klanê bi pîvana parastin û hebandinê ya “bêyî wê nabe” girêdayî ye. Her endamê klan û qebîleyê ji yê din jiyaneke cihê û payeberz nafikire. Jiyaneke li derveyî klanê jî nafikire. Dikare nêçîrê bike û heta dikare mirovxuriyê bike. Lê ev hemû ji bo klan û qebîleyê tîn kirin. Pîvana di nav klanê de “yan hemû yan hîç” e. Agahiyên derbarê civakê de hemû van taybetiyên klanan destnîşan dikin. Hebûn û şexsiyetek in. Hukum û şexsiyeta ferdan li derveyî klanê nayê fikirîn. Girîngiya klanê di bingehê destpêk û bûyîna şêwaza mirov de heye. Civakeke ku tê de çîn, hîyarersî, mêtîngerî û serhevrebûn nîne. Bi mîlyonan sal meşiyaye. Ji vê mirov dikare encameke wiha derbixe; cinsê mirov wek civak têkiliyên xwe demeke dirêj bêyî serdestiyê bi pîvana piştgiriya rê ve biriyê. Xwezayê wek “dayikek” di himbêza wê de mezin bûye, di mejiyê xwe de bi cih dike. Di nav xwe û xwezayê de tevdebûn pîvaneke bingehîn e. Sembola têgihîştina li klanê totem e. Dibe ku totem yekemîn têgîna mucered û ne berçav a sîstemekê be. Ev nîzam ku wek dîne totem jî tê nîrxandin pîrozbûna destpêkê û sîstema tabûyan ava dike. Klan xwe bi sembola totem pîroz dike. Bi vê rê, cara pêşîn têgîna exlaq jî dikeve jiyana mirov. Pir baş serwext e, eger koma klanê nebe jiyana dewam nake, wê demê hebûnên civakî pîroz in, divê wek nîrxên mezin bêne simbolîzekirin û stû ji wan re were xwarkirin. Baweriya dînî jî hêza xwe ji vê çavkaniyê werdigire. Bi vî awayî dîn dibe yekemîn forma têgihîştina civakî. Ew û exlaq hevdu temam dikin. Ji zanebûn û têgihîştinê ber bi baweriyeke hişk ve diçe. Têgihîştina civakê êdî bi forma dîn dimeşe. Dîn bi vê taybetiya xwe, dibe hafiza bingehîn a civakê, çavkaniya exlaq û kevneşopîyeke bi bingeh. Civaka klanê, bi pratîka xwe çendîn zanebûn û têgihîştinê pêş de dibe vê yekê hemû bi totem yanî bi qabîliyeta xwe ve girê dide.

Dîne totem di vê pêvajoyê de pîroz dibe. Ji ber ku civak bi dîn yekemîn nasnameya xwe bi dest dixwe girîng e. Ev rewş, têgihîştin û serwextbûna seretayî îfade dike. Pîrozbûna serwextbûnê bi vî rengî ji jiyana civakî bi xwe tê. Piştî ku veqetîn ji jiyana heywanî ya prîmat bû, cudahiya mezin a manedanê destpêkir. Cudahiya nû balkêş e. Taybetiyên yekemînbûnê di himbêza xwe de hildigire. Pratîka civakî di hemû gavên girîng de rê li ber pêşketinê bi heyecan vedike. Ev rewş serwextbûna zêde dibe îfade dike. Serwextbûn û têgihîştinê bi lêv dike, tîne ziman, bi nav û tarîf dike û pêre pêvajoya simbolîzekirinê dest pê dike. Pêvajoya têgihîştin û serwextbûnê ji bo pratîk û hilberandinê roleke xwe ya girîng heye. Bêyî têgihîştin mayîna li ser piyan zehmet dibe. Kalîteya jiyana tenegehîştî yekser tê dîtin. Kalîte û pêşketina naverok tijî bi cudabûna serwextbûnê re bi hev re dimeşin. Dîn hemû girîng bûn û pîrozbûna xwe di vê qonaxa nazik a

jiyanê de werdigire û ji serî ve di nava xwe de nakokiyekê dihewîne. Ji ber ku civakîbûyîna seretayî, serwextbûn û nasnameyê îfade dike, jiyan bêyî civakîbûyîna zehmet e. Li aliyê din, ji ber ku pîrozbûnê, tabûtiyê – destpê nekirin, dest nedan, qadên heram û gelek rêzikan bi xwe re tîne, ji bo paşerojê muhafizekar e. Li serwextbûn û têgihîştinên nû girtiye. Bi vê taybetiya xwe pêşketinê herbend dike. Ji vê yekê, hê ji serî ve, pêvajoya pir dînan xwe ferz dike. Pir dîn û pir xweda, cudahiya di navbera têgihîştinan de îfade dikin. Erênî ye. Di destpêka dîn de her tişt bi ruhan – anîmîzm – dihat ravekirin, ev encameke nertina xwezayî ya pradigma civakî bû. Erênî ye. Pişt re her ku çû, ruhê mezin û ji wir jî derbasî pêvajoya xwedatiyê bû, ev yek ponijandina civakê ya ji bo bidestxistina nasname û xweseriyê îfade dike. Di vê pêvajoyê de nasname û xweserî sembolîze dibin. Di destpêkê de xweda civak bi xwe ye.

Wek sembol totem û di rastiyê de jî koma mirovan her diçe serketinê bi dest dixîne û pê re pîrozkirina serketinan tê. Pîrozkirin qûtsiyetê û qûtsiyet jî dibe hêza civakê. Pîrozbûna bi hêza civakê pêk hatiye zêdetir xwe eşkere bi sêhr û efsûnkariyê nîşan dide. Asta têgihîştinê dikare xwe bi efsûnkariyê bixe pratîkê. Sihirbazî jî dayika zanistê ye. Jin bi sedema timî li xwezayê temaşe dike, zayîna nas dike, jiyanê dibîne û ev yek wê dike zana û hozana civakê. Ji ber vê rastiyê ye, sihirbaz û efsûnkar bi piranî jin in. Bi sedema xebat û tevgera xwe di civaka xweza de çî diqewime, çî dibe, herî baş jin fêhm dike. Ji vê serdemê, li ser hemû berhemên hatine verotin û niqirandin şopên jinan hene. Klan yekîtiyek e, li dora jina dayik pêk tê. Zarokanîna jinê, nertina wê li zarokan û bi sedema nebatan baş berhev dike, ew dikare baş xwedî jî bike. Zarok tenê dayikê nas dike, hîna mêr wek milk li ser jinê xwediyê tesîrekê nîne. Nedihat zanîn jin ji kîjan mêrî ducanî dibe, lê dihat zanîn zarok ji kîjan jinê dibe. Ev mecbûriyeta xwezayî, hêza civakîbûna xwe dispêre jinê jî nîşan dide. Peyvên di vê serdemê de bûne tîgîn bi piranî mê ne, û ev jî vê rastiyê îspat dikin. Di vê serdemê de şervanî û serdestiya mêr, paşê bi nêçîra heywanên xurt derdikeve pêş. Mêr bi taybetiyên xwe yê bedenî û fizîkî diçe dûr nêçîrê û neçar dimîne klanê ji xeteran biparêze. Ev rolên mêr ên diyarker nînin, sedemên tepisok mayîna wî jî rave dikin. Di nav klanê de tîkiliyên taybet hê pêş neketine. Berhevkirina nebatan û nêçîr a her kesî ye. Zarok ên hemû qebîlê ne. Ne mêr û ne jî jin hê taybet nebûne. Ji ber van taybetiyên bingehîn ji civakê re tê gotin civaka seretayî ya komînî.

Forma klanê û awayê wê; zemînê pêşketina tîgînên bawerî û zanebûna bingehîn in, di heman demê de bîr û hafiza seretayî û derketina civakê ye. Di klan û qebîleyê de civakeke tîkûz a xwe spartiyê hêza jinê û hawîrdora xwezayî heye. Mirovatî hebûna xwe bêyî mêtîngerî û zordestiyê, bi piştgirîya hevdu dimeşîne. Bi gotîneke din mirovatî ji van nîrxên bingehîn pêk tê. Ev tecrubeyên civakî yê bi milyonan sal ajotîne ji dest neçûne, jixwe fikirandîneke berovajî tewş û beradayî ye. Di xwezayê de weke ku ti tişt wenda nabe, di şêwazê hebûna civakê de ev rastî hêza xwe hê zêdetir dewam dike.

Pêşketina nîrxên serdema klanê di nav sentezên nû de dewam dikin. Eger îro jî tîgînên wekhevî û azadiyê wek du tîgînên bingehîn werin naskirin, ev yek bi saya jiyana serdema klanîyê ye. Wekhevî û azadî bêyî bibe tîgîneke mirov lê serwext bibe, bi awayekî xwezayî di şêwaza jiyana klan de veşartiyê. Ev tîgînên bi dizî di bîr û hafiza mirovan de dijîn, dema bêne wendakirin, wê dîsa bi derbê xurt xwe wek pîvanên bingehîn ên civaka pêşketî ferz bikin. Wexta civak ber bi saziya dewlet û hiyarkerşîk ve biberide û biçê, azadî û wekhevîyê bi dijwarî van saziyan bişopînin. Ya rastîna a dişopîna di cewherê xwe de civaka klanê bi xwe ye.

Eger mirov azadiyê weke pirrbûn, cihêwazbûn û pirrcurebûna di gerdûnê de bide naskirin wê di diyarkirina exlaqê civakî de jî ravekirinê hêsan bike. Hebûneke di hinavê xwe de zimnî be jî pirrbûn, cudabûn û pirrcuretiyê hilgire, jêhatbûna hebûneke bi aqil a dikare hîlbijêre tîne bîra mirov. Lêkolînên zanistî piştrast dikin ku aqlekî nebatan ber bi pirrcuretiyê û cihêrengiyê ve dibe heye. Pêkhatinên di şaneyê zindî de heta niha ti fabrîkeyê ji destê mirovî derketî nikarîbûye pêk bîne. Belkî bi qasî Hegel em nikarin behsa mejiyê gerdûnê (Geist) bikin. Lê dîsa jî mirov behsa tiştêkî mîna mejiyê gerdûnê bike divê bi temamî weke tiştêkî tewş neyê dîtin. Em cihêwazbûnê ji bilî mejiyê hebûnê nikarin bi vegotîneke din bînin ziman. Pirrbûn û pirrcuretiyê timî azadiyê bi bîra mirov dixin û dibe ku ev jî ji çîpîskên ji mejiyê hebûnê diçin e. Bi qasî ku tê zanîn, mirov dikare insên weke hebûna herî bi aqil a gerdûnê bide nasîn. Baş e, mirov ev mejî û aqilê xwe çawa girtiye? Ji aliyê zanistî ve jî (fizîkî, biyolojîk, psîkolojîk û sosyolojîk) min mirov

weke xulaseyeke gerdûnê dabû naskirin. Di vê danasînê de mirov weke kombûneke aqilê gerdûnî tê terîfkirin. Ji lewra di gelek êkolên felsefîk de jî mirov weke makêteke gerdûnê hatiye pêşkêşkirin.

Xwezayên civakî weke cewher exlaqî û polîtîk in. Mirov nikare li civak û ferdê bê exlaq û polîtîk bifikire. Dikarin civakê neçarî bê exlaqî û bê polîtîkabûnê bikin. Dikarin qabîliyeta exlaqî û polîtîk kotrimî bikin û ewçend lawaz û qels bikin ku nikaribe bi rola xwe rabe, lê ti carî nikarin tine bikin. Tinekirina wê bi tenê bi awayekî mumkîn e, ew jî kengî ji civakbûnê derkeve. Exlaq û polîtîka amûrên bi hêz ên heqîqeta civakî ne. Mehrûmbûna ji exlaq û polîtîkayê rê li ber bêheqîqetiyê vedike, li qadên çalakiya bi hêz a exlaqî û polîtîk jî hebe, şewazên xweîfadekirinê yên heqîqetê jî bi hêz û şefaf dibin. Yek ji mijarên girîng ên Marksîst têde xapiyan ew bû ku wan exlaq û polîtîka weke avahiya jor raber kir. Ti ferd û komika civakê nîne exlaqî û polîtîk nebe. Her komik û ferdê civakê hem exlaqî hem jî polîtîk e. Demokrasî bi civaka exlaqî û polîtîk re di wezn û rêjeyekê de ye. Demokrasî rewşa civaka exlaqî û polîtîk a dixebite îfade dike. Heqîqetên civakî xwe herî zêde weke civakên demokratîk nîşan didin. Îfadeyên heqîqetê bi awayên felsefe, zanist û hunerê herî baş bi civaka demokratîk bi ser xwe ve tên. Ev tespît diyar dikin, bê ka çima heqîqet herî zêde bi civaka exlaqî û polîtîk bi ser îfadeyên xwe ve dibin.

Di civaka mirov de asta mejî û nermbûna wî, bingehe rastî yê avakirina civakî pêk tîne. Di vê çarçoveyê de mirov azadiyê weke hêza avakirina civakî bide nasîn di cih de ye. Em dizanin ku ji komên mirov ên pêşî vir ve ji vê re helwesta exlaqî hatiye gotin. Hingê exlaqê civakî bi tenê bi azadiyê pêkane. Ya rastî, azadî çavkaniyê exlaq e. Em dikarin exlaq weke rewşa azadiyê ya hişkbûyî, bi rêûersmbûyî yan jî bi rêzîkbûyî diyar bikin. Eger hîlbijartina exlaqî çavkaniya xwe azadî be, û mirov têkiliya azadiyê bi mejî, serwestbûn û aqil re li ber çav bigire, mirov dikare exlaq weke serwestbûna kolektîf a civakê (wijdan) destnîşan bike û ev jî tê fêhmîkirin. Di vê çarçoveyê de ji exlaqê teorîk re gotina etîk bi vî awayî dikare maneyek xwe hebe. Ji bilî bingehe exlaqî yê civakê em nikarin behsa etîkekê bikin. Bêguman ji ezmûnên exlaqî mirov dikare felsefeyeke hê bi tesîr a exlaqî ango etîkê derxîne. Lê etîka lihevçêkirî nabe. Tê zanîn di vê mijarê de jî E. Kant gelekî hewl daye. Mirov dikare fêhm bike ku Kant çima ji aqlê pratîk re etîk gotiye. Di heman demê de exlaq weke hîlbijartineke azadiyê û îmkanê wê şîrove kiriye, ev fikra wî jî ji bo roja me ya îro hê di cih de ye.

Mirov dikare exlaq weke tevahiya helwestên di dema avabûna civaka pêşî de hatine nîşandan, bi nav bike. Ev jî tevahiya tevdir, çalakî û karên civaka destpêkê ne ku ji bo parastin, debar û zêdebûnê kirine. Ev tevahiyên me destnîşankirî çendîn dibin rêûresm û kevneşopî, ewçend exlaq têne hesibandin. Li gorî ku civak bê parastin, bê debar û bê xwe zêdekirinê nikare dewam bike, ji ber vê jî ez dibêjim civaka bê exlaq nabe. Têgîna polîtîkayê tevî ku têgîneke hinekî cihêreng e jî ji nêz ve bi exlaq re têkildar e. Cudahiya xwe ji exlaq ew e ku çalakiyeke rojane ye. Exlaq weke qalibên strandart kar pê dibe û bi rola xwe radibe, polîtîka ji bo pirsgerêkên rojane derdikevin pêşiya civakê biryaran dide, ji tevahiya van biryaran re polîtîka tê gotin. Tevahiya van biryaran çiqasî bibin rêûresm û kevneşopî, ewçend jî bi rêûresmên exlaqî re dibin yek û bi xwe dibin rêzik û pîvanên exlaqî. Ango herdu hevdu xwedî dikin. Exlaq weke rêûresm, çarçoveyekê dide polîtîkayê, polîtîka jî bi biryarên nû yên kar pê tê kirin, vê çarçoveyê misêwa fireh û kûr dike. Ji lewra mumkîn nabe ku mirov herdu têgîn û diyardeyan bi temamî ji hevdu cihê bike.

Bêguman li cem klanê exlaq û polîtîkakeke gelekî besît heye. Ya girîng ew e, heye. Besîtbûyî girîngiyê ji holê ranake. Berevajî girîngiya wê piştrast dike. Heta mirov dikare bibêje, exlaq îfadeya xwe ya herî bi hêz di dema civaka klan de pêk aniye. Mîna ku di rola îfadeya xerîzeyê hundir de be. Li gorî wî (exlaq) jiyan şertê hebûnê yê bivê neyê ye. Klana exlaqê xwe ji dest dayî, klana ji hev belav bûyî, ji hev hatiye belavkirin an jî hatiye tinekirin. Bi rêzîkên besît îfadeya wê mirov bi tenê dikare bi jiyانبûna wê şîrove bike. Ji aliyê dayîna ber hev mirov dikare bibêje, di roja me ya îro de tevî ku timûtim rêzik û pîvanên huqûqê têne bînpêkirin jî di civakê de ti tişt nabe. Belkî jî bi sedema muhafezekariya huqûqê ev bînpêkirin bi roleke erênî jî rabin. Lê di klanê de xirabûna rêzik û pîvanan dawîya komê tîne.

Ji bo polîtîka jî mirov dikare heman xisletan diyar bike. Klan du karên xwe yên gelekî besît weke nêçîrvanî û berhevkerina pel û pincaran heye. Bêguman bi tevahî endamên klanê bi xwe li ser nêçîrvanî û berhevkerina gihayan hezar caran guftûgo dikin, dişêwirin, danûstendina ezmûnan dikin, hin endamên xwe wezîfedar dike, polîtîkayên xwe yên nêçîrvanî û berhevkerinê

pêk tîne û hewl dide bi awayekî herî berhemdar encam jê bigire. Naxwe bi awayekî din jîyan mumkîn nedibû. Çi wê çawa bê peydakirin û berhevkerin polîtîkaya bingehîn bû ango zibare û palûte bû (polîtîka weke karekî hevpar tê terîfkerin.) Hingê civaka klan gelekî besît e, lê komeke polîtîk a heyatî ye. Rojekê polîtîka nikirina wê bimirana. Ji ber vê sedemê polîtîka çaviyeke gelekî heyatî ya fonksiyonel û kêrhatî ye. Belkî jî xisletên wî yên din hemû bi prîmatên din re (heywanên nêzî mirovan) wekhev bûn. Cudahiya wan a bi tenê û girîng ew bû, çaviya exlaqî û polîtîk a besît pêşdebiribûn. Amûr bi xwe jî kengî polîtîka bûbûya diketin dewrê. Pêşketina ziman bi xwe jî li ser bingehê exlaqî û polîtîk mumkîn e. Tecrûbeyên civakî yên zêde bûne rê li ber xurtbûna maneyê, ji vir jî ziman û ber sembolîzekirinê pêvajoyek heye. Têgîna ziman têkiliya xwe xurt bi têgîna çandê re heye. Di çarçoveyêke teng de ziman bi awayekî bingehîn têgîna sereke ya qada çandê ye. Di çarçoveyêke teng de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman daneheva civakî ya zêhniyet, exlaq, his û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û zêhnî ya mane û hisê ya serwestbûyî ye, bûyî xwedî îfadeyê. Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bi hêz a jîyanê. Asta pêşketinê ya ziman asta pêşketibûna jîyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî pêşde biribe, ew tê wê maneyê ku asta xwe ya jîyanê jî pêşde dibe. Dîsa çiqasî zimanê xwe ji dest dabe û ketibe bin hegemonya zimanên din, ev jî tê wê maneyê, ewqasî hatiye mêtin, qirkirin û asîmîlekirin. Civakên xwediyê vê rastiye jîyanê wan a manedar a zêhniyet, exlaq û estetîkê nabe û eşkere ye ku heta ji holê rabin wê weke civakeke nexweş mehkûmê jîyanêke trajîk bimînin. Civakên mane, exlaq û estetîka xwe ji dest bidin, nixê wan ên civakî jî bi tenê ji bo nixê mêtinkaran dibin maddeya xam a bikaranînê.

Divê em hîç ji bîr nekin ku hêmanên hewcedariya bi peyivandinê bi lez dikin guftûgo û biryar in. Polîtîka rastî ji sedî sed a bi tevlibûn û guftûgoya demos (tevahiya saziyên civaka netewe hemû weke qebîle, malbat, eşîr û qewm) tê pêkanîn e. Polîtîka diyardeyêke welê nîne ku bê gel, civak û tevlibûnê pêk bê. Ango polîtîka neçare demokratîk be, ji lewra jî divê exlaqî be. Civaka demokratîk nebe nikare polîtîk, ya polîtîk jî nebe nikare exlaqî be. Ev hersê îfadeyên têgînî û diyardeyî bivê nevbê hebûna hevdu yek ji bo ya din hewce û ferz dikin. Li vir were gotin, hewcedariya bi xwe xwedîkirinê li ser bingehê exlaqî û polîtîk e, li gorî min bê mane ye. Bêguman amîpên tek hucreyî jî hewcedariya xwe bi xwe xwedîkirinê heye. Lê em nikarin behsa exlaq û polîtîkayên amîpan bikin. Cudahiya mirov ji amîpan ew e, xisleta wî ya hewcedariya xwe ya bi xwe xwedîkirinê misêwa bi nêzîkatîyên exlaqî û polîtîk pêşde dibe. Di vê çarçoveyê de doktrîna Marksîst a dibêje “Ekonomî her tiştî diyar dike” zêde raveker nîne. Ya girîng ew e, ekonomî çawa tê diyarkirin. Li cem cinsê mirov ev rewş hewce bi qada civakî, bi çaviya exlaqî û polîtîk dibîne.

Têkiliya azadiyê bi polîtîkaya civakî re rewşeke xuya dike. Qada polîtîk ew qad e ku herî zêde aqilên pêşbîn li ser wê pevdîçin û hewl didin encam bigirin. Bi awayekî din mirov dikare weke qada kirdar xwe bi rêya hunerê polîtîk azad bikin bide naskirin. Her civaka nikare polîtîka civakî pêşde bibe divê baş zanibe ku berdêla vê yekê bêpar mayîna ji azadiyê ye û fatûra vê li wê were birrîn. Meznahiya hunerê polîtîkayê bi vî awayî derkeve pêşiya me. Her civaka (klan, qebîle, qewm, newete, çîn û heta amûrên dewlet û desthilatdariyê) nikaribe polîtîkaya xwe pêşde bibe mehkûmê têkçûnê ye. Jixwe pêşdenebirina polîtîkayê tê maneya nasnekirina wijdanê xwe, berjewendiyên xwe yên heyatî û nasnameya xwe. Ji bo civakekê ji vê têkçûn û ketineke xedar nîne. Civakên bi vî rengî bi tenê ji bo wijdanê xwe yê kolektîf, nasname û berjewendiyên xwe rabûn ser piyan, bi gotineke din wexta ketin nava têkoşîna polîtîkayê xwesteke azadiyê dikeve rojevê. Xwestekên azadiyê yên bêyî polîtîka xwe xapandineke bi tehlûke ye.

B- ŞARISTANIYA NAVENDÎ

a- Weke Têgîn û Teorî Şaristanî

Civaka şareza, heta niha gelek fikir li dijî wê û ji bo palpiştiya wê hatine ziman. Lê ya herî bi zehmetî hatiye îfadekirin û bi awayekî serketî nehatiye kirin, rexnekirina şaristaniyê bi awayekî radîkal û gavavêtina ji bo bihurandina wê ye. Ev yek jî serneketina şîroveyên hatine kirin nîşan dide. Hukmekî hevpar e ku tê gotin; li ser xwesteka mirovatîyê ya ji bo azadiyê zext û

zordestiyeke mezin çêbûye. Gelek caran tê gotin; ji zû ve gihiştîye sînorekî wisa dewam nake. Hegel dîroka şaristaniyê dişibîne seremoniyeke 'selexaneyê' û bi vî awayî wê mehkûm dike. Saleke wê ya bê şer derbas bibe tine. Jiyana bi zor û zext mîna qanûneke xwezayîbe tê nîşandan. Îstîsmar mîna rêzik û pîvaneke jiyane tê qebûlîkirin. Duristî, pakî û sadetî weke kêmaqilî tê dîtin.

Ez dixwazim bigihîjim vê: divê mirov şîroveyekê bike ku têde cih bide rexneyeke dixwaze ji civaka şareza bibihure. Bi rexnekirina modernîteya kapîtalîst bi tenê civaka şareza li dawiyê namîne û nayê bihurandin, ev yek di serî de Marksîst ji hewldanên gelek ekolan eşkere bûye. Di vê de sedema bingehîn ew e ku civaka şareza ya weke xeleekekê pêve ye, nehatiye analîzkirin. Fikra dinyayê ya navend-Ewrûpa hema bêjin dijberên xwe yên herî hişk jî bêtesîr kirine. Çawa ku di têkiliya çanda neolîtîk û şaristaniya Ewrûpayê de, di têkiliya civak û dîroka şaristaniyên berê û şaristaniya Ewrûpayê de jî şîrovekirineke were fêhmîkirin yek ji wan xusûsan e hewcedariya me pê heye. Mehkûmiyeta min a di bin zexteke dijwar a vê şaristaniyê de, bi amatorî be jî di vî warî de pêşdebirin û xurtîkirina şîroveyê hem weke heqekî, hem jî weke wezîfeyekê datîne pêşiya min.

Şîrovekirina şaristaniyê berê pêşî pirsgirêkeke sosyolojiya pêkhatinê ye. Eger şertê bingehîn ê ku ji bo zanist bibe zanist ew e ku mirov di nav çirava pozîtîvîzmê de neperpîte, ji cihêwazîkirina obje-sûbje bibuhure û bigihîje 'zanista manedanê', hingî herî zêde hewcedariya sosyolojiya pêkhatinê bi vê qadê heye. Wezîfeya bingehîn a sosyolojiya giştî (çawa ku ya bijîşk jî teşxîs û dermankirin e) destnîşankirin û dermankirin e. Sedemeke bi tenê ya zanînê dikare hebe: jiyana em pîr pêve girêdayîne manedar bike. Manedarkirina jiyane jî wê derfet û îmkane bide me ku em karibin pirsgirêkên pêkhatinê fêhm bikin û eger hebin aliyên nedurîst ên pêkhatinê, em ê karibin ji nû ve ava bikin.

Ji bo zanista manedanê, civaka şaristaniyê lod û gidîşeke pêkhatinê ye ku herî zêde têde zehmetiyê dikişîne. Hebûna vê lod û gidîşa pêkhatinan, yekser û ji nêz ve têkildarî jirêderxistina zanista manedanê û bêmanekirina wê ye. Levîathanek e, mexlûqekî sosret e; çî sîlehên wî hene di dest de, bi ser qurbanê xwe de diçe. Qurbanê wî jî li ber ruh dide. Weke gotina dawî wê yan qurbana wî bi "DEREWÊ" mikur bê, yan jî bi her şewaz rêbazê "TINE" dike. Mirov vê şaristaniyê, weke helwesteke li cih dikare bişibîne her cure cinawirî. Lê ev jî helwesteke paşvemaî ye. Tew pênaseya me ya zanyariyê hebe, ev ê tenê xeyalên me (xeyalên cinawiran) yên zarokatiyê be, û jê wêdetir ne tiştekî din. Bi hostayî teşxîskirina cinawir têr nake. Ya divê bi lez û bez were kirin, dermankirin e. Eşkere li naverastê ye, bi tevahî hewldan û ceribandînan ji bo dermankirinê negihîştinê encamê û pûç bûne. Ez bi hevokê dikarim rewşa herî dawî rapor bikim; di qonaxa wê ya dawî de lehiya xwînê rabûye, jiyana bi gelek êş, jan û qirkirinê derbas dibin, ya herî xerab birçîbûn û bêkarî, her cure nexweşî û şewb, û talankirin û hilweşandina eko-hawîrdorê (hawîrdora ji bo jiyane hewcedariya me pê heye). Eger sosyolojiya me ya pêkhatinê û azadiyê dixwaze ji loda sergo ya bi hezaran kesên bi navê civaknasîyê kirine, rizgar bibe; divê hêza xwe ya teşxîs û dermankirinê îspat bike. Naxwe weke Adorno gotî, 'Piştî kampên qirkirinê, bi tevahî xwedayên li ezmanan -zanyarên berdevkiyê dikin- wê gotineke wan a karibin bibêjin tine be.'

Şaristanî ne tenê seremoniyeke 'selexaneyan' e, hîne tiştekî zêdetir e; şaristanî qirkirineke dewamî ya azadiyê ye ku ev azadî yekane sedema jiyana mirov e. Jixwe li dawiyê gincirê jiyane dimîne. Bi teşxîseke hêsantir mirov dikare bibêje ku piştî jiyana azad ji maneya wê hat kirin a jê dimîne şaristanî ye.

1- Bajar, Çîn û Dewlet

Navekî din ê şaristaniyê medenîbûn e, bi Erebi bi maneya 'bajarbûnê' ye. Pirsgirêkên çavkaniya xwe ji bajarbûnê ne, ji pirsgirêkên ekolojîk ne kêmtir û ne jî bêqîmet in. Di roja me ya îro de yek ji çavkaniyên bingehîn ê gefê li jiyana civakî dixwe bajarbûn e. Çi bajar xistê ve rewşê?

Bi têgihiştineke rast û dûz a formulên bajar = çîn = dewlet dikarin mijarê sivik bikin. Lê dikarin kûrahiya maneyê û pîrralîbûna wê kor bikin. Mirovatiyê bi qasî avakirina gund avakirina bajaran jî li gorî xwezaya civakê li cih dîtiye û bi cih aniye. Bajar di serê wan meknan de tê ku mejiyê civakî lê zêde dibe. Bajar jêhatbûna mejiyê mirov tehrîk dike, derdixe holê. Aqil têra xwe bi bajêr ve girêdayî pêşketinek meşandîye. Bajar ew mekan e ku mirov lê hay ji hêza xwe dibe ku dikare çî bike. Bajar ewlebûnê tine. Mirovê bi xwe ewle zêdetir dikare rasyonel bifikire. Fikir jî rê li ber vedîtinên nû vedike. Teknîk û rêbazên zêdekirina hilberandinê pêş ve dibe. Mirovê ev

ceribandî, bajar weke çavkaniya rohnîyê dîtiye û her xwestiye ber bi bajar ve baz bide. Ji ber ku perestgeh di dema xwe de cihê kombûna aqilê pîroz û ruhan bû, bajar jî li dora perestgehan pêş ketiye. Civak aqil û nasnameya xwe li wir zêdetir keşif dike, diafirîne. Ev îhtîmalên bi hêz ên em behsa wan dikin di leha bajêr de ne.

Mîna ku di her rastiye de dibe, rûyekî din ê bajêr jî bi derketina wî re xwe nîşan dide: ew jî çînîbûn û dewletbûn e. Bingehê maddî yê çînîbûnê, bêguman hilberîneriya zêde ye. Ji hin xwediyên aqil ên bajarê mezin dibe bi ceribandîna hîn bûbûn ku eger hejmara mirovan zêde bikin û li nava erdên bi bereket bixebitînin wê karibin qatbiqat ji şênîyên heyî mirovan têr bikin. Ya pêdivî pê hebû bi tenê avakirina vê nîzamê bû. Nîzam dewleta bi awayekî yekdestdarî bû. Di asta bajêr de be jî, ev rêxistina nîzama nû, eşkere ye ku weke yekdestdariya cotkariyê derketiye holê. Bajarên Sumeran di vê mijarê de her tiştî eşkere rave dikin. Gelek şaristaniyên mîna Misr û Harappayê di derketina xwe de yekdestdariyên cotkariyê ne. Amûrên sererastkirina hilberîna ne. Wexta ku têra xwe tê hilberandin, herî kêr ji yê dixebitin qatekî zêdetir karibe berhemê zêde pêşkêş bike û hatibe wê astê, wê wextê bingehê maddî yê dewletê hatiye danîn. Bûyera jêre dewlet tê gotin, ya rastî yê bi hilberîna zêde debara xwe dikin. Eger mirov dewletê weke rêxistina zêdeyîyan berhev dike bi nav bike dibe ku manedartir be. Bajar jî ji bo vê mekanekî di cih de ye. Di civaka qebîle û gund de têkiliyên bi vî rengî gelekî zehmet in. Şêweyê avahiya qebîle û gund derfet û îmkân nadin vê yekê. Di binê derketina dewletê li bajêr de ev rastî heye. Bi vî awayî mirovatî li bajêr bi diyardeya mêtinkariyê re rûbirû dibe. Bi şêweyekî têkiliyê yê nas nake rûbirû dibe. Navê hunerê nû êdî 'dewletgirî' ye. Yê vî hunerî di destê xwe de bigirin ma çi nikarin bikin! Deriyekî mezin ê berjewendîyan e. Koleyê kedkar bi xwe jî fêhm kiriye ku di bêkariya dewletê de ji berê ve gelekî zêdetir ewle û xweşhal e. Mirov xebata wî bi tevahî bi darê zorê ve girê bide wê ev bibe zêde mezinkirina mijarê. Pîr hindik çîroka derketina bajêr bi vî rengî ye.

Herçiqasî xwedî hin pîrsgirêkan be jî (rêxistina bi hêz û mêtinkaran), eşkere ye ku di pêşketina rasyonel a civakê de bajar gaveke şoreşgerî pêk tîne. Arîsto ji bo mezinbûneke îdeal a bajêr pênc hezar şênî difikire. Bajarên dema damezrandîna jî bi pîrînanî şênîyên xwe pênc hezar bûn. Mirovên nû tene cem hev. Mirov ji civaka qebîleyî bihurî ne. Kesên ji ezbet û qebîleyên cuda, bi welatîbûna bajêr bi hev tene girêdan. 'Xelkê bajêr', 'hemşehrî', 'bajarî' bi vî awayî pêk tên. Ev pêşketin dewlemendbûna bajêr nîşan dide. Bajar bi vê rewşa xwe amûrê pêşketinê ye. Çavkaniya pîrsgirêkeke ciddî nîne. Di tevahiya serdema destpêkê de, car caran jî ji bilî Babil û Romayê, pîrsgirêka şênîyan li ti bajarî nayê dîtin. Bajar bi serdestiya civakbûna xwe balkêşiya xwe timî bi hêz dike. Modela Sumer weke lod û gidîşan zêde dibe, Misr jî bajarên hindik û cewherî ava dike. Ya rastî, şaristaniya Misrê weke şaristaniya nîv-bajar û gundî di dîrokê de bê hemta ye. Bazirganî û zenaetkarî gelekî pêş dikeve. Bi rê, mîmarî, spor, huner, avahiyên qesran ên li dora avahiyên perestgehê bi komikên nû fireh dibe. Gelek bajar jî li dora garnîzonên eskerî ava dibin. Nexasim garnîzonên Romayê her yek ji wan mîna kakilê bajarekî ne. Dîroknas behs dikin ku di vê demê de ji her deh gundî re bajarek dikeve. Ango di navbera wan de têkiliyeke sîmbîotîk heye. Ev tê wê maneyê ku di navbera gund û bajar de hê pîrsgirêk nîne.

Bajarê Romayê weke bajarê bi heybet ê dawî yê serdema antîk, belkî jî tevahî pîrsgirêkên serdema xwe di hinavê xwe de hildigirt. Vê yekê jî şaristaniya Romayê hem herî bi heybet hem jî kiribû bajarê herî bi pîrsgirêk. Li Romayê mumkîn bû ku mirov li hemû çîn û koman (arîstokrasî, bûrjûvazî, kole, proleteriya lumpen, her cure komên etnîk, her cure komên dînî, her cure nijad) rast bê. Çîn û komên berê bi awayekî bermahî, yê nû bi awayekî nû ruh bi wan bikeve dihatin temsîlkirin. Li aliyê din, dîsa mumkîn bû ku mirov li şêweyê her cure exlaq, polîtîka û îdareyê rast bê. Bi tevahî mînakên qraliyet, cumhûriyet û demokrasîyê dihatin (li nava împaratoriye) ceribandî. Mirov dikarîbû li tevahiya zanist, huner, felsefe û dînan weke bermahî û mînakên wan ên nû ruh bi wan dikeve rast bê. Roma bi rastî bajarekî ekumenîk (gerdûnî) bû. Tevahiya rê diçin Romayê, maneyeke vê gotinê jî ev rastî bû. Asta herî jor a şaristaniya navendî ya sê hezar û pêncsed salî nîşan dide, hilweşîna wê jî hêjayî heybeta wê bû. Du hêzên mezin ên bûn bela serê şaristaniyê çîna xizanan Xiristiyan û komên hê hêza etnîsîteyê diparastin (eger mirov ji van koman re barbar bibêje mirovê bi termînolojiya şaristaniyê bixape) bi pêlên ji derve û hundir dawî li bajêr anîn. Dîroka 476 P.Z. bi tenê dîroka hilweşîna bajarekî, Romayê nîne, di heman

demê de di kesayeta bajarekî de dîroka hilweşîn, xirabûn û rizîna şaristaniya pêşî ya sê hezar û pêncsed salî û serdema antîk e.

Dema weke serdema navîn tê bi navkirin, ji aliyê bajarbûnê ti carê xwe negihand serdema antîk. Bajarên serdema navîn bi kelhe û bircên xwe bi yeknesak û pîrr piçûk destpêkir. Bajarên serdema navîn bi awayekî mîna biryargehên derebegtî û mîrnîşînan bûn. Li dewrûberê bi kombûna hinek zenaetkar û xizmetkarên qesrê potansiyela xwe ya berfirehbûnê hebû. Çîna bazirganî ji bo heybet û mezinbûnê leza pêşî bide jî mirov avahiyên weke mînakên berê yên bajarên Roma, Skenderiye, Antakya, Dara-Nisêbîn, Ūrfa-Edessayê zehmet e ku bibîne. Di zêdebûna hejmarê de herçiqasî ji yên berê bibihurin jî di warê kêrhatin û mîmariyê de (perestgeh, şano, meclîs, agora, hîpodrom, amfîteatr, serşok, kanalîzasyon, kargeh û avahiyên hwd.) ti carî nikarîbûn xwe bigihînin îhtîşama yên berê. Serdema navîn weke bajar û şaristaniya konan a li ser xirbeyên serdema destpêkê û antîk hatibe avakirin. Bajar hê di wê rewşê de nîne ku serdestiyê li gund û derveyî bajaran bike, ji vê dûr e. Bi awayekî di okyanûsa gundan de mîna giravokan e. Herçiqasî di binveya wan de nakokiyên desthilatdarî û çînî hebin jî hê di wê rewşê de nînin ku rê li pîrsgirêkên hawîrdorê vekin. Sîstema şaristanyê bi giştî, ji ber yekdestdariyên sermayeyê hawîrdorê hêdî hêdî dikeritandin. Xwêgirtina erdan bi yekdestdariya cotkariyê re têkildar bû. Vê rewşê heta bi dawiya sedsala 18. dewam kir û her çû pîrsgirêk girantir kirin.

Pêxirtengiya bingehîn a bajarbûnê sedsala 19. bi şoreşa pîşesaziyê weke berhemê îndustriyalîzmê derket holê. Ev xweber nebû; ev têkiliya xwe bi xwezaya antî-civakî ya îndustriyalîzmê re hebû. Aliyê herî girîng ê bajêr ji aliyê ekolojîk ve dibû pîrsgirêk, diyalektîkeke wî ya ji hawîrdorê qut hebû. Gund yekser têkiliya xwe bi hawîrdorê re heye. Bi her tiştê xwe pêve girêdayî ye, û dizane ew berhemê wê ye. Bi heywan û nebatên xwe re mîna bi zimanê hawîrdorê bipeyive jiyana xwe dewam dike. Zimanekî hevpar, zimanê cotkariyê pêk hatiye. Di avabûna civakê de bandoreke mezin a vî zimanî heye. Li bajêr rewş berevajî ye; bajar her diçe ji cotkarî û hawîrdorê qut dibe. Zimanekî nû, zimanê bajêr pêşde dibe. Rasyonaltîyeyê xwe ya cihê heye. Her diçe têkiliya xwe ya bi aqiliya hawîrdorê re qels dibe. Zimanê bajêr zimanekî welê ye, bi bazirganî, zenaetkarî, pîşesazî û pereyan re pêwendîdar e. Aqil û zanista van pêk tîne; ji aliyê van ve pêk tê. Diyalektîka pêşketina zimanê nû bi vî awayî ye. Eşkere ye ku li vir zimanekî bi nakok, têra xwe xerîbketî û zêhniyet mewzûbehs e. Bajarbûna demê çand û zaravayên komên klan, qebîle, eşîr, qewm û gund û yên li derveyî bajêr ên berê temsîl dikin digire nava xwe. Zimanekî xweserî xwe yê zanist, huner, dîn û felsefeyê pêk aniye. Ji aliyê çînî ve arîstokrasî û yên din weke du kategoriyên sereke pêk aniye. Bajarîtî hê nebûye xwedî şexsiyet. Weke dewameke giştî ya civakê ye.

Sedsala 19. û 20. ev tewazuna dîrokî bi temamî xira kirine. Bêguman ev rewş ji nişka ve pêk nehatiye. Li Nîvgirava Îtalyayê di sedsalên 10.-16. de ji nû ve mezinbûn û bilindbûna bajêr (Venedîk, Cenova, Floransa, Mîlano û yên din), şoreşa bazirganiyê ya di sedsala 13. de bi rêya Îtalyayê derbasî Ewrûpayê dibe îfade dike. Bajarên Îtalyayê ji pêvajoyê re pêşengiyê dikin. Bi Ronasansê re dîsa dixwazin li ser şopa Romayê mezin bibin. Di nava bajêr û navbera bajaran de reqabeteke gelekî dijwar heye. Di vir de pevçûn û reqabet di qonaxa nû ya şaristanyê de li ser pêşengiyê ye. Mîna ku tevahiya jiyana berê ji nû ve zindî dibe. Lê şert û mercên nû wê veguherîne. Roma bi teqlîdê neyê afirandin. Lê wê karîbûn xwe bigihînin kopyayên Romayê yên mêşmirî. Ezmûna qraliyeta navendî û dewleta netewe jî wê bi ser nekeve. Lê bajarên Îtalyayê di sedsalên 10.-16. de bi rêya Ronasansê ji şaristaniya Ewrûpayê re pêşengî kirine û ev rastî ne ya guftûgoyê ye. Hem weke dêr (ekumen Katolîk) hem jî weke laîk meyla sekuler bi rola xwe rabûye.

Şoreşa bajêr a Elman di qonaxa pêşî de bi yekîtiya bajarên Hansatîk (nêzî 1250-1450 P.Z.) destpê kiriye û şoreşa bazirganiyê ya bajarên xwe pêk aniye. Dema duyemîn jî (1400 P.Z.) weke qonaxa manîfaktûrel diyar dibe. Li dijî navendbûnê konfederalîzma bajaran têkoşîneke zêde dide. Gelek gundiyan û komên nîv-karker, bi awayekî bingehîn jî taximên zenaetkaran di van têkoşîn û serhildanên çarsed salî qudandî de bi roleke diyarker rabûn. Piştî pêvajoyê gelekî xwînrij, ev ezmûnên pêşî yên konfederalîzmên demokratîk ên bajar û li derveyî bajaran, ji ber sedemên cûrbicûr (îdeolojîk, rêxistinî, pêşengî) li hemberî meyla monarşiya navendparêz û dewleta netewe şikestin, têkçûn. Eger tîkneçûna dibûya dîroka Ewrûpayê bi awayekî din bihata nivîsîn. Elmanya Federal a îro, ji faşîzma dewleta netewe ya bûrjûvaziyê ber bi vê modela kevin

ve diberide û hêdî hêdî vediguhere. Lê weke konfederalîzma demokratîk ne, weke federalîzma bûrjûvayê.

Bajarên bi awayekî bingehîn bend û sukrên li pêşiya xwe rakirin û meşiyar bajarên Hollanda û Ingilistanê bûn. Di vê de navendîbûna sê şoreşan bi hev re û gelekî zêde jiyana wan a vê yekê, rola xwe heye. Şoreşên bazirganî, finans û pişesaziyê bi awayekî bingehîn li Amsterdam û Londonê gihiştin serketinê. Federalîzma kominî li herdu welatan jî bi hêsanî hat tepisandin. Xelkên bajarên din û yên li derveyî bajaran bi hêsanî xwe radestî navendê û dewleta netewe nekirin. Ji bo vê jî pêdivî bi şoreşên sedsala 16. û 17. yên li Hollanda û Ingilistanê hebû. Amsterdam di sedsalên 17. û 18. de, London jî di sedsalên 19. û 20. de bajarên pêşeng ên van pêvajoyên şoreşî ne. Herdu bajar jî navendên dinya serdema nû ne. Sîstema şaristaniya navendî ya dinya veguherîneke mezin darbas dikir rêve dibirin. Navendên hêzên hegemonîk bûn. Şênî û nakokiyên wan bi lez mezin bûn. Di vê demê de avahiya kansêrolojîk a rastî ya bajêr destpê kir. Li gorî rêzê avahiyên xwe yên nexweşokî derbasî Franse, DYE, Rojhilatê Ewrûpayê, Rûsyayê, Rojhilatê Dûr, Emerîka Latîn, Rojhilata Navîn û Afrîkayê. Di dîrokê de bajarê sedsala 20. di vê 'demê' de destpêkir serketina xwe ya ji sedî sed bi dest xist. Tevî şaristaniya berê û dinya komin a li derveyî bajaran a dema duwanzdeh hezar salî bi rola sereke rabûn. Şûna serektiya vê dinya paradîgmîk a duwanzdeh hezar salî paradîgma bajarî ya kapîtalîst digirt. Bajar êdî bi tenê navenda bazirganî, finans û pişesaziyê nebû; di heman demê de navenda hegemonîk a tevahiya fikra dinyayekê bû. Ev paradîgmaya ku di serî de bi zanîngeh û akademiyên xwe yên hêlîna zanistê, bi nexweşxane û girtîgehên xwe, bi çîn û burokrasiya xwe bi sazî bûye, li şûna fikra dinya navend eskatolojiya berê (axîret, ûxrewiyet), hewl dida bi fikra hişk a pozîtîvîst xwe serwer bike. Ya rastî, pozîtîvîzm dînî nû yê çîna bûrjûvayê bû. Lê bi maskeya 'zanistperestiyê' ya li rûyê xwe dixist (bi sîdwegirtina ji zanistên girîngiya wan bi awayekî awarte zêde bûne) xwe serketîtir û pratîktir didît.

Bi vê avahiya bajaran bi rastî civak bi kansêra sosyal ketibû. Arîsto bi xwe jî bajarên deh hezar şênîyên wan heyî xeyal nekiribû. Sed hezar, mîlyonek, pênc mîlyon, deh mîlyon, panzdeh mîlyon, bîst mîlyon û hedef bajarê bîstûpênc mîlyon e! Ev, mezinbûneke rastî ya kansêrolojîk nîne ma çîye? Bi tenê ji bo xwedîkirina bajarekî bi vî rengî dikare welatekî di asta navîn de tevî dewrûbera wî demeke kin ji holê rabe. Ti mentiqê vê mezinbûnê nîne. Eşkere ye ku tevî civak û xwezaya bajêr ji bilî zirardana Xwezaya Yekemîn wê ti encamê nede. Ti welat û hawîrdor tevî gelê xwe nikare bajarên mezin ên di vê astê de demeke dirêj hilgirin. Sedema bingehîn a xirakirina hawîrdorê ev mezinbûna kansêrolojîk e. Mîna ku bajarek welatê xwe bi xwe tevî gelê wê dagir dike, hildiweşîne û dike mêtîngeh. Hêza nû ya mêtinkar bajar e; yekdestdariyên pişesaz, finans û bazirganiya global a li bajêr in, baregehên wan ên plazayê ne. Ewlekariya li van plazayan ji ya kelhe û bircên berê kêmtir nîne û ev jî vê rastiye piştrast dike.

Hîç şik û şuphe têde nîne, ji vê rewşa bajêr ketiyê avahiyên çînî yên desthilatdar û dewletdar berpîrsiyar in. Kurtêlxurî û ranta bajêr ew bi awayekî dijwar kirin barbar û cinawiriya bajar (Levîathanê nû) afirand. Eşkere ye ku mirov bi temamî nikare ji vê xelk û civaka bajêr berpîrsiyar bibîne. Lê li cem hişk ter jî dişewite. Mirovên li keviyên bajar, 'Xiristiyanên nû' yên bajar, neçarbûn rêyekê bibînin. Naxwe di rewşeke welê de ne, mehkûmê jiyaneke welê ne, ji Neronan gelekî bi tehlûketir ji şewitandina ji aliyê hezaran Neronan ve xirabtir di rewşekê de ne. Divê mirov bedewî, exlaq û aqlê bajêr ê bi sînor mayî bifikire. Her pisgirêka çavkaniya xwe bajêr e, divê êdî bigirin navenda her projeya xwe ya civakî (ji ber ku ji zû ve ketine rewşa nexweşiyê). Di vê çarçoveyê de em dikarin ji tevahiya pîrsgirêkên civakî û ekolojîk re çareseriyên manedar bibînin û divê kes vê ji nedîtî ve neyê. Ji bo hilweşîna dinya û civakê em li sedemên din negerin, bi tenê sedemên çavkaniya xwe bajêr ji niha ve bi vê rolê rabûne.

2- Şaristanî

Têgîna şaristaniyê zêdetir têgîna çanda giştî ya civaka di qonaxa çîn, bajar û dewletê de terîf dike. Çînbûn, bajarbûn û dewletbûn kategoriyên bingehîn ên civaka şareza ne. Civaka li vir civaka çînbûyî, bajarbûyî û dewletbûyî ye. Pêşdeçûna berbiçav û dîrokî bi xwe re di nava civaka klan û qebîleyên wekhev de diyardeya çînbûnê, li ser civaka gund-cotkariyê bajarbûn û ji nava civaka hiyarerşîk jî dewletbûn pêk anî û ev diyarde şaristaniyê karakterîze dikin. Civaka şareza li têtikiliya sîmbiyotîk a di çarçoveya xweza-civakê de zêdekirî, di nava xwezaya civakî de têtikiliya

hukimraniyê ye ku yekalî pêş dikeve û her diçe weke nakokiyê dijwar xwe nîşan dide û berbiçav dibe. Di nava civakê de avahî, manedan, exlaq û hisên estetîk ên cuda pêş dixwe. Şaristanî ji bo civakê bûyereke erênî yan jî neyênî ye, mijarek e ku gelekî nîqaş li ser tê kirin. Li gorî kesên dîrok bi çavên serwer û mêtinkaran ava kirine, şaristanî bûyereke mezin a dîrokî ye, û heta dîrok bi xwe ye. Lê li gorî kesên di bin mêtinkarî û zordestiyê de şaristanî felaketeke mezin e, û jidestdana utopya cennetê ye. Ya rast jî ev e. Civakek hûrûkûr xwediyê vê nakokiyê be, li gorî xwezaya civakî wê têde fikir, exlaq û hisên estetîkê cuda bibin. Pêkhatina cîhana mane û saziyên bi nakok û parçebûyî li gorî karektera şaristaniyê ye. Şer herî zêde vê rastiyê îfade dikin. Hebûna çalakiyên civakî yên mîna şer ku di wan de tinekirinên fizîkî gelekî hene, civakeke hûrûkûr hatiye parçekirin dikarin îfade bikin. Parçebûna maneyê jî şerê îdeolojîk îfade dike û ev jî di civaka şareza de bi qasî şerê fizîkî şerekî bi bandor ê hegemonîk e. Civaka şareza aliyên xwe yên cuda yên bi nakok li hêlekê bi şerên îdeolojîk, fizîkî û saziyan nîşan dide, li hêla din jî xwe paşve nadin xwe weke yekparebûna hîmên têkûz ên avahî û maneyên serwer û domdar îfade dikin. Îddîa dikin ku civaka rastî ji wan pêk tê û civak bi vî awayî heye ango dibe heyî. Serdema şaristaniyê di nava xwe de çiqasî kirasên dem û dewranan, kirasên sazî û maneyan li xwe bike jî maneya wê ya bingehîn her weke xwe dimîne.

Di pêşdeçûna civaka şareza de diyardeyê bingehîn a mirov çavdêriya wê dike ew e, civaka şareza di nava wê civakê de ku têde mezin dibe, wê bi mekanîzmayên mêtinkarî û zorê her diçe dadiqurtîne, dihêlîne û bi vê diyardeyê ve girêdayî têkiliya ekolojîk-sîmbiyotîk a bi Xwezaya Yekemîn re dike ku hev berde, hildiweşîne, wê ji xwe re vediguherîne bi tenê çavkaniyê, wê dimije û her diçe diqedîne. Di rewşeke wisa de mijareke rojane dikeve rojevê, ew jî ev pirsgirêk e, gelo civak wê bi nakokiyên hundirîn, yan jî bi nakokiyên ekolojîk ji hev belav bibe. Ya rast jî ew e, eger di şaristaniyê de veguherîneke bi kok û erênî çênebe, di hukimraniya herdu nakokiyên de Xwezayên Yekemîn û Duyemîn wê felaketên mezin bibînin û wê nikarin ji vê xilas bibin. Dibêjin civak bêyî şaristanî nikarin bijîn, civakên şareza civakên dewlemend û bi hêz in. Nirxandinên bi vî rengî îdeolojîk in, û zêdetir paradîgmaya elîta yekdestdar a tehekumkar û mêtinkar nîşan dide. Asta çînbûn, bajarbûn û dewletbûn gihiştîyê, li gorî tevahiya derdorên zanistê yên bi bandor weke kansêr û penceşêreke civakî (kansêr û penceşêra biyolojîk jî bi vê rastiyê re têkildar e) tê nirxandin. Li ser vê mijarê têra xwe nîşane hene. Çêkirina sîlehên nukleer, hilweşandina hawîrdorê, bêkariya ji ber sîstemê zêde dibe, civaka zêde dixwe, zêdebûna pîrr a şênîyan, kansêra biyolojîk, nexweşiyên cinsî û qirkirinên zêde dibin hin ji van nîşaneyên sereke ne.

3- Desthilatdarî

Têgîna desthilatdariyê di serê wan têgînan de tê ku herî zêde di warê jihevderxistina rastiya civakî de rê li ber zehmetî, şaşî û nakokiyê vedike û mîna ku ji aliyê naverok û şeweyê ve ji bo neyê naskirin li ber xwe dide. Hakimiya di xwezaya wê de xwe di danasîna wê de jî nîşan dide, li hemberî danasîneke bi rastî li ber xwe dide, xwe nade dest. Mîna ku nutr e, lê dest jê nabe û fena diyardeyê xwedayî xwe dike giştî û bi vî awayî xwe mutleq dike. Mirov dikare desthilatdariya civakî jî bi awayê herî rast weke mêtinkariya zêde ya ekonomîk û potansiyela hêzê (derfetên hêzê) bide naskirin. Desthilatdarî potansiyela hêzê û mêtinkariya mîna genetîkê (mîna DNA'yê) bûye xwedî karekterê kombûyî ya di tevahiya çavîyên civakê yên mejî û avahiyên wê de ye, hêzên civakî yên ev mekanîzmaya desthilatdariyê xistine destê xwe jî bi awayekî berbiçav dewleta dîrokî, elîtên mêtinkar û çînan wan pêk tînin. Gelekî girîng e ku mirov desthilatdariyê timî weke derfeta kanên potansiyela pêkhatinên dewlet û çînan fêhm bike. Kengî potansiyela desthilatdariyê berbiçav dibe, her çi dewlet û elîta hukim lê dike çîna mêtîngeh a civakî ya xwe dispêrinê (koledar, feodal, bûrjûwa û hwd.) pêk tînin. Mirov dikare desthilatdariyê hem fizîkî, hem jî weke potansiyela hêzê ya entelektuel jî bifikire. Li ser civakê xwe weke hewcedariyê, mutleq û domdar ferz dike. Yek ji sedemên din ên girîng ê vê yekê jî ew e, xwe bi pêdiviya rêveberiya xwezayî ya civakî re wekhev dibîne. Kengî desthilatdariyê xwe bi diyardeya rêveberiyê re kir wekhev, hingê xwe dike ku dest jê nebe. Dema ku desthilatdarî ji pêşengiya civakî ya xwezayî hat veqetandin, wê baş were dîtin ku desthilatdarî çawa weke girêkeke kansêrê çiziriyê binyeya civakî û lê belav bûye.

Girîng e ku mirov cudahiya di navbera dewlet û desthilatdariyê de jî bibîne. Desthilatdarî li civakê zêdetir belav e, û çiziriye tevahiya çaviyan, lê dewlet nasnameyeke desthilatdariyê ya bêhtir teng û bi pîvanên berbiçav îfade dike. Dewlet şeweyekî desthilatdariyê ye, zêdetir di kontrolê de ye, bi pîvanan ve hatiye girêdan, her diçe huqûqî dibe û di warê xwerewakirinê de nazik tevdigere. Mirov dikare desthilatdariyê weke rewşa hukimraniyeke giştî binirxîne û ji bo rewşa bêdesthilatbûnê jî mirov dikare weke koletiya giştî hukim bide. Şeweyên koletî û desthilatdariyê yê cuda bi xisletên giştî yê dewletê ve girêdayî ne, û ji wê feyza xwe digirin. Mirov dikare li ser wan weke dijberê azadiyê hukim bide. Di civakê de çiqasî potansiyela desthilatdariyê hebe, ewqas jî civak ji azadiyê bêpar dibe. Desthilatdarî çiqasî were kêmkirin, ewqasî rewşa azadiyê pêş dikeve. Divê mirov gelekî hay ji hesreta ji bo desthilatdariyê ya di nava civakê de hebe. Ev hesret û bêrîkirin çiqasî belav be, ewqas jî wê despotokên civakî zêde bibin. Ev jî dikare bi tevahî demokrasîyê biqedîne. Despotî nexweşîyeke desthilatdariyê ye. Kengî li derveyî kontrolê bimîne, çawa di mînakê Hîtlê de jî hat dîtin, dikare har bibe û bibe cinawirekî serî pêre derxistin zehmet be. Despotîzm di dîrokê de ji nava şeweyên rêveberiyê yê keyfî derdikeve û weke girêkên faşîzma civakî bi cih dibe. Di pêvajoyên desthilatdariya kapîtalîzmê de dikare bi lez mezin bibe, li tevahiya çaviyên civakî belav bibe û weke rêveberiya hêza totalîter a civakê bi gewde bibe. Şewegirtina desthilatdariyê bi awayê dewleta netewe têkiliya xwe bi rejîma kapîtalîst-faşîst heye û rewşa wê ya pêşek îfade dike.

4- Desthilatdariya Hegemonîk a Navendî

Di çarçoveya mijara me ya bingehîn de danasîna teorîk a heyatî divê der barê desthilatdariya hegemonîk a navendî de hebe. Teoriya sereke ya karibe rewşa gelekî li ber qirkirinê zelal bike, teoriya desthilatdariya hegemonîk a navendî ye. Ji ber ku me têgîna desthilatdariyê têra xwe da naskirin, gelekî girîng e ku mirov diyar bike, bê ka desthilatdariyê di nava pêşdeçûna dîrokê de çawa civak kiriye nava pencên xwe. Berê pêşî divê mirov karakterê hegemonîk ê desthilatdariyê baş diyar bike. Navendên desthilatdariyê ji roja derketine holê û vir ve di nava xwe de hevrikiyê dikin û her diçe şer dikin. Desthilatdarî di destpêkê de bi şeran hev tine dikin û bi vî awayî hewl didin monolîtîk û yekpare bibin. Piştî demekê tê fêhmkirin ku ev bêkêr û tewş e, herweha ne pêkan e. Lewma ketina bin hegemonya desthilatdariya navendî ya herî bi hêz ji bo navendên din ên desthilatdariyê weke ehwen-î şer ango ji xiraban a herî baş tê qebûlkirin. Herweha tevgerên anti-desthilatdarî yê ji jêr û ji derve timî tîne, desthilatdaran neçar dikin ku li bin desthilatdariya hegemonê (domînant, fermanarê sereke) hevpariyê pêre dikin bi awayekî hevgerî bimînin. Di dîrokê de xwerû desthilatdarî îstîsnayî ne; ya pîvan e, karakterê desthilatdariya hegemonîk e. Desthilatdariya navendî divê bi ekonomîya navendî re bê temamkirin. Desthilatdariya navendî ya xurtbûyî bi navenda ekonomîk a xurtbûyî ya sereke re di nava têkiliyeke xurt de ye. Ekonomîya navendî xwe xelek bi xelek li hawîrdorê belav û sistematîze dike û vê yekê, divê bi desthilatdariya navendî re di zikhev de pêk bîne û belav bike. Ji ber ku desthilatdariya navendî bi xwe xurtbûyî ye, û potansiyela herî bi hêz a avahiya ekonomîk e, di nava aktualîteya xwe de aboriyê çalak dike û ji navendê ber bi derve belav dibe. Li gorî daneheva sermaye û hatina aborî, navend û hawîrdor timî cih diguherin. Ev rewş pêvajoyên ji wan re pêxîrtengî tê gotin ferz dike.

Naxwe hawîrdor û pêxîrtengî, xisletên bingehîn ên desthilatdariya navendî û ekonomiyê ne ku bêyî wan nabin. Heta sîstem bi berdarî bixebite hewcedarî bi guhertina navendê nîne. Lê çawa ku gelek caran di dîrokê de hatiye dîtin, wexta ku navend her diçe tiral û kurtêlxur dibe, hawîrdoreke berdar ji bandora pêxîrtengîyan keysê lê tîne derkeve holê û gav biavêje ango bi pêkanînen nû yê teknolojîk ekonomiyê serketîtir dike û vê yekê pêk tîne. Teknolojiya nû tê maneya teknîka nû ya eskerî. Di keliyên wisa yê dîrokî de destguhertînen desthilatdariyê bi pêkhatînen nû yê navend û hawîrdorê bi encam dibin. Hegemonya desthilatdariyê ji nû ve ava dibe. Pêkhatînen desthilatdariya hegemonîk ên bi vî rengî di pêşengiya qewm û xanedanekî nû de derdikevin holê, di dîrokê de timî tîne dîtin. Li vir, zêde manedar nîne ku mirov ji ekonomî û desthilatdariyê li ya diyarker bigere. Ti desthilatdariya hegemonîk bêyî navenda ekonomîk nikare bimeşe û ti navenda ekonomîk jî xwe li avakirina desthilatdariya hegemonîk a navendî ranekîşîne nikare demdirêj mayînde bibe.

Di dîrokê de diyardeyeke din a girîng bi desthilatdariya hegemonîk a navendî ve girêdayî ew e, ev sîstem xwedî xisleteke wisa ye, bi awayekî zincîrwarî girêdayî ye, û valatiyê qebûl nake,

hem ji aliyê zeman û hem ji aliyê mekan ve qutbûn nîne, weke xelekên zincîrekê pêk hatiye. Di xwezaya desthilatdariya hegemonîk de ji aliyê zeman û mekan ve valatî, navberdan nîne. Berevajî ba di ber re naçe. Navber têra xwe tijî û bi hev ve ne. Xelek di zikhev de ne û hişk bi hev ve girêdayî ne. Eger qutbûn û navber pêk bê, heye ku navend hilweşe. Eger demeke dirêj neyê tamîrkirin û valatî neyê tijîkirin, hilweşîn û destguhertin bivênevê wê pêk bê. Divê mirov li desthilatdariyên hegemonîk ên navendî weke rewşeke bi tenê xweserî împaratoriyên mezin nefikire. Hewl didin tevahiya civakê bi têkiliyên desthilatdariya hegemonîk bi hev ve girê bidin. Ji navenda împaratoriya herî mezin heta bi yekeya malbata pêve girêdayî pîvanên hegemonîk ên bi heman rengî ji bo hemûyan dimeşin. Li Romayê împarator çî be, li gund axa û di nava malbatê de jî mêr ew tişt e. Civaka dîrokî bi girêkên hegemonîk ên bi vî awayî hatiye deribandin û eger ji nedîtî ve hatin, mûmkîn nîne ku mirov civaka dîrokî fêhm bike. Belkî bi baran agahî û zanîna me hebe, lê wê serwextbûn û têgihiştina me ya diyalektîkî pêk neyê.

Divê desthilatdariya hegemonîk a navendî ne bi tenê bi ekonomiyê, lê bi hegemonya îdeolojîk a ku bi kêmanî bi qasî wê girîng e, bê temamkirin. Hegemonya desthilatdar a bê hegemonya îdeolojîk nabe. Nexasim gavavêtinên mîtolojîk û dînî yên bingehîn di qonaxa şaristaniyê de yan antî-hegemonîk in, yan jî bi kêmanî di demeke kin de bi baskekî desthilatdariyê re dibin yek û bi lez hegemonîk dibin. Nemaze mirov dikare ji pêşketina dînen yekxwedayî bi hegemonya navendî re gelek tiştan hîn bibe. Derketina wan a holê ji sedî sed bi hegemonyayê ve girêdayî ye. Têgîna Xwedê, Ellah yan alternatîfa hegemonê sereke ye, di vê rewşê de dîn muxalîf û berxwedêr e, yan jî hegemon bi xwe tê pîrozkirin û wî dikin xweda; di rewşa duyemîn de dîn sîstema hegemonîk a navendî nîşan dide. Ji aliyê têkilî û nakokiyê ve di navbera herduyan de rewşeke pîrr pêk tê û li ser şer tê kirin heye. Eger em dîroka dînen yekxwedayî bi desthilatdariya hegemonîk a navendî re lêbikolin, em dikarin fêhm bikin. Naxwe bi awayekî din dîroka dînan nayê fêhmkirin. Dîrokeke dînan a ji bingehê ekonomîk û desthilatdariyê qut ji gotinên pûç û vala wêdetir tiştêkî din nîne. Têkiliya di navbera dîn, xweda, hegemon, desthilatdar û ekonomiyê de ji pêşbînî û yeqîna mirov dikin, zêdetir e. Çawa ku desthilatdariya hegemonîk bi awayekî zincîrwarî dor li zeman û mekan girtine, dîn, xweda, hegemon, desthilatdar û aboriyê jî di zikhev de dor li dîroka rastî girtine. Civaka dîrokî bi dorgirtinên bi vî rengî, bi awayekî xelekwarî xwe nîşan dide û tê heta roja me ya îro.

Em bi mînakên rewşê berbiçav bikin, ev pêvajoyên bi qasî tê zanîn ji hegemonê pêşî Qralê Aqadê Sargon ve bi awayekî zincîrwarî û bi awayekî xelekwarî heta roja me tê. Di roja me ya îro de jî ev pêvajoyên bi hegemonêkî weke Împaratoriya Sargonê bi DYE'yê dewam dike û ev rewş di çarçoveya sîstema şaristaniya navendî de weke herikîna çemê sereke û mezin e. Hegemonya Sumer, Aqad, Babil, Asûr, Hîtît, Mîtanî, Êrtartû, Med, Pers, Skender, Roma, Sasanî, Bîzans, Ereb-Îslam, Tirk-Moxol, Osmanî, Brîtanya û DYE'yê çemê sereke pêk tînin, Împaratoriyên Misr, Elam, Harappa, Çîn, Hind, Rûs, Frank û Germen rûbarokên tînan ser vî çemê sereke ne. Eger mirov civaka dîrokî di tevahiya dîroka şaristaniya navendî de bi awayekî berbiçav weke çemê sereke û rûbarokên tîne ser sembolîze bike wê bêhtir bi awayekî rastî were fêhmkirin. Bêguman rûbarok û şaxên hê piçûk ên vî çemê sereke û rûbarokên wî yê tîne maneya çand û şaristaniyan hene. Ya girîng ew e, divê mirov fêhm bike ku pêşdeçûna dîrokê ji hev qut nîne, hegemonya navendî, ji bilî derbasbûnên di navberê de, hebûna xwe timî bi hêz kiriye û dinya roja me ya îro pêk aniye. Bêguman ev pêkhatin ne yekalî ye. Li aliyê din, hêzên antî-hegemonîk jî ji roja derketina holê ya şaristaniya navendî û vir ve li dijî sîstema wê û hêzên wê yê hegemonîk timî hebûna xwe pêk anîne, qutbê din ê dinyayê ango dinya şaristaniya demokratîk heta bi roja me ya îro anîne. Cewherê esasî yê vê dinyayê demokratîk, exlaqî û polîtîk e; bi konfederasyonên demokratîk ên naqedin timî xwe nû û bi hêz kirine, dinya xwe ya îdeolojîk bi giştî di nava dînan de û bi taybetî jî di nava mezhebekî dînen yekxwedayî de ava kirine û hêzên rastî yê hilberîner ên ekonomiyê ne, û ev rastî ne yê guftûgokirinê ne.

Dîroka dewletên netewe ya taybet ya ku modernîteya kapîtalîst dixwaze wê serwer bike, herçi qasî bixwaze pêşdeçûna dîrokî gerdûnî ya hegemonya navendî bitepisîne jî nikare vê rastiya gerdûnî biguherîne. Dîroka gerdûnî nebe dîroka taybet jî nabe. Ya rastî, dîrok bi hevtamkirina gerdûnî û taybet pêş dikeve. Dîrokên taybet ên netewe, çîn û xanedanan an jî dîrokên şexsî di çarçoveya dîroka gerdûnî de neyên bi cihkirin nayên fêhmkirin. Modernîteya kapîtalîst dîroka xwe ya lîberal weke 'dawiya dîrokê' îlan dike û bi vî awayî hewl dide hîleya her

serdema hegemonîk a klasîk serî lê daye, dubare bike. Her serdema hegemonîk xwe weke ya dawî îlan dike. Lê dîrok dewam dike. Belkî jî ya bi dawî dibe modernîteya kapîtalîst bi xwe ye. Bi serdema kapîtala finansê ya global, ev sîstem bi xwe ti tîkiliya wê bi dîroka berbiçav û civakê re nemaye û bêmane bûye. Ji aliyê şêwe ve jî roj bi roj ji hev de dikeve. Belkî jî di dîrokê de cara pêşî ye ku sîstema hegemonîk a navendî rezervên xwe qedandine û hêdî hêdî diderize, misêwa bi krîzê re di qirika hev de ne, û bi vî awayî nêzî dawiyê dibe. Bi xwe ji gelek aliyan ve li dawiyê dimîne. Cihê meraq û kakûniyê ye ku wê xwe bi qalibekî zirxî heta kengî biparêze; bi tinehesibandina zeman û mekan wê hebûna xwe bi awayekî şiklî bê dawî bike yan jî xwe biqedîne, ev mijarek e ku hêja ye heqîqeta wê were keşifkirin û were lêkolîn.

b- Civaka Hiyarerşîk-Dewletparêz, Zayîna Civaka Koledar

Di civaka bavikanî de otorîterî û hiyarerşî esas e. Têgîna hiyarerşîk dema bi otorîteya pîroz a şaman re dibe yek, mînakê pêşîn a tîgihîştina rêveberiya otorîter xwe watedar dike. Ev saziya otorîteyê wê li ser civakê mezin bibe û piştî ku çînîyatî di nav civakê de pêş dikeve, êdî dibe otorîteya dewletê. Otorîteya hiyarerşîk zêdetir şexsî ye, hê nebûye sazî, lewra bi qasî sazîbûna dewletê di nav civakê de xwediyê serdestiyê nîne. Meşa bi vî otorîteyê re nîv bi nîv li gorî dilxwaziyê ye. Girêdan û dilsozî bi berjewendiyên civakê tene destnîşankirin. Lê vî pêvajoya ku dest pê kiriye wê dewletê bizê û biwelide. Civaka Komînî ya Seretayî wê demêke dirêj li dijî vî pêvajoyê li ber xwe bide. Yê berhem di destê xwe de digirin û hiltînin, eger bi endamên komê re par ve bikin, rêz û hurmet, girêdan û dilsozî ji otorîteya wan re tê nîşandan. Berhem hilanîn wek gunehkî mezin tê dîtin. Kesê herî baş ew kes e ku berhemên xwe parve dike. Di civata qebîleyan de hê jî tîgihîştina “comerdî-camêrtî” ji vî kevneşopiya xurt a dîrokê tê. Cejin û roşan wek merasîmên roja parvekirina van berhemên zêde dest pê kirine. Kom, ji destpêkê ve, hilanîna berhemên wek xeterek li dijî xwe dibîne û dijderketina li vî yekê, wek tîgihîştineke hîmî ya dînî û exlaqî dipejirîne. Pir zehmet nîne, mirov şopên vî kevneşopiyê bi awayekî xurt di hemû doktrînen dînî û exlaqî de bibîne. Eger hiyarerşî bikêr be û bi camêriya xwe tiştêkî bide, ji aliyê civakê ve hatiye erêkirin. Hiyarerşîyeke bi vî rengî jî roleke erênî û bi kêr lîstiyê. Hiyarerşîya jin-dayikê ya bi vî rengî hê jî di nav hemû civakan de cihê rêzê û otorîteyê dibîne. Ev yek di heman demê de bingehê dîrokî yê tîgîna “dayikê” ye. Ji ber ku dayik di şert û mercên herî zehmet de dizê û xwedî dike. Di vî warî de jî xwediyê rola sereke ye. Bêguman, hiyarerşî, otorîte û çanda li ser vî hîmî pêk bê, wê girêdan û dilsoziyeke mezin bibîne. Têgîna “dayikê” ji ber vî yekê, heta îro wek bingehê hebûna civakê bi hêz hatiye û wekî din îzaha vî rastiyê nîne. Weke ku yeqîn tê kirin, hurmet û rêza ji dayikê re bi sedema taybetiya wê ya zayînê nîne. Hewce ye dayik, wek rastiya civakî ya herî girîng û tîgîna “dayika xwedawend” were fêmkirin. Deriyên wê li rastiya dewletê girtî ne û hemû taybetiyên ku rê nadin dewletê di himbêza xwe de dihewîne. Di çarçoveya vî nirxandinê de wê rast be ku em civaka xwezayî, wek teza destpêka hebûna mirov bi nav bikin. Mirovatîyê bi vî teze hebûna xwe daye destpêkirin, beriya wê jiyanê heywanî ye. Piştî wê jî li ser hîmê dijberiyê, civaka hiyarerşîk û dewletê pêş ketiye. Jixwe karakterê antî-tez ê vî serdemê, ji paşve xistin û tepisandina civaka xwezayî tê. Wek teza civaka xwezayî; sîstemeke civakî ye, di hemû warên jiyana mirov de xwediyê roleke sereke ye, û heta dawiya serdema neolotîk (li derdora 4000 BZ) bi tesîr rol lîstiyê. Bi awayekî tepisokî heta îro di hemû çavîyên civakê de hebûna xwe dewam dike. Têgînen bingehîn ên civakî jî bi xwe re tîne. Malbat, qebîle, dayik, biratî, azadî, wekhevî, hevaltî, camêrî, piştgirî, cejin, lewendî, qûtsiyet û hwd. gelek rastî û tîgînan ji vî sîstema civakî mane. Li dijî vî yekê, civaka dewlet û hiyarerşîk a herî zêde ev sîstem paş xistiye, taybetiyên xwe yê zordest jî ji vî digire. Rewşa xwe ya antî-tez ji vî taybetiyê digire. Ev her du sîstemên civakî di zikhev de dimeşin, ev li gorî qanûnên bingehîn ên diyalektîkê li cih in. Di vir de nuqtetek ku divê em ji bîr nekin ew e; li gorî tîgihîştina me ya diyalektîk, tez û antî-tez hevdu tine nakin, hevdu paşve dixînin û dipesînin. Kengî sîstemên civakî, wek di hemû xwezayê de bibin tez û antî-tez wê hevdu bi hev re bimeşînin û hilgirin. Bêguman tîkoşîna di navbera wan de wê rê li ber pêşketinê veke. Ti car teza di rewşa xwe ya berê de namîne, lê antî-tez jî wek qadîrekî mutleq ti car pêşiyê xwe naxwe. Xwe pê xwedî dike û pêş de dibe. Di vî nuqtayê de hewce ye em hinekî din diyalektîkê rave bikin. Di dema Marksîzma dogmatîk de teza û antî-tez di civakê de wek du tiştên hevdu tine dikin hat şîrovekirin. Şîroveyeke bi vî awayî, yek ji şaşiyên bingehîn ên teorîk bû. Di serî de ilmê biyolojiyê di hemû ilman de tê dîtin ku di pêşketin

û veguherîna hemû rastiyan de alî hevdu xwedî dikin. Hevdu tinekirin rewşên îstîsnayî ne. Dîtina serdest ev e; tez û antî-tez, hevdu xwedî dikin. Ji bo îfadekirina vê rastiye mînakî dualî a zarok û dê ye. Zarok bi dayikê re di nava nakokiyê de mezin dibe. Lê em nikarin bibêjin; zarok dayikê tine dike, heye ku em karin bibêjin; hevdu xwedî dikin ji bo nîfş dewam bikin. Mînakek din mişk û mar e. Di vir de weznek di navbera pir zêdebûna mişkan û kêr çêbûna maran de heye. Eger mar nebûya, belkî mişkan ji dînozoran wêdetir her der xira bikirana. Her roja derbas dibe çêtir tê fêmkirin ku hebûnên li xwezayê bêmane nînin û hemû di nav ekolojiyê de xwedî cihêkî watedar in. Lê dîsa jî têngînên “sînoren mutleq”, “nuqtaya herî jor” herî kêr li beşekî dema sînorkirî wek têngîn dikarin bêne qebûlkin. Qanûnên bingehîn ên xwezayê pevgerdayî û di zikhev de pêş dikevin, êdî hemû ilim jî bi van taybetiyan dihesin.

Wexta min sîstemên civakî nirxandin, guhertinek ez dixwazim bikim di mijara tesadufiyet û mecbûriyetê de ye. Ev her du têngîn bingehê wan qanûnên yezdanî ne. Di sîstema ramanê ya rojava de ev têngîn bi “çimayetiyeke” diwar û bi xeteke dûz a bênavber pêş ketiye û wek min di serî de hewl dabû rave bikim, bi pêşketinên di fizîka kûantûm û kozmosê de hukmê xwe wenda kiriye. Di pêşketina diyalektîkî de ji bo her rastiye “neqeba kaosê” xwe nîşan dide. Statuya guhertinan vê neqeb-navberê ferz dike. Ev yek jî dide nîşan ku bêyî rawestan li ser xeteke pan a pêşketinê bi muceredkirina zêhnî helwesteke metafizîk îfade dike. Dibe ku her tim mumkîn nebe bi derketina ji neqebê pêşketineke dûz a xetê dest pê bike. Ji ber ku gelek bandor û têkiliyên di wê neqebê de dikarin rê li ber gelek û piralî bûyeran vekin.

Di civakên mirov de ji van neqeban re “herêma krîzê” tê gotin. Ji krîzê pêşketineke çawa ya civakî wê derbikive, asta têkoşîna hêzên di bin bandora vê krîzê de dimînin, wê encamê diyar bikin. Ev encam bi qasî pêşketin dibe, ew çend mumkîne paşketin jî bibe. Jixwe têngînên paşketin û pêşketinê jî îzafîne. Her tim paşketin li gorî hîpoteza gerdûnê jî nîne. Eger ev prensîb rast bûya wê demê wê îdeatiyeke metafizîkê bihata pejirandin. Li gorî prensîba pêkhatina gerdûnê, em nikarin behsa rastiye mutleq bikin. Xweza bi mutleqiyetan pêş nakeve. Mutleqiyet neguherîne û wekxwebûnê îfade dike. Jixwe şewazê hebûna me îspat dike ku tiştên wisa rast nînin. Di çarçoveya neqeba kaosê ya qanûnên xwezayê de pêşketina ber bi mirov ve pir nerm pêk hatiye, vê yekê mirov dikare bi qanûnên ilmên fizîk, kîmya û biyolojiyê bibîne. Di civaka mirov de jî qanûn têra xwe xwediyê karekere nerm in. Maneya vê jî ev e; neqebên qanûnan pirr in, û zêde ne. Ji bo vê yekê rê didin derketin û pêşketina qanûnên nû. Bi vê ve girêdayî; ji ber ku asta azadiyê ya mirov pêş ketiye, di civaka mirov de pirrengî û pircelebî derdikeve holê. Nermbûyîna azadiyê, azadî jî pirrengî û pircelebîyê tîne. Bi vê maneyê, mirov mûcîzeyeke xwezayê ye ku herî zêde dikare qanûnên xwe deyne. Lewra civaka mirov bi heman dewlemendiye, pirr û zêde dikare qanûnên sîstema xwe pêk bîne.

Bi van faraziyeyên bingehîn, dixwazim vê nuqtayê îspat bikim; civaka xwezayî neçar nebû ber bi civaka dewlet û hîyarerşîk ve pêş bikeve, ev qanûneke rast nîne. Dibe ku meylek bi vî rengî hebe. Jixwe meyl mecbûr nîne heta dawiyê û bêrawestan biçê. Di beşê pêş de ezê car caran rave bikim ku tespîta Marksîst a wek “hebûna civaka çînî ji bo pêşketinê mecbûrî bû” li ser navê bindest û mêtîngehan, yek ji şaşiyên mezin e. Bi vê tespîtê, sosyalîzm pêşin radestî serdestiya çînî tê kirin. Ji ber vê şaşiyê, marksîzm di dîroka xwe ya 150 salî de bû yedekê kapîtalîzmê. Eger dewlet, çîn û zor ji bo pêşketina civakan wek qonaxên mecbûrî bêne dîtin, wê demê berxwedana civaka xwezayî ya digihîje îro piçûk tê dîtin û heta tine tê hesibandin. Bi destê xwe dîrokê mîna xelatekê dide destê serdestan. Eger hebûna çinan wek çarenûs were qebûlkin, bêyî hay jê hebe, dikare we bike destîkê îdeologên çînên serdest. Ji vî alî ve, li ser navê bindest û mêtîngehan roleke xeter dilîze. Dîrok weke ku di bin dagirkerî û êrîşên îdeolojîk û polîtîk ên bi vî awayî de hatiye hîştin.

Hîyarerşî û çînayetî karîbûn pêş bikevin. Lê ev pêşketin ji mecbûriyetê nebû, bi destê hêzên ku dewlet û hîyarerşî ava kirin, bi xapandin û zordariya wan hat kirin. Li dijî wan, hêzên bingehîn ên civaka xwezayî her tim li ber xwe dan, her tim hatin berbendkirin û di qad û neqebên herî teng de hatin asêkirin. Hin qad û neqeb bi temamî li wan hatin girtin. Sîstema serdest bi polîtîka û propagandayeke bingehîn karîbûye bide xuyakirin ku hemû civak ji dewlet û hîyarerşiyê pêk tê. Ev lîstîka bi navê çarenûs û qedere, navnîşana wê metafizîk e. Hema hema dîn, mezheb, felsefe û ekolên ilmî yên neketibin vê lîstîkê nînin. Ev yek jî koka wê diçe hezar salan berê ku îdeolojiya rahîb û qiral-xwedayan bi zora mezin a dewletê, bi propaganda û

polîtikayan li ser mejî û beden hukum kirin. Yê xwestiye ji vê lîstikê re mîtolojî, yê xwestiye felsefe û ew jî nebe jê re gotiye ekola ilmî. Encam; rewşa îro ya îdeolojiyên bûne dewlet û ilmên qaşo bêqusûr. Çiqas li ser para Marksîzmê ya di vî warî de were rawestîn li cih e. Ezê hewl bidim, van lîstikan kite bi kite û yên para wan tê de hene eşkere bikim.

Destpêkê nîzama malbatî ya jin-dayikê bû qurbana civaka hiyarerşîk. Di nav sîstem û civakê de ji beşên herî zordestî lê tê kirin, belkî di serî de jin tê. Ev pêvajoya ku beriya dîrokê hatiye jiyîn, di nav ilmên civakî de cih nagire, ev yek ji ber nirxên bi cihbûyî yên civaka serwer a mêr e. Jin hêdî hêdî tê kişandin nav civaka hîyarerşîk û taybetiyên xwe yên xurt ên civakî wenda dike. Ev di civakê de dij-şoreşeke bingehîn e. Em wexta li malbateke xizan a kedkar jî temaşe bikin û rewşa jinê hûr bikolin, emê bi awayekî balkêş û seyr, vê zordestî û xapandinê bi berfirehî bibînin. Bi sedemên pir piçûk û sivik, jin bi sedema namûs û evîne tene kuştin, ev mînak bi xwe jî nîşaneyekê piçûk e, eşkere dike ku bûyerên diqewimin çawa di bin serweriya mêr de ne. Eger ev pêvajo bi cudahiya biyolojîk ên di navbera jin û mêr de bêne ravekirin, wê ev yekê şaşiyekê bingehîn be. Di têkiliyên civakî de rol û qanûnên biyolojîk derbas nabin. Pir zêde, mirov dikare ji ber taybetiyên nêr û mêmûnê têkiliyan binirxîne ku mijareke bi vî rengî ji bo hemû cinsan gengaz e. Ya rastîn, çanda jin-dayikê bi sedemên civakî ketiye bin tehekumê. Îdeolojî û zordariya tê meşandin bi tevahî ji ber vê yekê ye. Ravekirina mijarê bi ajoyên cinsî û derûnî, beropaşkirineke xeternak e.

Zilamê xurt ê bi nêçîrê bûye xwediyê hêzê li dora xwe komekê bi rêxistin dike û piştî ku li vê hêza xwe hayil dibe û dide qebûlkirin, berê xwe dide nîzama malbatî ya jin-dayikê û hêdî hêdî digire bin kontrola xwe. Ev pêvajo heta damezrandina yekemîn dewletên sîte dewam dike. Em ravekirina herî şahane ya vê mijarê di dema dewlet bajarên Sumeran de dibînin. Nivîsên li ser kevalan, vê rastiye bi awayekî balkêş û zimanekî helbestwarî tînin ziman. Destana xwedawenda bajarê Ûrûkê Înanna ku pêvajoya dewlet bajarên Sumer da destpêkirin, pir balkêş e. Ev destan pêvajoya bîranîneke pir dijwar tîne ziman. Di destanê de çanda dayikanî û bavikanî, vê pêvajoyê hê di weznekê de ne. Xwedawenda Ûrûkê Înanna diçe qesra xweda Enkî û ji wê derê 104 “me” yên xwe bi rêbazên cuda bi dest dixê û direvîne Ûrûkê. Ev beşa destanê roleke kiltî ji bo îzah û ravekirinê dilîze. Mebest ji “me”yan vedîtînen bingehîn ên şaristaniyê ne. Înanna bi israr tîne ziman ku vedîtînen xwedawend-dayikê ne û di van vedîtînan de ti rola xweda Enkî tine, bi zordarî û qurnaziyan jê dizîne. Hemû hewldana Înanna ew e, vê çanda xwedawend-dayikê ji nû ve bi dest bixe. Li gorî texmînan ev destan BZ di salên 3000 de hatiye gotin. Di vê serdemê de hê hêza jin-dayikê bi hêza çanda bavikanî re di weznekê de ye. Ji vir û pêve, ev çand, ewqas li bêrehmiyekê rast tê, paşê xwe li navenda şaristaniya wê demê (New Yorka îro) Nîppûrê li kexxaneyek bi navê “mûsaqatîn” dît. Rahîbên Sumeran ji xwe re di zîgûratê de harem çêkirin û ji bo gel jî kexxane ava kirin. Bi destana Enûma Enîş ya BZ di salên 2000 de hatiye nivîsandin, em hîn dibin ku xwedawend Dîamat êdî pîrebokeke xeternak e û jina divê were parçe parçekirin temsîl dike. Gotînen dijwar û bêrehim ên di destanê de mehkûmiyetê îfade dikin. Pêvajoya pişt re, dînen yek xwedayî û sîstema civaka bûrjûwayê tê. Sîstema civaka bûrjûwaziye jinê bi xemil û xêz dike, dixê qefesê û derî li ser digire. Di sîstemên civakî û dîrokî de li ser statuya jinê ewqas bombardûmanekê propagandayê ya îdeolojîk tê kirin êdî mejiyê jinê bi xwe jî ji vê yekê re dibêje çarenûs û bi cihanîna pêdiviyên jî wek hewcebûneke vê qederê dibîne. Dînen yek xwedayî vê yekê wek fermana xwedê dibînin. Felsefeya Yewnan jinê wek sedemê qelsiyê nîşan dide. Wek barekî bêkêr, wek zeviya mêr ku tê ajotin û hêjayî her cure helwestên piçûkxistinê tê dîtin.

Statuya jinê ya ku bi sîstema hiyarerşîk dest pê kir heta neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, ne dewlet û ne jî civaka çînî ku xwe dispêrên sîstema hiyarerşiyê, wê werin fêmkirin. Ji lewra mirov nikare ji yek mijarên bingehîn a xwe tê de xapandiye xilas bike. Jin, ne wek cinsekê, wek mirov ji civaka xwezayî tê veqetandin û bi koletiyekê berfireh tê mehkûmkirin. Hemû koletiyên din jî bi koletiya jinê ve girêdayî pêş dikevin. Lewma heta koletiya jinê ji hev neyê derxistin û neyê fêmkirin, wê koletiyên din jî ji hev neyên derxistin û neyên fêmkirin. Heta dawî li koletiya jinê neyê anîn, wê koletiyên din jî bi dawî nebin. Jina zana ya civaka xwezayî çanda xwedawenda dayik bi hezarê salan jiyaye. Nirx û buhaya ku her tim hatiye mezinkirin çanda xwedawenda dayik e. Eger wisa be; çandekê berfireh û demdirêj a civakê çawa hat tepisandin û îro bû bilbileke bi xemil û xêz a qefesê. Mêr dikarin li ser vê bilbilê dîn bibin, lê ew dîl û êsîr e. Heta dawî li vê dîlketina demdirêj û kûr neyê, ti sîstemên civakî nikarin behsa wekhevî û azadiyê

bikin. Hukmê ku dibêje; asta jinê ya wekhevî û azadiyê, asta civakê ya di vî warî de destnîşan dike, rast e. Balkêş e, hê dîroka jinê bi rêkûpêk nehatiye nivisîn. Di ti ilmên civakî de cihê jinê rast nehatiye danîn. Yê ku herî dibêje; ez ji jinê re bi hurmet im jî, vê yekê bi qasî ku bi kêra arzû û xwestekên wî were, wek hukmekî qebûl dike. Îro jî jin, ji bilî aliyê xwe yê cinsî wek dosteke mirov ji aliyê ti mêrî ve nehatiye pejirandin. Ji bo peydakirina mêrekî ji vê qonaxê derbasbûyî û yan jî afirandina mêrekî bi vî awayî, gaveke bingehîn e, bi aliyê azadiyê ve hatiye avêtin. Ezê vê mijarê hê jî analîz bikim û hewl bidim hê zêdetir hûrûkûr li ser rawestim.

Di civaka hiyarerşîk de mijareke din heye divê em bi girîngî li ser rawestin. Ew jî ev e; pîremêrên bi ezmûn û tecrûbe ciwanan bi xwe ve girê didin û li ser wan bi awayekî zordariyê dikin. Di lîteraturê de ji vê rastiye re dibêjin; jerontokrasî. Tecrûbe mirovê yextiyar û pîr dike xwedî hêz, lê li aliyê din bi pîrbûnê re mirov qels û hejar dibe. Bi van sedeman, pîr mecbûr dimînin ciwanan bixin xizmeta xwe. Ji bo vê yekê bidin kirin jî bi mejiyê ciwanan dilîzin. Hemû tevgera ciwanan dixin bin destê xwe. Civaka bavikanî ji vê rastiye hêzeke mezin digire. Hêz û bedena wan weke dixwazin bi kar tînin. Ev hewcehîştina ciwanan heta îro jî zêdetir dewam dike. Serdestiya îdeolojî û tecrûbeyê bi hêsanî nayê şikandin. Xwestina ciwanan a azadiyê jî bingehê wê ji vê rastiya dîrokî tê. Ji zanyarên berê heta ilimdarên îro û saziyên wan, agahiyên wek stratejîk û nazik bi nav kirine ji ciwanan vedizîne. Agahiyên didin, zêdetir ji bo tevizandin û hewcehîştina ciwan e. Yan jî dema agahiyê didinê amûran nadinê, wek taktîkekî neguher ê rêveberiyê timî serî lê digerînin. Sîstemên zordarî û polîtîk ên propagandayê, îdeolojî û taktîk ên li ser jinê têne meşandin, hemû ji bo ciwanan jî têne ceribandin. Xwesteka ciwanan a azadiyê, ne ku ji temenê wan tê, ji vê rewşa zordar a civakê tê. Gotinên mîna; xeşîm, beredayî, serxweş û hwd. ji bo piçûkxistina ciwanan hatine bi kar anîn. Naxwe ti tîkiliya wê bi rastiye re nînin. Dîsa ji bo hêza ciwan berê xwe nede sîstemê û nîzama serdest zirarê nebîne, ciwan bi seksê re tê lebikandin, bi dogmayên çor, jiber û hişk ve tê girêdan. Ciwantiyeke ber bi azadiyê ve ketibe rê, zehmete pêşî lê were girtin. Li serê sîsteman bela herî mezin ciwan in. Di tevahiya dîrokê de bi navê perwerdê ciwantî kirine qurban û tiştên ku aqil jê nagire û xeyal nayên kirin, bi sera de anîne. Di pêşketina civaka hiyarerşîk de piştî jinê, vê rewşa ciwanan roleke diyarker lîstiyê. Sîstema ku ciwan xistin bin destê xwe heta dawiyê ji xwe piştrast e. Pişt re sîstemên civaka dewletparêz hatin û hemûyan bi heman awayî kirinên xwe li ser ciwanan ferz kirin. Ciwantiyeke mejiyê xwe hatibe tevizandin û şuştin, mumkîne her kar pê bê kirin. Şer jî di navê de, her karê zehmet dikare bike. Li rêza pêş her kar û xebata zehmet pê tê kirin. Bi kurtî; mirov bi pîrbûnê re qels dibe, lê bi tecrûbeyan dibe xwedî hêz. Mirovên pîr bi hêza xwe ya tecrûbeyê qelsiya xwe ya ji pîrbûnê ji holê radike, ji bo vê yekê jî hêza ciwanan dixin xizmeta xwe. Ev rastiya ku xwe di sîstema bavikanî de bi rêkûpêk kiriye heta îro dewam dike. Divê ez careke din destnîşan bikim ku ciwan hêzeke fizîkî îfade nakin, ew rastiyeke civakê ne. Çawa jintî mijareke fizîkî nîne, rastiyeke civakê ye, ciwantî jî bi heman rengî ye. Yek ji wezîfeyên bingehîn ê ilmên civakî ew e ku divê dakeve çavkaniya van mijaran û rastiyan hatine beropaşkirin û belovajîkirin sererast bike. Di vê çarçoveyê de divê em li ser mijara zarok û sêlekan jî rawest in. Jixwe sîstemeke ku jin û ciwan kirin bin destê xwe, yekser nebe jî wê zarok û gedeyan jî bigire bin kontrola xwe. Pir girîng e ku mirov, helwestên belovajî yên civaka dewletparêz û hiyarerşîk li dijî zarok êşkere bike. Zarok ji ber rewşa dayikê mumkîn nabe li ser hîmên rast perwerdê bibîne, lewra ev yek tevahiya bergî û paşeroja civakî dixê nav derewê û belovajî dike. Ji bo zarokan sîstemeke zordar û derewker a perwerdê tê avakirin. Sîstem, bi pir awayên cihêreng hewl dide ku zarok hê di dergûşê de hewce bike. Gotina; "heft salî çibe, bibe heftê salî jî wê ew be." (kurmê şîrî heta pîrî) vê rastiye îfade dike. Himbêza jiyana azad a civaka xweza ji zarokan re timî wek xeyalekê tê hîştin, û destûr nayê dayîn ku zarok ti car van xeyalan bijîn. Yek ji wezîfeyên esîl ew e ku mirov zarokan bi van xeyalên xwezayê bitamijîne.

Pêwîste carek din were destnîşankirin ku serdestiya sîstema bavikanî mecbûriyet nebû. Her wiha derketina vê sîstemê qanûneke xweber a saf jî nîne. Ji ber ku di pêkhatina dewletbûn û dabeşbûna civakê de qonaxa bingehîn teşkîl dike, divê hûrûkûr li ser were rawestîn. Tîkiliyên li derdora jin-dayikê saz dibin, ji tîkiliyên hêz û otorîteyê wêdetir bi piştgiriyeke organîk pêk tên û ev şewazê tîkiliyê li gorî cewherê civaka xweza yî ne. Ev şewazê tîkiliyan çep û çewt nîne. Rê nade otorîteya dewletê. Ji ber ku tîkilî bi awayekî organîk pêk tên, hewceyî bi derew û zordariyê nîne. Ev nuqte êşkere dike ka çima dîne şamanîzmê bi giranî dîne mêran bûye. Wexta mirov ji

nêz ve li şamanîzmê dinere, bi hêsanî dibîne ku pîşeyek e, tê de ji aliyê hêzê ve xwenîşandan û xapandineke xurt heye. Ji bo li ser civaka xwezayî ya nişmî, bi qurnazî otorîte were danîn, bi nazenînî hêz û mîtolojiyê tê amadekirin. Şaman êdî ber bi rahîbbûn û oldarbûnê ve diçe. Têkiliyên bi pêşiyên pîr û bavpîran re dikevin pêvajoya îttîfaqê. Ji bo serdestiyê tam hewceyî nêçîrvanên xurt in. Koma herî zêde bi hêz û nêçîrvaniya xwe bawer, hêdî hêdî rengê yekemîn saziya eskerî digire. Di destê van sê beşan de her diçe nirx û qabîliyet kom dibin. Dora jin-dayikê bi qurnazî tê valakirin. Nîzama malbatî ya jin-dayikê her ku diçe dikeve bin kontrolê. Jina berê ku li ser mêr xwedî gotin û bi tesîr bû, hêdî hêdî dikeve bin otorîteya nû. Otorîteya herî bi hêz a yekemîn li ser jinê hat avakirin û ev yek tesaduf nîne. Jin hêz û berdevka civaka organîk e. Heta ew li dawiyê neyê hîştin sîstema bavikanî nikare bi ser bikeve. Ji wê jî wêdetir saziya dewletê nayê avakirin. Lewra li dawîhîştina hêza jin-dayikê qonaxê stratejîk e. Li gorî agahiyên bi dest ketine û mîtolojiya Sumeran; ev pêvajoyê pîr dijwar û çetîn derbas dibe. Di dînen yek xwedayî de figûrê jinê Lîlît-Hawa taybetiyên pêvajoyê bi awayekî balkêş nîşan didin. Lîlît jina serî natewîne, Hawa jî jina teslîmbûyî û çîzkirî îfade dike. Jixwe tê îddîakirin ku jin ji parsûyê mêr hatiye afirandin û ev yek jî pîvana hewcebûn û girêdana jinê ya bi mêr ve eşkere dike. Li aliyê din, di şexsê Lîlît de dijûnên wek lanet, pîrasêr, pîrebok, hevala şeytên û bêbextî yên li jinê hatine kirin, şîdeta xwe li hev rakîşandina jin û mêr îspat dike. Bawerî, raman û çanda hezar salan eşkere dike. Eger têkçûna jinê ya civakî baş neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, wê taybetiyên bingehîn ên çanda civaka serdest a mêran jî rast neyên destnîşankirin. Dibe ku li ser damezrandina civaka mêtîyê hîç neyê fikirandin jî, lê heta damezrandina civakî ya mêr neyê fêmkirin, wê saziya dewletê jî neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin. Bi dewletê ve girêdayî, wê çanda “şer” û “îqtîdarê” rast neyên bi navkirin. Em li ser mijarê hûrûkûr radiwestin, ji ber ku pişt re di encama hemû çînîtiyên civakî de kesayet-xwedayên xeternak, her cure sînor, mêtîngêh û canstendînen bûne, divê bêne zelalkirin. Eger mirov, bi paradîgmaya çavekî pîroz li laneta mirovatiyê – desthilatdariya siyasî, dewlet- binere, wê wextê di zêhniyeta mirovatiyê de wê dij-şoreşa herî qirêj pêk were. Jixwe ya bûye jî ev e, û wek hêmanê pêşketîneke mecbûrî hatiye nirxandin – marksîzm jî di navê de- û wisa têgihîştin dij-şoreşê herî xeter e. Eger dîrok di vê çarçoveyê de li serad û moxila rexnekirinê neyê xistin, her şoreşa were kirin, wê di demeke kin de bibe dij-şoreş û wê nikaribe xwe ji vê yekê xilas bike.

Pêşî, civaka xwezayî ya cîhana jinê, dûre ya ciwan û zarokan hat hilweşandin. Li ser civakeke nû ya hîyarerşîk bi zordarî û derewê (mîtolojîk) hat avakirin. Bi vê pêvajoyê re di zikhev de dij-şoreşên bingehîn qewimîn. Xweza hat tarûmarkirin û her ku çû mirov li dijî xwezayê rawestiya. Feraziya, bêyî şer û nêçîrê civak nikare bijî, rast nîne. Cureyên heywanan ên bi goşt debara xwe nakin, ji yên bi goşt debara xwe dikin, hezar caran zêdetir in. Pîr hindik cureyên heywanan xwe bi goşt xwedî dikin. Wexta mirov hûrûkûr li xwezayê temaşe bike, ji bo debar û jiyanê, pel, pincar û nebatekî dewlemend heye. Heywan encamê pêşketina nebatan e, yanî heywan ji nebatan e. Ev yek li gorî rêzetêkiliya diyalektîk e. Ji ber ku heywanê destpêkê heywanekî din nîne ku bixwe, lewra bi nebatan xwe xwedî kiriye. Mirov dikare goşt-xwarinê wek ji rê derketinê bibîne. Eger hemû heywanan hevdu bixwarana wê wextê ti cureyê heywanan nediman. Jixwe ev, dijberî rêzika tekamul û beridandinê ye. Di meylên bingehîn ên xwezayê de her tim ji rêderketin dibe. Eger em ji rêderketinê bikin hîmê bingehîn, ev ji bo kîjan cure û cinsî dibe bila bibe, wê ew cure û cinsê qir bibe. Em vê rastiyê bi awayekî balkêş di bi hevremayîna hemcinsan de dibînin. Eger her kes bi hemcinsê xwe re bijî yanî têkiliyêke homoseks deyne, wê xweber dawî li koka mirov bê. Ev îzah û ravekirina kurt jî pîr baş, ji rêderketina civakî ya li ser hîmê çanda şer û nêçîrvaniyê, li ber çavan radixîne. Ne tenê ji aliyê maddî ve, çanda kuştinê, ji aliyê manewî ve jî encamên xwe girantir in. Eger komekê, kuştina heywanan û hemcinsê xwe kiribe şêwazekî jiyanê û vê mecbûr bibîne –ji bilî parastina neçar- wê êdî her cure makîne, amûr û saziyên şer wek xebateke bingehîn bimeşîne. Wek saziya bingehîn dewlet, wexta xwe ji şer re amade bike, wê tîr û kevan, bivir û her cure amûrê şer were vedîtin û pêşxistin. Civaka bavikanî ya ku ji civaka dayikanî ya xwezayî derket, di dîrokê de ji rêderketina herî xeter bû û cewherê şêwazê mijokî û kuştinê xeter ên di dîrokê de ye, ku heta roja me ya îro tê. Ev rewş, ne qedêr û ne jî mecbûriyet e, tam ji rêderketin e. Dişibe melîkiyeta şer, dîsa dişibe diyalektîka mişk û mar. Ji niha ve, ji teoriyên dewletê re teoriyên “mişk-mar” were gotin, nirxandineke nêzî rastiyê ye. Paşnavê gelek zarokan şêr e, gelek kes xwezaya xwe bi şêrbûnê tînin. Ez dipirsim; “ji bo kê bixwe!” Di van rojan de ez bi

agahîgirtineke kê m hîn dibim ku rêze filmên “efendiyê hungulîskê-vegera qiral” deh xelatên Oscarê wergirtine. Bi kurtî di film de hungulîsk îqtîdarê temsîl dike û divê were tinekirin. Tam jî filmekî cîhana faraziye ku Emerîka çêke. Dibe ku maskeya îqtîdarê dikeve û ji niha ve tedbîrên pêşî tene standin, an jî ji bo hin zêdegaviyên globalîzmê qonaxeke mejî tevizandinê ye. Pêvajoya pêkanîna paradigmatên nû ne, divê amadekariyên wan hebin. Zîrek in. Ji ber ku rûyê rastîn ê îqtîdara klasîk eşkere bibe wê ti hêza xwe nemîne û ew jî vê yekê baş dizanin. Hêzên serdest ên ku cîhanê rêve dibin, wek pêdiviyeye sereke ya xwedabûnê –divê haya wan ji her tiştî hebe, di Quranê de behsa nêzîkbûna xwedê bi mirov re tê kirin û gotina “qasî mûyekî nêzîk e” tê bi karanîn – divê karê xwe bêqusûr bikin, pêş de bixin.

Çanda şer û nêçîrvaniyê, qonaxa dawî ya bigihîjê rêxistinbûneke eskerî ye. Rêxistinbûneke eskerî, çendîn civaka etnîk û xwezayî belav bike, wê pêş de biçe. Rêxistinbûna li dora jin-dayikê, nifş, gen, têtikiliyên pêşî yên xizimtiyê pêş de dibe, rêxistinbûna eskerî jî ji mêtên xurt ên ku ji vê têtikiliyê qut bûne pêk tê. Eşkere ye, êdî ti şewaza civakî ya xweza nikare li dijî vê hêzê raweste. Di têtikiliyên civakî de êdî zor –ji vê re têtikiliya medenî jî tê gotin – heye. Xwediyê hêza zorê diyarker in. Bi vî awayî rê li ber mulkiyeta taybet jî vedibe. Ji lewra tê fêmkirin çima di bingehe mulkiyetê de zor heye. Bi zorê zevtkirin û ji bo xwedîbûna milk xwînrijandin, hisa “ezîti”yê zêde xurt dike. Bi bandor û hukumkirina ser têtikiliyan zor pêş de diçe û tê bi karanîn. Hukumkirin bi xwe re xwedîderketinê tîne. Di naveroka hukumkirinê de xwedîderketin têtikiliyeke diyalektîk e. Di hemû nîzamên mulkî de xwedîderketin esas e. Di vê pêvajoyê de êdî komel, jin, zarok, ciwan, qadên nebat lê tene berhevkin û qadên nêçîr lê tene kirin, mulk tene dîtin. Mêtê bi hêz, bi hemû heybeta xwe gaveke pêşî diavêje, êdî ji qiral-xwedabûna wî re hindik maye. Şaman-rahîb ji bo amadekirina mîtolojiya vê pêvajoyê li ser kar e. Ya divê were kirin ew e ku ev pêşketina muhtesem bi hostayî di mejiyê mirovê hukum lêkirî de were bi cihkirin. Şerê meşrûiyet û rewabûnê, herî kê m bi qasî zora hişk hewldan û huner dixwaze. Divê di mejiyê mirov de bawerî wisa were bi cihkirin, wek qanûneke mutleq fê m bike. Li gorî hemû agahiyên sosyolojîk, têtîna “xwedayê hukumdar” di vê pêvajoyê de derdikeve. Di baweriya “totem” de ku bi civaka xwezayî re hebû, hukumkirin nebû. Totem wek sembola klan tabû ye, pîroz e. Ji yana klanê çawa be têtînen sembolîzekirinê jî bi heman rengî e. Bi rêxistinîkirina jiyanê û rêzikên wê, girêdaneke xurt heye û bêyî wan jiyan nayê fikirîn. Lewra, totem wek nîşaneyê mezin a hebûnê, dest nayê dayîn û pîroz e. Jê re hurmet tê kirin, jê re rêz tê girtin. Totem ji heywan, nebat û eşyayên herî bi kê r tê hîlbijartin. Di xwezayê de ka çi can û jiyanê dide klanê, wê jê were bawerkin û wek sembol bê pejirandin. Bi vî awayî, dîne civaka xwezayî, bi xwezayê re di zikhev de ye. Ne ji bo tirsandinê ye, ji bo bi hêzkinê ye. Dîn şexsiyet û hêzê dide.

Di civaka nû de totem li dawiyê dimîne û serdema xwedê tê. Xwedayê nû wê totem veşêre û binixumîne. Ewê ji xwedayê nû re li serê çiyar, li binê behran û li ezman cihekî bigerin. Bi vê serdestiya wî tê destîşankirin. Çewa dişibe çîna nû ya efendiyan! Di Tewrat, Încîl û Quranê de navekî xwedê “Reb” e, bi maneya efendî ye. Çîna nû xwe dike xweda û derdikeve ser dika dîrokê. Yek ji navên din ên xwedê ku herî tê zanîn, “El”, “Elohîm” e, bi maneya mezinahî û bilindahiyê ye, bavpîr û şêxê ji nav qebîleyan hiltê mizgîn dike. Bi derketina sîstema bavikanî, derketina xwedayên nû jî di hemû pirtûkên pîroz de bi awayekî balkêş tê ziman. Di Îlyada Homeros de, di Ramayana Hîndiyî de, di Kalavela Fîniyan de ev rastî her wisa ye. Eger civaka nû di mejiyê mirov de rewatiyê nebîne, şensê xwe yê jiyînê pir zehmet e. Rêveberî çi beşê civakê yê rê ve dibe nedabe bawerkin, nikare demeke dirêj bimeşîne. Rola zorê di rêvebirinê de ji bo kêliyekê ye, lê bawerî mayînde ye. Mînakî dîrokî Sumer ku di vî warî de yekemîn nivîsa resen a bi dest ketiye, hûrlêkolîna wê gelekî balkêşe. Di Sumeran de afirandina xwedê harîqa ye. Bi taybetî hilweşîna dayik-xwedawend û di şûnê de rabûn û serweriya bavik-xweda cewherê hemû destanan e. Destan ji serî heta dawî bi têtîkoşîna Înanna û Enkî, Mardûk û Dîamat tijîne. Pişt re ev hemû destanên dawerivîne nav pirtûkên pîroz, hûrlêkolîna wan a sosyolojîk agahiyên mezin pêşkêşî me dikin. Bê sedem dîrokê ji serdema Sumeran nadin destpêkirin. Eger mirov, dînan, destanên wêjeyî, huqûq, demokrasî û dewletê li gorî tabletên Sumeran analîz bike, belkî jî dikare rêya sereke ya herî nêzî rastiyê ji bo sosyolojiyê destnîşan bike.

Ev dij-şoreşa zêhniyeta bavikanî, belkî jî di dîrokê de hewldana herî mezin a belovajîkirin û ji rêderxistinê ye. Di mejiyê civak û mirov de wer rehên xwe berdane, em hê jî nikarin bostekê ji bandora wê derkevin. Rahîbên Sumeran hê jî hukum li me dikin. Saziyên dewletê yên vedîtin û

xwedayên wek îfadeya meşrûiyetê li hev anîn bi awayekî me rêve dibin nahêlin em çavên xwe vekin; li ser dîtînan me yên bingehîn û paradîgmayên me hukum dikin. Gotina Albert Einstein a wek "Hêza kevneşopî û hînbûnê, ji parçekirina atomê zehmetir e." zêdetir wek ji bo van têkiliyan hatiye gotin. Wek vê gotinê îşaret pê kiriye; ma ne hê jî li welatê şaristaniyê, cihê dergûşa dewletê û qesrên pîroz ên rahîbên Sumeran zîgûratan, li navbera Dicle-Firatê, li Iraqê, ji wexta wan vedîtinan û vir ve, mêtîngerî û şerên hiç deng ji wan qut nebû û li ti pîvana mirovatiyê nayên, hê dewam dikin. Ji lewra civaka bavikanî û dewletbûyîn ji bo mirovatiyê ne xêr, berovajî bela herî mezin e. Ev amûrên nû, wê carna mîna gulaka agir û carnan jî mîna gulaka berfê mezin bibin, hawîrdora xwe xira bikin û pîroza pîrozan cîhana me wê bikin êdî lê jiyana nebe. Ehda Qedîm derketina dewletê dişibîne cinawirekî bi navê Levîathan. Aliyekî Pirtûka Pîroz rastiya mezin tespît kiriye. Serîderketina bi Levîathan re timî wek fikareke bingehîn tê destnîşankirin û dibêje; eger ev cinawir neyê kontrolkirin wê "her kesî bixwe."

Ev çanda civakî ku min xwest bi awayekî şematîk nîşan bidim, em dikarin bingehê wê yê dîrokî û cografîk, herî baş li qûntara rêze çiyayên Zagros-Toros û deştên wan bibînin. Em têra xwe şop û bermahiyên civaka xwezayî ya di navenda wê de jin-dayik hebû, di dawîya serdema qeşayî de BZ ji salên 20.000 û pêve dibînin. Em li ser peykeran, di nîzama malbatê, ristin, tevin û destar de timî şopên jinê xuya dikin. Nîşaneyên mêtîyê di karekera ziman de, bi sedema xwedayên destpêkê xwedawend bûn, şopên berçav ên civaka xwezayî ya xwe dispêre dayikê ne.

BZ di salên 4000 de pêşketina otorîteya bavikanî xuya dike. Di civaka nû de hebûna ekserî bi hêz bû ye, zêde zêde şerên qebîleyan hene, şopên qirkirin û stû li hev xwarkirinê têra xwe xuya dikin. Hebûna eşîran, nîşaneyek e, ka ev serdem çiqas dijwar derbas bûye. Civaka bavikanî li wir belav dibe, bi xwe re çînbûna civakê û dewletbûnê tîne. Di dîrokê de yekemîn dewletên sîte BZ di salên 3000 de ava dibin. Mînaka herî berçav sîteya Ûrûk e. Destana Gilgamêş di cehwerê xwe de destana avabûna sîteya Ûrûkê ye. Dikare were gotin; şoreşa herî mezin a dîrokê, li derdora çanda vê sîteyê pêk hatiye. Hûnandina çîroka Înanna-Enkî, xwelihevrakişandina civaka bavikanî û civaka jin-dayikê bi zimanekî helbestwarî yê nazenîn îfade dike. Serdema qehremaniyê ku mînakên wê di her civakê de têne dîtin, di destana Gilgamêş de mînaka wê ya şahane û yekemîn orjîne berçav e. Em yekemîn şerê bajarî û barbaran li vir dibînin. Jin hê jî dûrî têkçûnê ye. Lê mêrê xurt, bi hebûna xwe ya eskerî hêdî hêdî civakê hîni serdestiya xwe dike. Bi hûnandin û tevna xwe ya îdeolojîk, bi saziyên dîni û yekemîn xanedanî û qesrên xwe, civaka şaristan û medenî şevqê diavêje.

c- Di Şaristaniya Koledar de Bîrdozî, Çîn, Bajar û Dewlet

Em dewletên koledar bi awayên wan ên herî saf di civaka Sumer û Misir de dibînin. Forma dewleta koledar a Sumer û Misir, di pêşketina zêhniyeta civakî, şewazên sazîbûna aborî û sosyal de guhertinên bingehîn kirine. Cîhana zêhniyeta civaka xwezayî, xwe dispêre têgihîştina xwezeyeke zindî û ruhber. Her hebûna di xwezayê de xwedî ruh tê qebûl kirin. Ruh wek sedemên zindîbûnê dihatin zanîn. Di têgihîştina dînen totêmîk de hê têgihîştina xwedayekî ji der ve hukum bike pêş neketiye. Bi nazenîn hewl tê dayîn, ji bo bi ruhên di xwezayê de yanî bi hêzên wê re li hev were kirin. Ji ber ku rewşeke berovajî maneya wê mirin e. Wexta têgihîştin ev bû, hewceyî bi lihev kirineke awarte heye. Li gorî pîvana bingehîn a ekolojîyê, em bi jiyane re rûbirû ne. Ji bo jiyana civakî bi hêzên xwezayê re neyê dijberî hevdu, hewldaneke girîng heye. Wexta exlaq û dîne xwe pêş de dibin, prensîba bingehîn a lihev kirina bi xwezayê û hawîdorê re li ber çav digirin. Ev prensîba jiyane, ew çend di mejî û zêhnan de bi cih dibe, wek kevneşopîyeke exlaq û dîn li ser seran tê girtin. Ya esas, ev prensîbeke herikîne ya jiyana xwezayî ye, di nav civaka mirov de bi cih bûye. Ti hebûn nikare hawîrdora xwe li ber çav negire. Ji rêderketinên demkin, bi herikîne re bi şert û mercên der ve û hundur ên nû re tevî pêvajoyê dibin. Naxwe bi tevahî li derveyî sîstemê dimînin, hebûna xwe wenda dikin. Girîngiya prensîba ekolojîyê di civaka mirov de ji vê taybetiya bingehîn a xwezayê tê.

Bi avabûna civaka dewletparêz a koledar re, ji vê pîrensîbê qutbûn û ji rêderketineke ciddî bû. Têkiliyeke xurt a pîrsgirêka hawîrdor û ekolojîk bi pêkhatina vê civakê û destpêka şaristaniyê re heye. Şaristaniya civaka çîni, civakek e, bi xwezayê re li hev nake. Sedema bingehîn a vê rastiye ew e ku civaka nû, bi paradîgma û cîhana zêhni ya koledar a bi dij-şoreşekê re eleqer

e. Di civaka xweza de hemû endamên komê di tevahiya jiyânê de bi awayekî organîk cih digirin. Her kes ji dil û durust parçeyekî civakê ye. His û baweriyên wan hevpar in. Têgînên xapandin û derewê hîç pêş neketine. Weke ku bi xwezayê re bi zimanê zarokan bipeyivin. Li gorî qanûnên civakê yên kirine dîn û exlaq, hukumkirina li xwezayê û xirab bi karanîn, gunehêkî herî mezin – tabû- û xirabî ye. Di civaka dewletparêz a koledar de ev têgihîştina bingehîn a exlaqî û dînî hatiye beropaşkirin. Ji bo meşrûiyeta civakî bi qasî zorê hewceyî bi derewê jî tê dîtin. Ji ber ku sistema koledariyê bi tenê bi zorê nayê meşandin. Eger hûn civakê bi baweriyên xurt û bingehîn ve girê nedin, hûn nikarin sistemê rê ve bibin.

Ev vedîtinên bingehîn ên îdeolojîk ên rahîbên Sumer û Misriyan ku tevahiya dîrokê û hê jî bandora xwe dewam dikin, di vê qonaxa dîrokê de derdikevin. Bi têgînên nû afirandin, şewaza fikrê ya bi riya mîtolojiyê hûnandin û ev yek kirin hîmekî bingehîn ji bo meşrûiyeta sistemê. Taybetiya bingehîn a van mîtolojiyan –mîtolojî, bi zimanê Yewnanî çivanok û efsane - ew bû ku cîhana xwedayan a nû derxistibûn ser bûyerên xwezayê. Xwedayên destpêkê En, Enlîl û Ra, cîhana efendiyan – Reban – pir bi hostayî mezin dikin û vedişêrin. Hukumdariya çîna koledar a ava dibe bi xwedabûnê re di zikhev de mezin dibe. Efendiyên nû, çawa bêyî bixebitin bi hukumdariyeke bêhemta li ser text û di qesran de xwediyê jiyânê ne, her weha nîşaneyên wan ên xwedayî ku hatine hûnandin û biriqandin jî, di ser hemû hêzên xwezayê re ne. Hakîmiyeta civakî siya xwe daye ser hakîmiyeta xwezayî. Li ser dîne ruhberiyê yê xwezayê, dîne xwedayan ên ferman dikin, hatiye ferzkirin. Li cihê ku pêvajoyên xwezayî bi ruhan werin ravekirin, bi xwedayan tê ravekirin, ev yek di zêhniyetê de dibe guhertineke bingehîn.

Bawer dikim tê fêmkirin, ka çima ji vê pêvajoyê re ne şoreş, dij-şoreş tê gotin. Ji ber ku di dîrokê de pêvajoya herî xeter û neyênî daye destpêkirin. Pir girîng e, em hinekî din, hûrûkûr li ser mijar û dabaşê rawestin. Têgihîştina xwezaya zindî, li derdorên ilmî yên îro, yek ji mijarên sereke ye, herî zêde tê guftûgokirin. Wexta me fîzîka kûantûmê rave kiribû, em bi kurtî li ser vê yekê rawestiyabûn. Ya rastîn, mîna ku di civaka xwezayî de nebe jî, her hebûna xwezayî qanûnek xwe ya tevgerê û asta xwe ya manayê heye. Ev têgihîştin yek ji dîtinên herî şoreşger, tê qebûl kirin. Sûbjektîfa hebûna bûye maddî rê ve dibe enerjî ye. Enerjî maddeyeke rastî nîne; bi gotineke din ruhê maddeyê ye. Her roja diçe, bi cureyên cihêreng ên enerjîyê di xwezayê de pencereyên pir nû tene vekirin. Wexta tê gotin; wê paşerojê bibe ya fîzîka kûantûm a “nanoteknolojî” ev pêşketin tê destnîşankirin. Di encamê de bi awayekî cuda be jî şewazê civaka destpêkê bi herikîna xwezayî re lihev kirî, bi têgihîştineke rast, jiyana ekolojîk esas digire. Mirovatî ji ber ku ji vê prensîbê qut bû û dûr ket, îro pirsgerêka hawîrdorê gihîştîye asteke xeter û tehlûke. Di bingehê qutbûn û dûrketinê de jî zêhniyeta şaristaniya civaka çînî û şewazê hilberandina wê, heye.

Bi vê mijarê ve, nuqteya duyemîn a girîng, qutbûna təkiliya di navbera mejiyê hisî û mejiyê analîtîk de ye. Vê qutbûnê rê li ber xeter û cudahiyeke mezin vekirîye. Mejiyê hisî bi hemû ruhberan re heye. Bi gotineke din, di hemû pêvajoyên xwezayî de rewşa xweser a sùbjektê, rewşa mejî ye. Mejiyê hisî di pêvajoya xwezayî ya tekamulbûna ber bi cînsê mirov de hêdî hêdî ber bi mejiyê analîtîk ve diçe. Di mejiyê analîtîk de hîlbijartin bi lez e, lewra qabîliyeta wê ya guhertinê xurt e. Lê di heman demê de aliyê wê yê ji rêderketinê jî ew çend xurt e. Mejiyê hisî, tevî ku basî e, bi xweseriyeke ajoyên hundurîn zelal e. Yanî tê maneya veguherîna refleksên bi şert, bi refleksên bêşert.

Ji bo hînbûnê ajo rêbazeke basî in, lê bi îstiqrar in. Berhemê tecrubeyên bi sed hezar salan e. Lewma bi hêsayî naxapin. Taybetiyek wan a din jî ew e ku bi jiyânê re têra xwe təkildar in. Li hemberî şertên der ve û hundur ên jiyânê eleqeder dikin an jî gef dikin, yekser reaksiyon nîşan didin. Lê ev aliyê wan, bi lez pêşî li rola wan a mejiyê analîtîk digire. Dîsa jî ji bo jiyânê mejiyê esas mejiyê hisî ye. Şîrove nake, dide jiyîn. Şîrove çiqas pêş dikeve, ji rêderketinê jî ew çend zêde dibe. Mejiyê analîtîk bi şîroveyê, rêyên nû dide ber mejiyê hisî û şikil dide tevgera wî. Ev yek zêdetir ji bo cureyê mirov e pêşketî wisa ye. Jixwe şewazê jiyana civakî ya cureyê însan bi asta pêşketina mejiyê analîtîk re təkildar e. Yê bi awayekî lezgîn civakê pêş de dibe mejiyê analîtîk e. Lê ji ber ku ji hisan bêpar e, wexta serbest dimîne, xeter e. Bi taybetî, mejiyê analîtîk piştî ku hîni çanda şer û desthilatiyê dibe, pir xeternak dibe. Mejiyê analîtîk e em qalê dikin di şerên îmhayê yên serdeman de bi awayekî balkêş xwe nîşan daye. Ji ber ku wek makîneyekê dixebite, ji hisên mîna êşê, tirsê û hezkirinê bêpar e. Bi sedema sempatî û empatiyê nas nake, taybetiya xwe ya

îmhaker bi awayekî pir xeternak ferz dike. Berovajî vê yekê, dema bi mejiyê hisî re lihevkişî bixebite, ji bo pêkhatina civakên herî têtûz ên xwedî qabîliyeta analîzeke payeber, roleke diyarker dilîze.

Di serdema civaka dewletparêz a koledar de ev her du mejî ji hevdu veqetiyane. Belkî jî di asta herî jor de, ji mejiyê hisî yê li ser civaka xwezayî serwer bû veqetîneke mezin dibe, û di şûnê de mejiyê çînek li ser hunerê mêtîngerî û zordariyê diponije, yekem car derdikeve pêş me. Ev bûyereke e, wê bi xwe re encamên xeternak bîne. Berhemê pir zêde yê koledariyê ku li ser berhemê zêde yê civaka neolotîk pêk hat, ji bo avabûna vê çînê bû zemînê maddî. Tenê bi rêvebirina hilberandinê dest datîne ser piraniya berhemên. Piştî vê yekê, dor tê avakirina zêhniyeta van berhemên biparêze. Di encama lêgerînê de xwedayên mîtolojiya nû yên ferman dikin derdikevin ser dika dîrokê. Pêvajoyeke xurt a mejiyê analîtîk dest pê dike. Mijarên herî zêde ev mejî li ser sekiniye, dîtina rêzikan ji bo rêvebirina ebdan e. Di heman demê de ev rêzik wek fermana xwedayên namirin nîşan dane. Ji ber ku ev mijar di dîroka mirovatiyê de cihekî girîng digire, ev dibe sedema meznahiya rahîbên Sumer û Misrê. Mejiyên wan ên ji civak û jiyana xwezayî qut bûyî, sistemeke mezin a mîtolojîk a hunandî afirandiyê. Ji bo ebdan pê bidin bawerkirin, sistema dibistanên efsûnkar, perestgeh û peyker ava kirine. Di şûna dînên ruhparêz ên civaka xwezayî de ku zirara wan nebûn, dînên xweda yên ferman dikin afirandin û stû tewandin daîmî kirin. Ketin cîhana tirsê, belovajîkirin û anîn ziman ka çima hewce ye ji xwedayan bitirsin û wexta guh bidin xwedayan wê çawa bêne xelatkirin. Ev xebat bi nazenîn û hostatî kirin. Yekem car utopyayên naveroka xwe cennet û cehennem vedîtin. Ya esas, ji çîna efendiyên nû re sistema îdeolojîk tê avakirin ji bo bi wan re were lihevkişin. Şewazê fikrê mîtolojîk e, ev yek li gorî demê li cih e. Ya rastîn, dînê zindîtiyê (anîmîzm) wekhevî û azadîxwaz e. Dînê nû yê bi giranî mîtolojîk e, dînê çînekê ye, wekhevî tê de nîne, dînê koletiyê ye. Ji sedî sed stûxwarkirinê ji xwedayan re – efendiyan – ferman dike.

Ev zêhniyet di dîroka mirovatiyê de dij-şoreşek e, û pêngava herî mezin a mejiyê analîtîk e, ya pêşketina mejiyê çînekê ye. Êdî dîrok, wêje, huner, huqûq û polîtîka, ji nû ve bi mejiyê vê çînê tê hûnandin. Em vê rewşê bi awayekî herî xurt û orjîn di mîtolojiyên Sumer û Misriyan de dibînin. Îdeolojiya çîna mêtînger a serwer êdî ketiye ser rêya civaka jor û civaka dewletparêz. Gavên li ser vê rê, wê li ser navê hemû civakê werin avêtin. Îdeolojiya jin-dayikê ya ji civaka xwezayî mayî wê were mêtin, naveroka wê were pûçkirin, asîmîlekirin û wê bixînin xizmeta nîzama xweda-mêran. Mîna ku çawa jin xistin xizmeta – destpêka fahîşetiya taybet û giştî – mêran. Hemû endamên civaka xwezayî yên azad-wekhev, wê bibin endamê çîna ebdiyetê. Destaneke Sumeran dibêje; mirov ji “gûyê” xwedayan hatine afirandin. Dîsa yekem car destanên Sumeran dibêjin; jin ji parsûyê mêran hatiye afirandin. Bi rastî, mîtolojiya Sumeran serketineke wer awarte ye, bandoreke mezin dike li mîtolojiyên piştî xwe tîn û heta dibe yekemîn çavkaniya dînên yek xwedayî, wêje û huqûqê. Di destanê de taybetiya Gilgamêş bi heman awayî dadiwerive nav hemû destanên cîhanê.

Ji ber ku bi awayekî berfireh analîzkirina zêhniyeta Sumeran mijara me nîne, bi kurtî em dikarin bibêjin; dîrok yanî şaristanî, ji bo dest pê bike, ne tenê zordarî, mejiyê analîtîk jî dibe çavkaniyeke bingeşîn. Paşê divê em rehên fikra metafizîkê jî di vî mejiyê de bibînin. Kulmeke efendî netenê li jor li qesrên mîna cennetê rûniştîne û rojên xwe derbas dikin, her weha hîmê efsane û cîhana utopyayên timî serî li mirovatiyê bigerînin, datînin. Derewa mezin a civakî ku pêk tînin, di mejiyê hemû mirovatiyê de reh ber dide û saziyên wê tîne avakirin. Ev yek bi her cure mîtolojî, destan, perestgeh û dibistanan tê kirin.

Di dîrokê de veguherîna herî bingeşîn a zêhniyetê di civaka Sumeran de wek dij-şoreşekê pêk tê û di serî de civaka Rojhilata Navîn, paradigmaya mirovatiyê – nertina me ya bingeşîn li gerdûn û xwezayê – ji binî ve guhertiye. Têgihîştina civaka xweza, gerdûn û xwezaya zindî, rengîn e, û hilberîner e. Xwezayê wek behok û zalim nabîne. Mîna dayikekê dibîne. Di zimanê Sumeran de gotina “Amargî” tê maneya azadiyê û di heman demê de tê maneya vegera li dayikê. Ev gotin bi xwe jî zêhniyeta dij-şoreşê pir baş li ber çavan radixîne. Li gorî nertina mîtolojiya nû, gerdûn û xweza bi xwedayên hukumer û cezaker tijî ne. Xweda ku – ya rastîn despotên mêtînger û zordar in – bilind kirine derveyî sînorên xwezayê û her ku diçe xwe vedişêrin, wek xweza zuha kiribin. Têgihîştina xwezayê û maddeyê mirî pêş de dibin. Tevî ebdên ji gûyê xwedayan hatine afirandin, her diçe hemû ruhberan piçûk dibînin, piçûk dixînin. Ev paradigma

her ku çû rehên xwe kûr berdan. Sedema bingehîn e ku mejiyê civaka îro ya Rojhilata Navîn tevizand û kir ku bi ser xwe ve neyê. Ewrûpayê bi reformekirina Xiristiyanîyê û şoreşa Kopernîk karîbû vê paradîgmayê hilweşîne. Dehayekî Ronensansê mîna Giordano Brûno, bi sedema ku têngihîştina xwezaya zindî parast, bi saxî hat şewitandin. Ev paradigma ji ber ku danewerivî civakên welatên Çîn û Japonyayê, pir zû dikarin bi pêşketinên erênî re li hev bikin. Di vê yekê de, têngihîştina wan a gerdûna zindî roleke bingehîn dilîze. Di şaristaniya Roma-Grek de jî bi sedema şewazê fikra felsefîk, mîtolojiyên Sumer-Misirê li dawî hîştin û di şûnê de hûnandina diyalektîka metafîzîk esas girtin, heman pêşketin bûn.

Çarçove û têngîna dewletê di malzaroka perestgehên rahîban de pêk hat, lê yên dewlet kirin sazî û xwediyê hêza desthilatîyê, şefê eskerî û meclîsa rûsîpiyên civaka hiyarerşîk in. Desthilatdariya dewletê, di navbera van sê aliyan de piştî têkilî û nakokiyên dûrûdirêj diyar dibe. Di destpêkê de qral-rahîp serdest in, paşê her ku diçe ev sazî cihê xwe ji meclîsa rûsîpiyan re – demokrasiya seretayî – dihêle, pişt re serdestiya şefê eskerî pêş dikeve ku ew xwediyê hêzê yê dawî û diyarker e. Ev pêvajoyê di destana Gilgamêş de bi zimanekî helbestî û mîtolojîkî hatiye îfadekirin. Gilgamêş bi xwe qehreman û şefê eskerî temsîl dike. Rahîb e û rabîhên berê yên xwediyê hêzê pir tepisokî bûne. Enkîdo wek mînakê yekemîn esker ji barbarên li derveyî etnîsîtê hatiye anîn, derdikeve pêşberî me. Rêxistinîyê li derveyî xizmtiyê pêş de diçe.

Bandora hêzê ya efsûnkar, hem yekem car rê li ber stû tewandinê vedike, hem jî dibe sedem xwediyên berhemê zêde xwe wek qral-xwedayan nîşan bidin. Pêvajoya ku egoya mirov xwe herî mezin îlan bike, dest pê dike. Êdî xweza û civak wek berhemekî qral-xwedayan tê nîşandan. Hemû mîtolojî beriya her tiştî cih didin vê vegotinê. Ji van çavkaniyan paşê wê dawerive pirtûkên pîroz. Bi vî awayî wê desthilatiya dewletê bêserûbinî bibe. Têngihîştina dewletê ya hê jî wek slogan tê bi karanîn “Ebed-medet dewlet” ji vê derê tê. Eger dewlet pêş neketa, bi taybetî bi mîtolojiyê nehata xemilandin, wê ji sazî û rêxistineke basît a cerdevanan wêdetir negihîştî ti qonaxê. Ji ber ku îqtîdara dewletê ji bo wê demê gelek hatina wê ya karê hebû, xwe wek saziyeke awarte ya xwedayî li ser hemû mejîyan ferz kiriye. Bi vê maneyê dibe ku wek rêxistineke desteserkirinê jî bê fêmkirin. Di vê nuqteyê de hêza îdeolojiyê derdikeve pêşberî me. Îdeolojî dibe sedem ku ev rêxistina desteserker, wek saziyeke pîroz a fermana xwedê were naskirin. Eger îqtîdara dewletê çiqas were mezinkirin û xemilandin, divê em fêm bikin ku li wir şêlandineke mezin û berjewendiyên veşartî hene. Qral-xweda ku ji vê rastiyê hayedar in, xwe kirine sazî. Qesrên bi heybet, hebûneke eskerî ya ji kesên bi hêz pêk hatî, îstixbareteke baş, haremeke balkêş, xanedaniyeke navdar, şecereya nîşan dide ka ji koka kîjan xwedayî ne, wezîrên her tim pesnê wan didin û ebdên stûxwar ji bo vê sazîbûnê ji wan hêmana ne, bêyî wan nabe. Qebrên piramît bi xwe, ji bo dunyayeke mayînde qesr in. Kînc, hêzeran û mor ji aksesûwarên wan in, timî ji xwe kêr nedikirin. Ji hemû endamên civakê re ya dima jî ev bû; diviyabû ebd timî ji van saziyên xwedayên mezin re serî bitewînin û şikir bikin. Di pirtûkên pîroz de gelek sîfatên xwedê hene, piraniya van têngînan sîfatên qral-xwedayên destpêkê yên Sumer û Misriyan e. Beşek ji wan jî versiyonên dubare ne, yan hatine guhertin.

Bi mirina wan re – ya rastîrîn çûna wan a dunya din – hemû berdestiyên wan bi awayekî zindî dihatin definkirin. Ji ber ku berdestiyên qral beşek ji bedena wî dihatin hesibandin. Ya rastîn tevî bedena qral definkirina wan, ji bo xizmetê li dunya din ji qral re bikin hewce bûn. Zurriyeta wan a li dunyayê jî dimîne wê hebûna wan dewam bike. Têngîna “bêmiriniyê” jî hinekî wisa derdikeve. Bi vê mînakê, bi awayekî balkêş xuya dike ku wexta mejiyê analîtîk ji rastiyê qut dibe, çawa civakê vediguherîne. Ji bo avakirina piramîdekê bi tenê, divê bi sed hezaran kole bi mirina xwe bixebitin. Desthilatiya dewletê ya tê avakirin, dibe erdhej û zordariyeke mayînde li ser serê mirov. Di ferhenga mirovatîyê de êdî têngînen zilm, mehşer û xelaskar hêdî hêdî bi cih dibin. Şexsiyeta peyxemberan wek şervanên azadiyê di van şert û mercan de reng digire. Peyxemberê wek xelaskarên vê felaketê derkevin pêş, çavkanî dîsa civaka Sumer e.

Bi civaka xwezayî re beşekî wenda dike jin in. Mîtolojiya Sumer mîna lawikên şînê yên jina wenda kiriye. Di kulta Înanna de hem şopên berê yên serdema civaka jin-dayîkê hene, hem jî têkoşîneke mezin li dijî civaka serweriya wê mêr dike, heye. Sîteyên destpêkê bi giranî ji aliyê jinan ve têne avakirin, lê paşê hemû cihê xwe ji mêran re dihêlin. Di serê saziyan de ya ku jin xistiye, dîsa perestgehên tîn. Di destpêkê de perestgehên di bin rêveberiya jinan de yên li ser navê xwedawend-dayîk Înannayê, yek bi yek têne dagîrkirin û dikin kexxane. Nîzama malbatî ya li

dora jin-dayikê ya civaka xwezayî, saziyeke cuda ye. Xwediyê jinê tineye, di heman demê de jin bi xwe, kîjan mêr û zarokî bixwaze dikare rê ve bibe. Bi awayekî klasîk saziya pîrekî û zilamtîyê pêş neketiye. Li ser hîmê saziya dewletê, piştî ku civaka mêrê serwer pêk hat, malbata bavikanî ya bi rêveberiya mêr, belav bû. Saziya malbatê naveroka wê diguhere, rengê xwe yê destpêkê digire û heta îro dewam dike. Xwediyê jinê mêr e, her weha zarok jî yê wî ne. Jin her ku diçe ji hêzê tê xistin û dikeve pozîsyona mal û milk. Malbat di cewherê xwe de dibe qefesek.

Qasî malbata di bin rêveberiya mêr de ti koletiyeye daîmî û kûr nehatiye dîtin. Ev tespîtek e, hemû sosyologên navdar li ser hemfikir in. Ji bo mirov asta koletiyê ya civakê analîz bike, ji sedî sed divê mirov asta koletiyê ya jinê bi awayekî berfireh çareser bike. Jin ne tenê ji aliyê mejî û kiryanan ve hewce hatiye kirin, di heman demê de hemû hisên wê, tevgerên wê yên bedenî, nîzama dengê wê, lixwekirin û vexwarina wê jî bi koletiyê re têkildar hatiye kirin. Xelek bi poz, guh, zend û lingên wê ve hatine kirin. Ev sembolên zincîra koletiyê ne. Di serdema navîn de kembera bakîretiyê jî bi jinê ve tê kirin. Têgihîştineke yekalî ya namûs û exlaq tê pejirandin. Ji aliyê îdeolojîk ve jinê tine dikin. Hemû nirx û buha ji destên wê tene girtin û wê dixin rewşa mal û milk. Bi qelen û next tê wezinandin.

Koletiya jinê ku çavkaniya wê civaka Sumeran e, mijarek e, hê dest pê nehatiye kirin. Hewcebûna bi civaka hiyarerşîk dest pê kir, di perestgehên rahîban re hat derbaskirin û xistin holika mêr, bi vî awayî bi statuya herî giran bi dawî kirin. Ji wê demê û vir ve, statuya ku pêş de birine ev e. Mijara bingehîn a wêje, exlaq û perwerdeyê her jin bû û dianîn ziman ku jinek bi hemû his û tevgerên xwe çawa dikare ji mêrê xwe re xizmetê bike. Koleyê mêr bi berhemê zêde yê bi dest dixistî û hêza xwe ya milan, statuya xwe destnîşan dikir. Koletiyeye naveroka wê aborî bû zêdetir derdiket pêş. Lê jinê bi hemû beden, ruh û fikra wê dikin kole. Eger hûn mêrekî kole serbest bikin dikare bibe mirovekî azad, lê hûn jinekê serbest bikin, wê biçe koletiyeye hê xirabtir. Ev rastî bi xwe, koletiyeye kûr nîşan dide. Çavdêrekî baş dema li jinê temaşe bike, bi hêsanî dikare bibîne, jin çawa bi her awayî li gorî daxwazên mêr hatiye hûnandin û reng dayîne. Ji dengê wê heta meşa wê, ji nertina wê heta rûniştina wê, wek bibêje; “ez hatim qedandin” Li ser koletiya jinê analîz nehatine kirin, yek ji sedemên bingehîn ê vê rastiyê, çilekiya mêr û ruhê wî yê tatmînkar ê dîktator e. Prototîpa qral-xwedayên di civakê de, efendiyê jinê mêrê li malê ye. Ew ne tenê zilamek e, ew xweda-mêr e. Ev taybetiya mêr bêyî ku biguhere, bandora wê heta roja me ya îro hatiye.

Civaka dewletparêz a koledar di warê ekonomîk de rengê fabrîkeyeke mezin lê dixê. Ji fabrîkeyên hemdem, ji aliyê xwedî û teknîkê cuda dibe. Kole mîna kerîyan tene xebitandin. Li nav zeviyan, li kanên keviran û di avakirina xaniyan de tene xebitandin. Ev yek ji berhemên serdema Arkaîk mane pir baş tê fêmkirin. Kole ji heywanan dijiwartir tene rêvebirin. Kole heywaneke tê xebitandin. Milk tê dîtin. Tenê amûrekî hilberandinê ye. Kole li derveyî huqûqê ne. Mîna eşyayek ku hisê wê nebin. Di mijara koleyan de qonaxa mejiyê analîtîk ê mêran gihîştîyê pir zêde balkêş e.

Di civaka dewletparêz a koledar de saziya mulkiyetê jî gava destpêkê têkûz diavêje. Cewherê sîstemê ew e ku civaka jor, civaka jêr bi her awayî dike milk. Xweda-qral û alîkarên xwe xwediyê her tiştîne. Xwedîtî encameke xweza ya serdestiyê ye. Egoya mirov eger derfetên pêşketinê bibîne, taybetiyên wê yên sînor nenas hene. Di serdema avakirina sîstemê de ji ber ku bandorên bi sînor bikin nîne, rê li ber kulta xweda-qral vedibe. Nîzama mulkiyetê ya civaka xwezayî nas nedikir, ji mulkiyeta dewletê dest pê kir dawerivî malê û her saziyê. Di her kesî de hisa mulkiyetê afirand. Mulkiyet hîmê dewletê tê hesibandin û tê pîrozkirin. Ji vir û pêve ya were kirin ev e; wê hemû dunyayê bikin milk. Sînorên dewletan, zevî û erdên xanedanan, sînorên welatan, bi awayên cihêreng sînorên mulkiyetê heta îro wek dayîneke xwedê kirin fitreta mirov. Ya rastîn, mulkiyet wek çavkaniya kurtêlxuriyê dizekî ye. Saziya herî zêde piştgiriya kollektîf a civakê xira dike. Lê ji bo xwedîkirina civaka jor jî saziyeke bingehîn e, dest jê nabe.

Me hewl dabû, em destnîşan bikin ku civaka ekolojîk xweber civaka xwezayî ye. Piştî ku civaka dewletparêz bi berfirehî û kûrahî mezin dibe, civaka ekolojîk gav bi gav bi paş ve tê xistin û ev jî wek yek ji nakokiyeye bingehîn a civakî tê heta îro. Nakokiya civakê ya hundurîn çendîn mezin bû ye, nakokiya wê ya bi atmosfera der ve re jî ew çend zêde bûye. Tehekuma li mirov bi xwe re tehekuma li xwezayê tine. Eşkere ye ku sîstemeke dilê wê bi mirov neşewite, dikare her cure xirabiyê bi xwezayê bike. Jixwe hakîmîyet û fetîh wek du rastiyên bijare di exlaqê çna

serdest de cih girtine. Hukumkirina li xwezayê, bi qasî hukumkirina li mirov wek heq û helwesteke bi şeref tê dîtin. Zindîtiya xweza û pîrozkirina wê ya civaka xwezayî tine hatiye hesibandin. Mîna dijminekî fetîhker. Wexta ev têgîn li ser zêhniyet û tevgera civaka dewletparêz serdest bûn, êdî ji felaketên mezin ên hawîrdorê re ku di roja me ya îro de bûne xetereke ciddî, rê heta dawiyê vebûye.

Nirxandinên me yê ji bo bi navkirina civaka dewletparêz a di qonaxa damezrandinê de divê têrê kiribe. Mijara balê dikişîne ev e; çima ne koledar, çima em têgîna civaka dewletparêz a koledar bi kar tînin, dibe ku ev pirs were kirin. Ez wer bawer dikim ku wexta em dewletê wek civaka jor qebûl bikin, bi kar anîna vê têgînê hê berçav e, û wê ji armanca me re xizmetê bike. Dewlet nebe em nikarn koletiyê bifikirin. Şertê bingehîn erka dewletê ye. Dewlet saziyeke mucered nîne, ji ber ku rêxistinbûneke hevpar a kesên serdestiya amûrên mêtîngerî û zordariyê kirine destê xwe. Xizmetên giştî yê ewlekariyê ku ji bo her kesî hewce ne, û xizmetên din ên ji bo gelemperiyê, dibin perdeyek ji bo vê rêxistinbûna behsa wê tê kirin veşêre û li ber çavê civakê rewa bibe. Yek ji sedemên din a jê re tê gotin civaka dewletparêz ev e; formên civakî yê feodal û kapîtalîst jî xwe dispêrin heman dewletê û hebûna pêşketina xwe pê dewam dikin. Saziyên hevpar ên komên mêtînger û zordar, rêxistinbûnên bi navê dewletê ne. Ji bo mêtîngerî û zordariyê ti sazî bi qasî dewletê bi tesîr û bi bereket nebûye.

Formên orjînal ên civaka dewletparêz ên koledar, zêdetir mînakên wê Sumer û Misr e, wek xeleka duyemîn, mînakên Hind, Çîn û Hîtît dubare ne. Saziyên cewherê xwe heman tişt, bi guhertina rengê xwe timî xwe ji nû ve ava dikin. Bi awayekî taybetî mînakên Îran, Grek-Romayê di warê zêhniyetê de dibin sedema veguherînin girîng. Li ser rêya exlaqê azad û awayê fikra felsefîk gavên girîng pêş de hatine avêtin. Di saziyên koletiyê de pir nebe jî ber bi başbûn û nermbûnê ve gav hatine avêtin. Sîstemê BZ di navbera 1000-300 de rengê xwe yê klasîk wergirtiye. Serdema xwe ya stewiyayî û gihîştî BZ di navbera 2000-1000 de jiyaye. BZ 3000-2000 damezrandina seretayî ya serdema arkaîk e.

Bêguman mirovatiyê di serdema koletiyê de ku weke şaristaniya çînî û sîstema bingehî ya civakê bû, pêşketina xwe dewam kiriye. Sîstema koledar her tiştî diyar nake. Şoreşa bajêr em nikarin wek berhemê koledariyê bibînin. Bêyî dewlet û koletiyê jî bajar dikarin pêş de biçin. Em gelek bajarên nebûne dewlet dibînin. Xetayeke mezin e, mirov nivîs, matematîk, ilmên cihêreng û pîşe, avakirin û şaxên huner ên bi bajarbûnê re pêşketine, wek encameke sîstema koletiyê bibîne. Di vî warî de Marksîzm jî di navê de, gelek êkolên ramanê, koletî mîna qerasesekî pêşketinê nirxandine û bi vî awayî şaşiyeke bingehîn kirine. Ya rastîn îspat dikin ku huner û ilîm ji desthilatdariyê qut nebûne. Ji nirx û buhayên dewletê herî zêde xistine bin kontrola xwe di serî de huner û ilîm tînin. Hem ji bo rê li pêşiya pêşketinê azad bigire û hem jî ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne, bi awayekî dijwar hewceyî bi kontrolkirina huner û ilmê dibîne. Sîstema koledariyê, bihêlin pêş xistibe, berovajî dîrok nîşan dide ku huner û ilîm asteng kiriye. Keşf û vedîtînen di navbera salên BZ 6000-4000 de ku wê demê dewleta koledar nîne, mirov dikare bi serdema navbera salên PZ 1600-1900 re qiyas bike. Tiştên di 5000 salên navberê de pêk hatine gelekî kêmtir in. Wek tê zanîn, zanist di salên navbera 1600-1900 de bi giranî berhemên ferdî ne. Dewletê wek her carê tiştê kiriye tenê ev zanist kirine bin destê xwe.

Di pêkhatina bajaran de rola ramana analîtîk gelekî heye. Herçî civaka koledar e, ev şewazê ramanê di çarçoveya berjewendiyên çînî de belovajî kiriye. Naxwe koledariyê ramana analîtîk pêş de nebiriye. Ya sîstema koledariyê kirî ev e; bi şewaza vê ramanê cîhaneke mezin a derewan afirandiye û mîna kabûsê berdaye ser mejiyê mirovan. Eger pêşketina çanda hevpar a mirovatiyê huner û zanist bi forma koledariyê û civakên din ên çînî ve were girêdan, heye ku bi rastiya îqtîdar-zane û serweriya dewletê ya li ser zanist û huner were ravekirin. Nirxandinên bi vî rengî li ser navê tevger û îdeolojiya wekhevî û azadiyê, eger nezanînen nebe, bêyî hay ji xwe hebe girêdana bi bloka desthilatdar ve îfade dike. Marksîzm-Lenînîzm jî bin, ev hukum naguhere. Marksîzm-Lenînîzmê nekarînen xwe tam ji bloka îqtîdar-zane rizgar bikin û ev jî yek ji sedemên bingehîn bû ku rê li ber hilweşîna sosyalîzma reel vekir ku ezê di beşên pêş de, hewl bidim vê mijarê bi awayekî berfireh rave bikim.

Forma civaka koledar a dewletê PZ di navbera salên 250-500 de ketiye krîzê û wek formeke jorê wê, bi serdestiya civaka feodal bi encam dibe. Di hilweşîna vê sîstemê de êrişên ji der ve yê komên "barbar" ên xwediyê taybetiyên civaka xwezayî, di hundur de rizîn û têkoşîna

Xirîstiyaniyê xwediyê bandoreke diyarker in. Lê di vir de ya ji holê radibe ne dewlet e, forma wê ya koledar e. Dewlet hê xwe bi hêz dike û digihîne forma feodalîzmê.

d- Serdema Şaristaniyên Koledar

Guftûgoyên zanistî yên der barê dem, serîdan û şaxdana kakilê şaristaniya îro de ya ku hukim li dinyayê dike, mêyildar in ku li ser tejaneya Dicle-Firat a Jor û Jêr li hev bikin. Herdu beşên dawiyê ku em bi giranî li ser rawestiyên, ya me gotî piştrast dikin. Şîroveyên me jî nîşan didin ku devera pêkhatina vê kakilê tejaneya Dicle-Firat a Jor a li qûntara çiyê ye. Kakil an jî sîsika vê pêkhatinê li vir meyiya û şitla wê ya pêşî jî ji aliyê rahibên Sumeran ve hat qelemkirin û bi vî awayî hîmê civaka şareza hat danîn. Divê neyê jibîrkin ku ev bûyerên manedar ên me di nav hevokeke bi qasî pênc saniyeyan de bi cih kirine, bi ceribandînan hezar salan ên dûvdîrêj hatine bicihanîn, meyiyanê û mayînde bûne.

Sosyolojiya pozîtîf di çarçoveya zeman û mekan de bi tevahî xwe venagirin his dikin. Bûyer û diyardeyên behsa wan dikin zeman û mekanê wan nîne. Qaşo bi îddîaya zanista ceribandînan û diyardeyî radibe. Çiqasî bê zeman û mekan analîzan bike, bawer dike ku bi awayekî zanistî tevgeriyaye. Bi çar lepan bi rêbazê digire û xwedî lê derdikeve. Ya rastî, di bin hîmê vê nêzîkatiyê de têgihîştina modernîteyê ya xwe di nava zeman û mekan de bêserûbinî dibîne, heye. Bi tevahî huner, felsefe û zanista navenda wê Ewrûpa ye, xwedî meyleke bi vî rengî ye.

Çawa ku Xwedê jî ji zeman û mekan munezzeh e, ev rahibên hemdem ên îdeolojiya şaristaniya Ewrûpayê hûnandine jî di warê bêşnorî û bêserûbiniya zanista xwe de ji xwe razî ne, û rehet in. Ew çiqasî ji tengavbûna zeman û mekan birevin, ewqasî yeqîn dikin ku tejiya xwe ya zanistî ji avê derdixin. Her demê xwediyên paradigmayan vê çewtiyê gelek caran dikin. Em baş dizanin ku ti bûyereke, diyardeyek, saziyek, çalakiyek, kesayetek û civakek nîne ku bandora zeman û mekan li ser nebe.

Rêbaza ku çarçoveya zeman û mekan dike hîmê xwe, hêza şîroveyê ya maneyê zêde dike. Di qada zanistên civakî de dîrok 'niha' ye, 'niha' jî dîrok e. Cudahiya di navberê de zêdetir şiklî ye, hîmê kêmtir cewherî ye. Berî ku ez Fernand Braudel bixwînim, min fêhmkiribû û weke rêbaz qebûlkiribû ku bi taybetî bêyî têngînên 'demê' em ê nikaribin sosyolojiyê manedar bimeşînin. Ez vê rêbazê ji bo mekan jî weke rêbazê mirov nikare jê bigere qebûl dikim. Herçend parêznameyên min bi amatorî bin jî bi cihanîneke xurt a vê têgihîştinê îfade dikin. Mirov dikare di tevahiya analîzên min de heman şopan bibîne. Wê wextê zanyarên Ewrûpayê yên di mijara rêbazê de ewqas nazik in, çima di mijara zeman û mekan de weke amatorekî mîna min ji dabaşê haydar nînin an jî jê direvin? Mirov vê yekê dikare bi NAVENDPERESTÎ û GERDÛNPERESTIYA EWRÛPAYÊ rave bike; bi van xisletên xwe nekarî jî metafîzîkeke çor rizgar bibin an jî mîsyon û baweriya wan a bi avakirina civakeke metafîzîk e.

Wexta ku em dîrokê û mekanê li sosyolojiyê zêde bikin, jiyan çawa diherike û diçe, em di dîrokê de û 'niha' çî ne, em ê baştir fêhm bikin û lê serwext bibin. Eger dîrok û niha gelekî nêzî hev in, dîsa mekan mîna pêpelûkên pêlikê yên li pey hev tînin hevdu temam dikin, wê wextê em dikarin bibêjin mirovatî yekpare ye, bêyî qewman, dînan, dewletan, neteweyan, hevgerînan, NY û enernasyonalan jixwe di nava yekîtiyê û yekparetiyê de ye. Wer diyar e, saziyên qaşo li yekîtiyê digerin, dibin ew sazî ku berevajiyê vê yekê dikin. Civaka şareza pêkhatineke seyr û ecêb e. Xisleteke wê heye ku her tiştê dibêje berevajiyê wê rast e. Ji bo em li hemberê vê rastiya wê matmayî nemînin, divê em civaka şareza her tim berevajî û berepaş bixwînin.

Min ev pêşek pêşkêş kir da ku zêdetir balê bikişînim ser belavbûna şaristaniyê ji aliyê zeman û mekan ve û ez nîşan bidim ku divê mirov çawa şîrove bike.

1- Şaristaniyên Misr û Sumer

Vegotinên me yên der barê bi sazîbûna neolîtîkê de çêbûna kakilê şaristaniyê rohnî kiriye. Eger hûn vî kakilî nefikirin, hûn ê qelemkirina şitlê ya Sumeran li ku biteamînin? Li naverastê kakil û dendikeke zîl bide tine. Hebe jî di wê rewşê de nîne ku bigihîje. Em çawa DYE'yê nikarin bêyî Ewrûpayê bifikirin, belkî hîmê zêdetir bêyî kakilê şaristaniyê li Dicle-Firat a Jor, wê Dicle-Firat a Jêr bi tenê çirav û qamir bûna. Meyandina şaristaniyê li aliyekî bihêlin, belkî bi tenê jiyanê mîna ya Pigmeyan pêk bihata.

Di warê belavbûnê de pirsgirêkeke girîng jî ew e ka çima li Dicle-Firat a Navîn û heta li Anatolyayê wargehên gelekî li pêş nebûne an jî nekarîne bibin bajar. Wexta em ji niha pênc hezar sal paş ve diçin, em dibînin ku gelek herêm li ber şaristanîbûnê ne, gelek gundên mezin hene li ber bajarbûnê ne, lê paşê ji ber sedemên em baş nizanin bêyî ku pêşde biçin hildiweşin. Mînak Çatalhöyük û deverên di navbera Îran-Turkmenistanê de deverên bi vî rengî ne. Yek ji xusûsên ku em dizanin ew e ku li herêmekê zêdebûna şênîyan girêdayî mezinbûna berhemê wê ye zêde ye. Ya vî berhemî zêde jî bike tejaneya erdên bi bereket ên li ber devê çeman e ku têne avdan. Li nêzî ketina deryayê çemên Nîl û Dicle-Firatê erdên bi aluyon ên bi bereket çêkirine ku ev yek jî vî fikrê piştrast dike. Ji bo destpêkê bi qasî çêbûna bajêr, şertê pêş ew e ku divê hejmara xwe zêde û mayînde bikin. Şertekî din ew e ku ji sedî sed divê nêzî wan herêman, mercên çandî yên xwe bi xwe biafirînin hebin. Ti qada bi aluyon bi serê xwe rê nade çanda neolîtîkê. Ji ber ku şert û mercên vî çandê nînin. Di çanda neolîtîkê de şertên bajarvaniyê yên mezinbûn, mayîndebûn û pirrbûna hejmarê tinene. Ji ber van rewşan hewcedarî bi temamkirinê heye.

Bi qasî li jêr nebe jî, tevahiya nîşaneyan îşaret dikin ku li tejaneya Dicle-Firat a Navîn rêzeke bajarên bi mezinahiya navîn hene. Lê berî ku ez behsa vî bikim, di salên 3500 B.Z. de şaristaniya bajarê Ûrûkê sistemeke xwe daye qebûlîkirin afirandiyê. Ûrûk nîzama koloniyên ava dike, modeleke hejmara bajarên zêde bike pêşkêş dike û bi rola xwe radibe. Di dîrokê de dibe xwediyê şerefa şaristaniya pêşî ava bûye. Kulta xwedawend Înannayê û Destana Gilgamêş îspatên bêmiriniyê ne. Heye ku B.Z. di salên 3000î de ji aliyê hevgerîna bajarên li bakur ên bi bereket û hejmara wan zêde bûyî tê hilweşandin.

Dema xanedaniya Ûrê di salên 3000î B.Z. de destpê dike. Bi şeweyê sê xanedaniyan di çarçoveya heman mentiqê avabûn û hilweşînê de xwe vekişand bakur û heta salên 2000î B.Z. dewam kir. Xanedaniya Aqad a Sargonî û dema Gudea'yê Gotî di vî çarçoveyê de mirov dikare bihesibîne. Metnên pêşî yên huqûqê yên nivîskî, destanên wêjeyî, akademî, şerên bajarên ên bê rehm mîna yên îro, mînakên balkêş ên weke Loriya Ji bo Nîppûrê û Destana Lanetkirina Agadeyê ji wê demê mane ku yekser têne hişê mirov. Tê fêhmîkirin ku sistemeke berfireh a koloniyê ya Ûrê heye. Jixwe koloniyên pêşî li kevana hundirîn a sistema Zagros-Torosê gelekî bi lez zêde dibin û bi lez jî bi dawî dibin.

Encama mirov ji vî derxîne ew e ku civaka di nava wê de kolonî ava kirine, çanda wê bi hêz e. Şaristaniyên Misr û Harappayê tevî şaristaniya Elam-Sûsê herçend weke şaristaniyên bajarên ên serbixwe bêne nirxandin jî têkiliya yekser nebe di çarçoveya objektîv de mirov dikare wan bi Sumeran re tenê ji aliyê koloniyên ve bide ber hev û muqayese bike.

Serdema Babîlan di salên 2000î B.Z. de li bakur bi heman mentiqê dest pê kir. Herçend li şûna Sumeran ji etnîsîteya Aqadan ango çanda Semîtikê bê hesabandin jî bi xwe şaristaniyeke Sumerî ye. Ji aliyê bisazîbûn û zanistê ve asta herî jor a şaristaniyê tê qebûlîkirin. Weke bajar Babîl mîna Parîs a Ewrûpayê xwedî rolekê ye. Bajarê çand û zanistê ye. Bazirganên wê zêde bûne, tevahiya çandan lê hatine cem hev, cara pêşî rewşeke kozmopolît pêk hatiye. Bandora wê li ser dewrûberê zêde ye. Di dîrokê de serdema Nemrûtan ango qralên bi hêz ên pêşî, dide destpêkirin. Mîna bajarê rohnîyê balê dikişîne ser xwe. Sê qonaxên xwe yên girîng hene. Serdema derketinê ya bi heybet, B.Z. di salên 2000-1600î de bi Hammûrabi'yê navdar tê naskirin. B.Z. di salên 1600-1300î de kengî qewmên Hûriyan bandor lê kirin serxwebûna xwe ji dest da. Dema sêyemîn, B.Z. salên 1300-550î ye, bi bandora Asûran ji aliyê Persan ve hatiye dagirkirin. Serdema Babîlan a 1500 salî pirr xuya neke jî şopên gelekî xurt di bîra mirovan de hiştin. Şerê xweda Mardûk û xwedawend Tîamatê û destana navdar a Ennûma-Elîş çîroka bi êş a têkçûnê ya jin-dayikê ye. Astronomiya wê, kehaneta rimildaran, esareta Ben-î Îsraîl, gelek metnên edebî yên nivîskî bermahiyên berxwedana li dijî Asûran e ku ji navenda çanda Kaldeyê mane û ji wan bîranînan in ku neyên jibîrkirin. Di serî de Solon gelek filozofên Yewnan dersên xwe yên pêşî li vî bajarî girtin. Em wexta vî tînin bîra xwe, em bandora xelekwarî baştir fêhm dikin.

Em dema Asûr dikarin bikin sê beş. Dema yekemîn, salên 2000-1600 B.Z. dema qralên bazirgan e. Bazirganî her diçe mezin dibe. Bazirganên bajarê Nînova yê li nêzî Mûsil a îro ji bo xwe kiribûn navendeke bazirganiyê. Asûr xwedayê parastina vî bajarî bû. Bazirganên yekem car di dîrokê de koloniyên herî mezin ên bazirganiyê ava kirin. Ji Rojhilatê Derya Spî heta keviyên Pêncavê, ji Derya Reş heta Derya Sor li gelek deveran gelek bajarên kolonî yên bazirganiyê ava kirin.

Mirov dikare bibêje ku di ware mîmarî û bazirganiyê de qonax bihurandine. Bajarê Kultepe (di dema Asûran de jêre Kanîş dihat gotin) yê nêzî Kayseriyê û bajarê Karkamişê (ji Karûmê yanî acenteya bazirganiyê tê) yê li nêzî devera îro Firat tere derbasî Sûrî dibe ji wê demê mane. Salên 1600-1300 B.Z. dema serweriya dewleta Mîtanî ya bi koka xwe Hûrî ye. Rêûresma Asûr, herçend girîngiya xwe ya berê kêr biba jî hebûna xwe dewam dike. Dema wan a herî bi heybet salên 1300-612 B.Z. ne. Di dîrokê de împaratoriya pêşî ya herî bi hêz û herî berfireh ava kirine. Di şer de bi xedarî û bêrehmiya xwe tene naskirin. Tê gotin ji serê mirovan kelhe û birc ava kirine. Di dîrokê de cara pêşî şopên qirkirina mirovan û bi tevahî valakirina deverê di vê demê de tene dîtin. Dîsa herî zêde têgihîştina gelan a berxwedanê di vê demê de xurt bûye. Berxwedana herî mezin bi pêşengiya qralên Êrtartûyan, proto-Kurd Hûriyan nîşan dane. Lê di vir de nuqtetek heye divê ez destnîşan bikim û ji cihê mayî ez ê paşê dewam bikim, ew jî ev e; koka etnîk a Êrtartûyan mijarek e ku li ser guftûgo tê kirin. Ev xusûs ji bo tevahiya xanedanên rêveberiyê welê ye. Xanedanên Êrtartûyan hemûyan ziman û çanda demê ya serwer esas girt. Jixwe li Êrtartûyê û hînê paşê li qesrên Persan jî zimanê fermî yê dewletê zimanê Asûrî û Aramî ye. Em ji cihê mayî dewam dikin. Me behsa berxwedana Hûriyan kiribû. Ji bo karibin xwe li vê cografya îro bigirin, rola vê berxwedanê gelek e. Jixwe bi hevgirtina Medên bi koka xwe Hûrî û Babîlan ev împaratoriya dêw û mezin di sala 612'an B.Z. de bi dawî bû û di nava rûpelên dîrokê de cihê xwe girt. Weke şaristaniya dawî ya bi koka xwe Sumer di dîrokê de ji bo belavbûna şaristaniyê û nexasim ji bo pêşdebirina bazirganî û mîmariyê bi kêrhatina xwe û rola xwe xwedî cihêkî cihêwaz e.

Em cara pêşî ji bilî Mezopotamya Jêr navendên şaristaniyên din dibînin. Hem di warê şikil û hem jî di warê naverok û cewher de veguherîn û pêşketin xuya dikin. Çi di pêkhatina şaristaniya Sumer de, çi jî di belavbûna wê de mirov Mezopotamya Navîn weke xelesa pêşî bibîne wê nebe destnîşankirineke şaş û çewt. Em der barê vê nîfşa bi koka xwe Hûrî de nemaze bi saya erdkolanên arkeolojîk, etîmolojî û etnolojiyê hînê zêdetir dibin xwedî agahî û zanîn. Hûrî jî ziman û çanda Aryen koma pêşî ya etnîk an jî gel e ku di çavkaniyên nivîskî de navê wê tê hildan û nasnameya wê diyar dibe. Otantîk in; angî ji serdema qeşayî ya dawî ve li sîstema Zagros-Torosan bicihbûyî ne. Di pêşdebirina cotkarî û heywan xwedîkirinê de xwediyê roleke sereke ne. Ya rastî, li deverê serê koma şoreşa cotkarî û gund a neolîtîkê pêşde bir, dikişîne. Nasnameya wan a etnîk ji salên 6000 B.Z. ve cihê û diyar dibe. Eger mirov Hûriyan weke proto-Kurd bi nav bike, destnîşankirineke li cih e. Şêwazê ziman, analîza etimolojîk a gelek peyvan û etnolojî têkiliya wan bi Kurdan re têra xwe eşkere rave dike. Bicihbûyîna li deştan, koçeriya li çiya û zozanan bi hev re û di nava hev de ye. Îhtîmaleke xurt e ku Sumer yek ji komên pêşî yên Hûriyan be. Jixwe paşê dema dagirkeriya Gotiyan salên 2150-2050 B.Z., dagirkeriya Kassîtan salên 1600 B.Z., tevî Hîtîtan salên 1596 dagirkeriya Babîlan a pêşî, gelekî paşê belavbûna li dij a Med û Persan vê rastiye piştrast dikin. Bi Sumeran re herî zêde nîfşa neolîtîk di nava têkiliyê de ye. Yê din jî Aramîtan bi koka xwe Semîtîk in.

Em dema bi sazîbûna neolîtîkê salên 6000-4000 B.Z. nehesibînin, em şopên şaristaniya pêşî ya bi koka xwe Hûrî serê salên 3000î B.Z. têra xwe dibînin. Ya rastî em li pêşketineke bê navber rast tîn. Nîfşên pêşî yên li Sumerê bi cih dibin zû gav diavêjin şaristaniyê, yên mayî jî ji ber sedemên avdaniyê û şertên hewayê yên demsalan, hêdî be jî dikarin wargehên xwe ber bi bajarbûnê ve bibin. Di erdkolanên arkeolojîk ên li beşên navîn ên tejaneya Dicle-Firatê de mînakên gelek bajaran hatine dîtin. Di nava sînorên Êrfayê de, li Kazaz, Tutrîş, Grevre, Zeytûniyê û herî dawî jî di erdkolanên li Gobeklîtepeyê de gelek wargehên li derve û hundirên wan kelhe û birc, avahiyên mîna perestgehan, figurên qîmeta wan a hunerî heye û gelek alavên bazirganiyê, çêbûna bajaran nîşan didin. Dîroka gelekî ji wan heta salên 3000-2750 B.Z. diçe. Ya rast ew e ku mirov bibêje; ev komên bajaran ji Sumeran serbixwe ne. Gelekî manedar e ku li deverên nêzî wan koloniyên cuda û bi koka xwe Sumerî hatine dîtin. Mirov ji van koloniyên fêhm dike ku car caran li dagirkeriyên Êrûk, Êr û Asûran rast hatine. Erdkolanên nû yên arkeolojîk, xebatên etîmolojîk û etnolojîk dikarin nîşan bidin ku navendên bajarên li tejaneya Dicle-Firat a Navîn her yekî navendeke mezin a şaristaniyê ne. Jixwe lêkolînên dawî yên zanistî jî îşaret bi vê yekê dikin. Nexasim berhemên li Gobeklîtepeyê hatine dîtin xwedî wê xisletê ne ku dikarin bibin sedema jinûve nivîsandina dîrokê.

Pêla şaristaniya bi koka xwe Hûrî ya nifşê duyemîn hînê berfireh dibe û gav diavêje şewazê rêveberiya siyasî ya dişibe împaratoriye. Nemaze Mîttaniyên ji Mezopotamya Navîn in, balê dikişînin. Bi qasî ku em fêhm dikin, ji salên 1600 B.Z. heta salên 1250 B.Z. yên mezinbûna împaratoriya Asûr împaratoriyeke bi hukim bûne. Paytexta wan li navbera sînore îro yê Mêrdîn û Sûrî, bajarê Serêkaniyê Amûdê ye. Navê xwe hê wê demê bi kurdî Xweşkanî ye. Ji kevalan em fêhm dikin ku zimanekî xwe yê cihê heye û bi koka xwe Hûrî ye. Ji Kerkûka îro (navê Kerkûkê ji wê demê maye) heta Til-Alal a nêzî Antakyayê karîbûye belav bibe. Em dizanin ku timî Asûr di kontrola xwe de girtine. Bi Hîtîtan re ku li navend Anatolyayê di heman demê de dewleta pêşî ava kirine, yan xizm in, yan jî di heman kokê tîn. Em vê yekê ji zimanê pê diaxivin fêhm dikin. Ji ber ku ew jî bi zimanê koma zimanên Aryen dipeyivin. Divê em bi bîr bixin ku Şûpîlûlûma yê Hîtîtî yê Heleb û Kargamêş fetih kir qîza xwe da prensê Mîttaniyan Matîzava û nameya ji wî re şandî jî belgeyeke girîng e. Ji hieroglîfên li qesrên Misrê tê fêhmkirin ka çiqasî bi hêz in. Ji bo vê jî mirov dikare Nefertîtiyê weke mînak destnîşan bike. Ji ber ku bi serê xwe çarsed salan karîbûn Asûran di bin kontrola xwe de bigirin, ev yek jî hêza wan nîşan û piştrast dike. Em dikarin heman xusûsê ji bo Babîlan jî bibêjin. Em dibînin ku nivîsa bizmarî û hieroglîfî bi kar anîne. Hin mîmariyên xweser ên Mîttaniyan û seyîsên hespan ên bi navê 'Kîkulî' ji şopên wan ên di dîrokê de hiştin e. Şaristaniya duyemîn a girîng a bi koka xwe Hûrî divê were rohnîkirin.

Gelekî li cih û rast e ku mirov Hîtîtiyan jî daxilî vî nifşî bike. Berevajî ku tê gotin, Hîtîtî ji wan koman nînin ku di derbendan re, ji Qefkasan û rojhilatê Îranê hatine. Ji ber ku di nava çanda wan de şopên hûr ên ziman û çanda Hûriyan hene, em weke encam dikarin wan mîna komeke rêveberên esilzade yên Hûriyan destnîşan bikin. Xwedayên wan, wêjeya wan, têkiliyên wan ên dîplomatîk û bermahiyên ji qesrên Misrê nîşan didin ku ew jî fena Mîttaniyên li Anatolya Navîn bin. Çawa ku Mîttaniyan navendên Asûr kirin kontrola xwe, Hîtîtan jî di heman demê de dawî li dema kolonî ya Asûrê anîn, di heman demê de împaratoriya Hîtîtan di salên 1600-1250 B.Z. de ava kirin û dewam kirin. Fena ku li du herêmên mezin ên navendî rêveberiyên Hûrî ava kiribin, lê hê jî em rastiya vê baş nizan in. Ne tenê di warê xizimî û ziman de, di her warê jiyane de bi giranî dişibin hevdu. Xeleka wendabûyî di navbera herdu herêman a Mîtanî û Hîtîtan de ye. Ez yeqîn dikim ku lêkolîn çiqas xurt bibin ev yek jî wê zelal bibe. Di serî de Hattûşaş a ji dema Hîtîtan mayî û navendên wê yên girîng, xuya ye ku di hin pêşketinên şaristaniyê de rol lîstine. Cih û warên wan ên pîroz ji Ziggûratan bihurî ne. Perestgehên dînî, qesrên rêveberan, cihê mayîna xebatkaran û kewarên wan gelekî ji hev cihê û diyar bûne. Bircên wan ên fireh hene. Gelek bajarên bi vî rengî li herêmê tene dîtin. Li gorî wê demê ji aliyê eskerî ve dewleta herî pêşketî ye.

Li rojava ji bajarê navdar Troya (Yan Hîtîtiyan damezrandiye, yan jî hevgirtiyên wan ên nêz in, di koma heman çandê de şaristaniyeke xweser e), Ahiyevayên pêşî (Mirov vê komê weke komeke ketiye bin bandora Anatolyayê yan jî komeke Aryen a di salên 1800î B.Z. de koç kiriye bihesibîne wê rastir be. Dema ku mirov bibêje bi koka xwe ji bakur, ji Ewrûpayê ne, ev berevajî berê herikîna belavbûna şaristaniyê ye. Heman çewtî di mijara Hîtîtiyan de jî tê kirin) bi koka xwe ji nîvgirava Yewnan, li bakurê Antalyayê Aşkavayî, li bakurê wan Kaşkayî (yên ji Derya Reş) û li Çûkûrovayê Kilîkyayî (Gelê li Torosê, di heman demê de li gorî demeke dirêj Lûwî ne), li başûr bi rikeberên xwe yên navdar bi dewleta Firewnên Misrê re cîrantiyê dikin û danûstendina wan heye. Gelê li devera navendî, Hattiyên xweser in. Welatê xwe weke 'welatê hezar xwedayan' bi nav dikin. Ev yek ji hevrikiya di nava xwedayan de zêdetir girîngiya bi dostaniyê didin nîşan dide ango hevgirtina begtî û mîregan îfade dike. Di dîrokê de peymanaya yekemîn a nivîskî piştî şerê li Qadeşê, nêzî Çemê Asî û Hamayê di navbera Firewnê Misrê Ramsesê duyemîn û qralê Hîtîtan Hattûşîlî yê sêyemîn de hat mohrkirin ku yek ji bîranînên girîng ên dîrokê ye. Wer tê fêhmkirin ku bi şiklekî xwediyê meclîseke arîstokratî a bi navê Pankûşê ne. Mirov dikare şîrove bike ku pêşiyên begê Hatûşaşê bi şiklekî federasyoneke beg û mîran ava kirine.

Me gelek caran qala şaristaniya Misrê ya li keviyên rojhilatê Nîlê kir. Herçiqas derketina wê serbixwe xuya bike jî mirov dikare bibêje ku şopên nîrxên çanda Aryen lê hene. Ango bi şiklekî din mînakeke Sumeran a dûr e. Dînamîkên hundir ên Nîlê û cîranên wê yên nêz ji bo şaristaniyeke nû çêkin li naverastê xuya nakin. Di vir de ya herî bi serê mirov bikeve ew e ku di encama koçberiyê de çanda Aryenî gihiştîye herêmê. Bêguman mezinahiya şaristaniya Misrê nayê guftûgokirin. Lê rastiyeke e ku ji keviyên Nîlê wêdetir jî nikarîbûye belav bibe. Pirseke hêja

ye, mirov bi pey bikeve ev e; çima ev şaristaniya evqasî mezin belav nebûye. Li keviyên Nîlê çandeke xweser a xwe bispêrê xuya nake. Mîna ku mucîzeyeke ji ezmên hatibe. Na, eger wisa nîne, divê em rastiya qebîleyên Hîksos û Îbraniyan li ber çav bigirin û neçar gelek caran bibêjin ku çavkaniya wê şoreşa neolîtîk a li sîstema Toros-Zagrosan e.

Nivîsa hiyeroglîfi ji nivîsa bizmarî paşvemayîtir e, û ji bo pêşketinê li cih nîne. Bikêrhatina wê bi sînor e. Dibe ku mîmariya pîramîdan şahane be. Lê yek ji wan dînîtiyan e ku têra xwe keda koleyan daqurtandiye. Wexta ku mirov dabeşî demên cihê bike, dema qraliyeta kevin salên navbera 3000-2500î B.Z. digire. Ji gelek xanedaniyan re şahidî kiriye. Li nêzî erdên bi aluviyon li keviya Qahîreya îro çêbûye. Bi qebrên mezin ên pîramîdan tê naskirin. Di navbera salên 2050-1850 B.Z. de dema Qraltiya Navîn e. Di vê demê de perestgeh hatine avakirin, ango di vê demê de giraniya rahiban xuya dike. Di salên 1800î B.Z. de dagirkeriya Hîksosan mirov difikirîne. Rejîma Firewnên ti qewman nikarîbû bi wan, Hîksosan hilweşand û ev yek hêza rêxistinî û çanda li pişt Hîksosan nîşan dide. Bi qasî sedûpêncî salî Misr bi rê ve birine. Di salên 1600î B.Z. de dema Qraliyeta Nû bi Setê Yekemîn hat avakirin. Mîna Asûran dema vê avabûnê li pêşketina bazirganiyê rast tê. Dîsa weke Asûran li Mezopotamya Jêr derketina wan, dema qraliyeta nû li herî başûrê Nîlê li Karnakê pêşxist. Dema qebriştanên cuda destpê kiriye. Tevî ku rahib bi hêz in jî êdî di dereceya duyemîn de ne.

Qebîleya Îbranî di vê demê de hatiye Misrê. Piştî Hîksosan salên 1600î tarîxeke li cih e. Tê texmînkirin ku piştî ku 300 salan dimînin dîsa di dawiya salên 1300î B.Z. de vedigerin. Qral Eknaton muhtemelen di salên 1400î B.Z. de cara pêşî dîne yek xwedayî îlan kir û bi vê yekê navdar e. Ji Hîtî û Mîtaniyan gelek keynikan weke bûk tîne qesrê. Mînakên qebrên wan nîşan didin ku bûne xwediyê mîmariyeye gelekî pêşketî. Di warê mîmariyê de ji Sumeran zêdetir bandor li şaristaniya Greko-Romen kirine. Şiklê wan ê dînî yê tevlîhev mîna kopiyeye Sumeran e. Rêûresma Îsîs-Orîsîs rêûresma İnanna-Enkî tîne bîra mirov. Rêûresma Amon-Ra jî nêzî sîstema Ziggûratên rahibên Sumeran e.

Ev pirs wê her tim were kirin: ji Misr û Sumerê kîjanê bandor li kîjanê kir? Di çêkirina kelekan de, di danîna stûnên bi kevir de, di çêkirina resmên li dîwaran de, di zanista salnameyê de, di bijîşkiyê de, di astrolojiyê de û di mûmyakirinê de gavên resen û orjîn ên Misrê hene. Eşkere, bi vê rê bandor li çanda Yewnan kiriye. Têkiliyên Misriyan bi Fenîkeyiyan re jî pêşketî bûn. Mîtanî û Hîtîtiyan jî li ser Sûrî û Filîstina îro xwe li hev rakişandibûn. B.Z. piştî salên 1000î ji başûr jî qewmên bi koka xwe Sûdan-Habeşî êrîşên xwe zêde kirin, di salên 670î B.Z. de jî bi êrîşên Asûran cara pêşî dikevin bin serweriya hêzeke derve. Li gorî rêzê di sala 525 B.Z. de Pers, di salên 333'an B.Z. de jî ketin bin rêveberî û dagirkeriya Skender. Ber bi Zayînê ve dema Kleopatraya bi koka xwe ji çanda Helen li hemberî Romayê têk çû qonaxa pêşî ya şaristaniya çar hezar salî bi dawî bû.

Ev şaristaniya ku herî kêr bi qasî Sumeran di dîrokê de gelek şop hiştine, sîstema koledariya klasîk bi halê xwe yê herî saf bihurandiye. Yekîtiya kole-efendî di ti şaristanyê de bi vî rengî pêş neketiye. Ji bo koleyên li vê dinyayê rûyê rehetiyê hîç nedîtî, hisên dînî yên axiretê roleke xurt a rewakirinê bi cih anîn. Paradîgmayên axretê, cennet û cehennemê li vê qada xurt a şaristanyê hatin vedîtin. Zewaca xuşk û birayan a Firewnan dibe ji rêûresma kevin a klanê hatibe yan jî ji hewcedariya bi mayîndetiya xanedanê jî pêk hatibe. Dînen Brahîmî bi îhtîmaleke mezin herî kêr bi qasî baweriyên dînî yên Sumer û Babîlan bandora xwe kirine. Hz. Mûsa ji çanda Misrê tê, pêşiyên wî Hz. Brahîm jî ji ber Nemrûtên Babîlan reviyaye, ev yek bandora xurt a herdu çandan û sentêza wan tîne hişê mirov. Mirov nikare dînen Brahîmî li derveyî bandora van herdu çandan bifikire. Bi halê xwe yê orjînal rejîma Firewnên Misrê sîstemeke herî nêzî 'kominîzma dewletê' ye.

Şaristaniya Êrtartûyan jî ji nîfşê yekemîn ê şaristaniyan e. Bi têkoşîna Naîriyan ku timî bi Asûran re di nava nakokiyê de bûn, tê texmînkirin ku di salên 870î B.Z. de piştî dema dirêj a konfederasyonê cara pêşî ber sîstema qraliyeta navendî ve gav avêtiye. Naîrî bi maneya xelkê çem e, û heye ku Kurdên otantîk ên li ber devê Çemê Dîcleyê û şaxên wê îfade dike. Di kîtabeyên bi zimanê Asûrî de Qral Sardûrî (heye ku Serdar be jî) pesnê xwe dide ku di bin çavdêriya Xwedayê Mezin Xaldî de (Diyar e, Guda, Gudea û Got ji navê heman xwedayî tên. Li cem Semîtîkan Ellah çî be, di çanda Aryen de jî Guda ew e. Tê maneya xwe bi xwe çêbûye. Di Kurdî û Farisî de hîne li şûna Ellah weke Xweda tê bi karanîn.) her kesê derdikeve pêşiyê têk dibe, û ev

yek mizgîniya meşa bi heybet dide ku wî ber bi qraliyeta navendî ve dibe. Wana îro weke navend hatiye hilibjartin. Ji ber ku ji qebîleya Wanîlîlî hatine navê Wanê maye. Navê din jî Tûşpa ye ku ji xwedayê rojê Teşûpa çêbûye. Li navendê gelek kelhe ava kirine. Ji qûntara çiyayên Zagrosê yên Rojhilatê Îranê heta keviyên Firatê yên rojava, li bakur ji geliyên Arasê heta herêmên Asûr ên li başûr û sînorê bakurê Sûrî serweriyeke navendî ya bi hêz ava kirin. Tê texmînkirin ku cara pêşî sîstema eyaletan ava kirine. Di dîrokê de ev rastî ji alî navendbûnê ve cara pêşî pêk hatiye. Sîstema wan a baweriyên pirr bi hêz di bin bandora Sumer û Asûran de ye. Nivîsa bizmarî bi kar anîne. Ji bilî zimanê Asûrî yê ji rêveberên Asûran girtine, zimanekî bi bermahiyên Hûriyan û ji qebîleyên ji Qefkasan koç dikin têkel zimanek pêk tê. Herçiqaş baş neyê zanîn jî sîstemeke ziman a nêzî Ermenîkî çêdibe û ev gelekî xwezayî ye. Gotina 'Li Babilê heftê û du ziman dihatin axaftin' têra xwe mirov difkirîne û rohnî dike.

Xusûsek heye ku dixwazim bi taybetî destnîşan bikim, ew jî ev e: zimanê qesrê her tim ji yên komên di bin destên wan de cuda bû. Hînê di sedsala derbasbûyî de li qesrên Ewropayê zimanên ti eleqeya xwe bi xelkê xwecîh ê herêmê re tinebûn dihatin axaftin. Mînak weke Elmanî û di demên berê de Latînî. Li Rojhilata Naverast zimanê Erebbî demeke dirêj weke zimanê qesrê îtîbar û rûmetek xwe hebû. Zimanê Osmanî hema bibêjin bi qasî zimanekî biyanî ji Tirkî dûr e. Ingilîziya îro zimanê fermî yê bi dehan welatan e ku ti têkiliya xwe ya neteweyî, etnikî û qewmî bi Ingilîzan re nînin. Li navenda qraliyeta Ûrtartû jî diyar e, heman pîvan û rêzik hene. Ji ber ku berê Asûrî dihat axaftin, mirov dikare vê rastiyê bibîne. Şaristaniya herî bi hêz a serdema hesin dihat hesibandin. Gelek sîleh, firaq, beroş û alavên ji têkeliya hesin û sifir heta roja me ya îro mane. Şaristaniya pêşî ye ku herî zêde hesin bi kar aniye. Têgihîştina bajêr, navend û eyaletan lê pêşketiye. Tevna rêyan, îşareta bi Rêya Qral dike. Hînê jî mirov dikare cihên ev rê tere derbas dibin ji hev derxîne. Qebrên qralan ên di zinaran de hatine çêkirin muhteşem in. Ji her gelê cîran karîbûne koleyan bidin hev, di avahkirina bajar û kelheyên de bixebitînin. Di çêkirina cihokên avê û golan de pêşketîne. Hêza bi tenê ye ku karîbû li hemberî Asûran li ser piyan bimîne. Bi qasî sê sed salan bi hev re şer kirin, lê vê yekê di heman demê de û ji aliyê heman hêzan ve di sala 615'an B.Z. de dawiya herduyan anî. Dîrokê li ser heman cografyayê li pêkhatineke siyasî ya bi heman rengî careke din şahidî nekir.

Împaratoriya Med-Pers di nava nîfşê pêşî de ya herî dawî ye bi heybet derketiye. Medan şert û mercên pêngava destpêkê çêkirine. Gotina Med jî zêdetir ji çanda Yewnan maye. Dîroknas hemfikir in ku Med ji şaxekî xurt ê Aryen tê. Ji ber ku devera wê nebûye wargehê komeke din a etnik, mirov dikare bibêje Med û Medya xwediyê çandê otantik in. Jixwe gotinên Med û Medyayê hînê jî ji bo heman deverê tene bikaranîn. Mirov dibîne ku di rêzeçiyayên Zagrosê de bi cih bûne. Mirov dikare koka wan bibe heta Gotî û Kassîtan. Dîsa fikreke hevpar e ku di çarçoyeya binavkirina giştî ya Hûriyan de ne. Mirov dikare bibêje ku ji wan eşîran in, herî zêde bi Asûran re şer kirine û eşîşandine. Dewletbûna wan jî ji nêz ve têkildarî vê berxwedanê ye. Sirra serketinê di konfederasyona eşîran de dibînin.

Di salên 715'an B.Z. de qebîleyên cara pêşî tene cem hev yekîtiyeke sist çêdikin. Wer tê fêhmkirin ku êrîş û zextên Asûr û Ûrtartûyan kirine ku bi qebîleyên Skîtan ên ji Qefkasan (herhal rêûresmeke dîrokî ye) hatine, bikevin nava tifaq û nakokiyê. Pêşengî car caran dest diguhere. Piştî berxwedaneke bi qasî sê sed salan ajot Medan qesrên Ûrtartûyan li derdora salên 615 B.Z., û hema paşê jî paytexta Asûrê hilweşandin û bi vî awayî dawî li du şaristaniyên mezin ên Mezopotamyayê anîn. Li nêzî Hemedana îro ya Îranê Medan paytexteke bi navê Ekbatanê ava kir û tê gotin dora wê bi bircên heftrengî girtine. Li rojava sînorê firehkirine gîhandine heta Çemê Sor. Bi Frîgyayîyan re bûne cîran. Serweriya wan demeke kin ajot, di vê yekê de para têkiliyên qebîleyên xizmên nêz ên Persan heye. Bi xebat û hewldaneke mezin pêkhatineke siyasî ya li derdora sê sed salî ava kirin û dewam kirin, bi dekulolabeke di nava qesrê de pirr bi lez û di demeke kin de dan destê Xanedaniya Axemenî ya Fars. Persekî bi navê Kîros ê ji qîzên wan çêbûyî, bi fermanê eskerî yê qesrê Harpagos re li hev kir û bi darbeyeke eşkere ya di nava qesrê de pîremêrê Keya Astiyag ji text xist. Li hemberî vê bêbextiya rezîlane em ji Dîroka Herodot hîn dibin ku Keya Astiyag weha gotiye: 'Rezîlo! Te ez ji text xistim, min ew fêhm kir, lê çima te desthilatdarî da destê bêjiyekî Pers? Qet nebûya tu li desthilatdariyê bimana. Te çima serwerî da destê Persan? Qet nebûya bila di destê Medan de bimana!' Bi rastî, eger Herodot ev ji xwe re li hev çênekiribe; jixwe em neçar in pê bawer bibin, ji ber ku ew dîroknasekî pêşî ye, pirr

digere û zana ye; ev rewş hebûna xisteleteke gelekî rezîl a hevkarîya bi dijminan re ya Kurdan a berî hezarê salan nîşan dide.

Ez yeqîn dikim ku di dîrokê de hevkarê Kurd ê pêşî Enkîdo ye. Qralê Ûrûkê Gilgamêş wî ji daristanê tîne û ji bo dagirkirina deverên daristanî wî weke ajan-hevkarekî bi kar tîne. Di wan deman de deverên daristanî zêdetir wargehên proto-Kurdan in. Ango dîroka hevkarîyê bi qasî ku bibe dabaşa destanan kevn e. Weke gelek caran bûyî dîsa ev hevkarî bi destê jinekê pêk hatiye! Enkîdo hevalên xwe û hewayê çiyê ya azad kiriye qurbanê şîrînî û şehweta xapînok a rahîbeyeke perestgehê. Çiqasî dişibe rojên me yên îro. Bi sedan Harpagos ji nava Teverga Azadiya Gelê Kurd û PKKê derketin. Divê mirov baş zanibe, şexsiyeta îro ya Kurd a hevkar di dîrokê de çêbûye; ji bo jina xwe û malbata wî ya pênc peran nake ti nîrx û buhayê nefiroşe tine; ji ber vê yekê jî ji jiyaneke bi esalet, polîtîk, zanyarî, bi zewq (bi jiyana azad dibe) û manedar dûr e, ji lewra gelekî bi awayekî rezîl dijî.

Yewnanî (ez qala Yewnaniyên berê dikim, behsa van sosretên modern nakim), nemaze Herodot beşekî mezin ê dîroka xwe ji Medan re vediqetîne. Ez texmîn dikim ku yên ji çanda Hûriyan hatine hemûyan weke Medan bi nav dike. Ji meznahiya Medan re bi rêz û hurmet e. Persan di rêza duyemîn de dihesibîne. Wexta dibêje; li deverê çanda Medan serdest e, û ev çand ji Medan tê, mîna ku rastî dîtibe. Pers di wê demê de nû derketine ser dika dîrokê, bê nav in, û komeke çanda wan hejar e. Heybeta çanda Hûriyan ji peravên Egeyê heta Elamê, ji sînorên Qefkasan heta qesrên Misrê holan dide. Herodot jî bi awayekî mafdar vê rastiyê di dîroka xwe de rave dike.

Bi giştî di damezrandina pêşî ya tevahiya şaristaniyan de û di şaristaniya Sumeran de rola rahibên pêşî di avakirina xwedê û zêhnîyeta nû de çî be, li heman deverê ji bo şaristaniya berê hatibû avakirin a Ûrartûyan û ji bo ya Med-Pers jî heman tişt e. Şaristaniya em behsa wê dikin ji aliyê rahibên bi navê Mag ên pêşengtiya Zerdeştî ne, hat damezrandin. Mag heye ku navek be an jî figureke sembolîk be. Bajarê wan ê pîroz li herêma Bradost a îro Muşasîr bû. Em dikarin şîrove bikin ku panteona xwedayên pêşî li wir hatiye avakirin û paşê ji wir derbasî Tûşpa û Ekbatanê, ji wir jî barkiriyê Persepolisê. Ji ber ku eger rêûresmeke dîrûdirêj a rahiban nebe, avakirina şaristaniyên ciddî zehmet e. Di çanda Yewnan de felsefe û filozofan, di şaristaniya Ewrûpayê de jî di dema Rohnîbûnê de rewşenbîr bi heman rolê rabûn. Li cem Semîtîkan şêxan û li cem Îbraniyan jî mirov pêxemberan di heman kategoriyê de bibîne wê hê bêtir zêhnê mirov veke û rê nîşan bide.

Zerdeşt û rahibên Mag di derketina Medan de rola wan girîng e. Lewma divê mirov rola wan a di vê pêvajoyê de baş zanibe. Ez yeqîn dikim ku damezrînerê vê baweriyê Zerdeşt û rahibên wî bi bawerî û exlaqê xwe bi qirêja şaristaniyê nelewitîbûn. Tê şîrovekirin ku bi pîrozkirina heywan, cotkarî û agir bawerîya Zerdeştî nîrxên civaka neolîtîk di nava xwe de dihewîne. Zerdeştî jî vedîtina rahibên Sumer ê qral-xwedayên bi maske cuda ye. Hetta mirov dikare bibêje; berevajiyê wê ye. Li gorî vê baweriyê gerdûn bi qencî-xirabî, tarîfî-ronahiyê tijî ye. Di vê çarçoveyê de xwediyê têgihîştineke diyalektîk e. Rahibîtiya Zerdeşt bi hewayê pak û azad a çiyê (di çanda Yewnan de jî çanda Xweda Dionysos e) bi tevahî bi şaristaniyê nebûye, destûra wê ya bingehîn exlaqê azad e. Ji çêkirina xwedê zêdetir, behsa pîrozbûna cotkarî û heywanan, û karektera mirovê azad dike. Di têkçûna Asûran û mezinbûna Med-Persan de roleke diyarker a vî exlaqî heye. Eger xwesteka wan a ji bo jiyana azad nebûya wê weke gelên din bi hêsayî êsîr biketana. Wexta ez dibêjim gelên din, ez behsa yên ketine bin bandora civaka şareza dikim.

Piştî mirina Kîros (di demên 559-529 B.Z. de), bi darbeyeke rahibên Medan a di sala 528'ê B.Z. de komeke bi eslê xwe Medî ya serwerî xistibû destê xwe bi hêsayî hat tesfîyekirin û bi vî awayî dema Darfûsê navdar (586-521 B.Z.) dest pê kir. Di nava demeke kin de piştî ku Babil, Misr û bajarên Îon ên li peravên Egeyê şikestin, ji peravên Egeyê heta keviyên Pêncavê di dîrokê de Împaratoriya herî mezin hat avakirin. Ji bilî Çînê mirov dikare bêje dinya şareza hemû di bin destê wan de bû. Bêguman ji çanda şaristaniyê ya Sumer, Asûr û Ûrartû gelek tişt girtibûn. Her weha xwe bi damara çanda azad a Aryen xwedî kiribû. Her weha ji çanda Skîtên navdar ên ji bakur hatibûn û hîne jî li rojhilat ji proto-Tirkan bi tesîr bûbûn û bi wan re di nava tîkiliyê de bûn. Bi vî awayî gelek çand di nava xwe de sentez dikirin û mîna keke xweser di dîrokê de nîşan dida.

Împaratoriya Med-Persan nûnerê dawî yê nifşê yekemîn e ku herî zêde mezin bû. Lê bi rastî Med hem di rêza duyemîn de bûn, hem jî di nava artêşê de hêzên bingehîn bûn. Di vê yekê de têtikiliyên xizmtiyê bi tesîr bûn. Împaratoriya Med-Persan di nava çanda şaristaniya nifşên yekemîn de bi qasî ku karibin sînore xwe heta dawiyê firehkirin û gihiştin asta şaristaniyê. Îhtîşama wê ya li navendê (bermahiyên Persepolîsê hînê jî gelekî bi heybet in), hêza navendên eyaletan weke şiklekî pêşî ê împaratoriya Romayê xuya dike. Bandoreke mezin e ku dinya Greko-Romen amade kir. Di dîrokê de piştî Ûrartûyan cara pêşî wan sîstema eyaletan danî. Hem bi sîstema xwe ya siyasî, hem jî bi rêyên xwe yê mezin ên çûnûhatinê û posteyê navdar e. Di dîrokê de rêya herî dirêj a tê zanîn Rêya Qral e: ji peravên Egeyê ji Sardê dest pê dike û li Persepolîsê diqede. Yekîneya muhafizên taybet û alaya nemiran navdar e. Artêşa wê xwe gihandiye hêzeke bi sed hezaran were îfadekirin. Di mîmariyê de pêş ketiye. Di baweriyên dînî û rîtuelan de karîbûye bibe xwediyê cihêwaziyên. Dîne esilzadeyan û dîne gel Mîtraîzm ji hev cihê bûne. Bi rêûresma qebîleyan rê li arîstokrasiyeke pêşketî hatiye vekirin. Qadên şaristaniyê ji yê beriya xwe hemûyan zêdetir pêşde birine. Cara pêşî ye karîbûn bi awayekî hosteyane gelek qebîle, eşîr, dîn, mezheb, ziman û çandan li bin banekî bînin cem hev. Li rojhilat şaristaniya dawî ya serdema destpêkê ye ku bi heybet e, û wer bala mirov dikişîne û rohnîya wê li çavên mirov dixwe, çavên mirov li ber dikuskusin. Li gorî şaristaniya Yewnan a klasîk ku nû pêş dikeve, ji her alî ve xwedî cihêkî welê ye ku dana ber hev û qiyasê qebûl nake. Şagirtê Arîsto Skender, ya rastî li hemberî çanda Rojhilat bi kompleksê diperte û ji bo bibe xwediyê vê heybet û hebûnê natebite û ji bo vî welatê cîran di rola dagirkerekî hov de ye. Li hemberî Gotan împaratoriya Roma çî be, ji bo bê karên Yewnan û Makedonî, reîsên qebîle û qralokan jî împaratoriya Persan heman tişt e. Ji sedî sed ji aliyê dewlemendî, meznahî û heybetê ve ji Romayê kêm nîne. Eger em ji vî alî ve li dagirkeriya Skender binêrin, em ê dîrokê hînê rast û manedar şîrove bikin.

Em çend tiştên din li mijara pîrsgirêkên qonax û belavbûna dema yekemîn a civaka şareza zêde bikin, em ê vê mijarê bi dawî bikin. Yek ji van pîrsgirêkan jî ew e ka divê mirov di pêşketina civaka şareza de cihêkî çawa bide qebîleya Îbraniyan. Gotina pêşî ya em bibêjin ev e; xisleteke Îbraniyan heye ku di navbera çand û zimanê Semîtik û çand û zimanê Aryen de, dîsa di navbera şaristaniya bi koka xwe Sumer û şaristaniya bi koka xwe Misrê de ji salên 1700î B.Z. ve heta roja me ya îro timî çûne û hatine. Di Pirtûka wan a Pîroz de navê Serûç, Ûrfa û Harranê bi xwe tene hildan. Weke warên pêşiyên Brahmî qala van deran tê kirin. Ji wir jî heta bi Misrê bi ihtîmaleke mezin li pey keriyên xwe çûne, wer xuya ye hinekî jî bi bazirganiyê re mijûl bûne. Bawerîya wan di navbera Yahveh û ELLAH de diçe û tê. Ji bo di nava civaka şareza de nehelin li ber xwe didin. Têtikiliya vê berxwedana wan bi bawerîya wan a xwedê ya xweser heye. Xwediyê wê cihêwaziyê ne ku xwedayê qebîletiyê gelekî pêş xistine. Jiyana wan a bi dijberîya bi Brahmî li dijî Nemrût (qralên Babîlê) dest pê kir bi dijberîya Mûsa a li dijî Firewnan (qralên Misrê) dewam kir. Ji ber vê yekê li Filistinê têtikiliya wan a bi gelek xwedayên xwezayî û qebîleyan dewam kir. Di Pirtûka Pîroz de di vî warî de gelek çîrokên balkêş hene. Demeke dirêj bi pêşengîya rahibên bi koka xwe digihîjin Harûn birayê Mûsa (eger em bişîbînin Sumeran weke qralokên pêşî yê rahiban e) xweserîya xwe dewam dikin.

Piştî dema rahibên pêşî yê bi Mûsa dest pê kir (di dawîya salên 1300î B.Z. de) û bi rahibê bi nave Samuel bi dawî bû, dema qraliya aliyê xwe yê polîtîk û eskerî xurt dest pê dike. Ev pêvajoya qralan ji salên 1020î B.Z. de bi Saul, Dawid, Silêman û yê din dewam dike. Li şûna qralên destpêkê yê xurt ên hejar û qels cih digirin. Qraliyeteke piçûk çêdikin. Di navbera qral û rahiban de timî nakokî hene. Bi sê çar partiyên bi hêzên derve girêdayî timî dijîn. Beşê wan ê hevkar û têtikilî di salên 720î B.Z. de bi berxwedana xwe ya li dijî Asûran têtikilî diçin. Di sala 540î B.Z. de nefîkirina wan destpê dike. Piştî ku Persan dawî li serweriya Babîlan anî ew jî rizgar dibin. Ev rewş jî dişibe rewşa Cihûyên li Berlînê ku kengî artêşa Sovyetê ketibû Berlînê Cihûyên li wir sax mabûn rizgar bûbûn. Jixwe gelek çîrokên wan ên bi vî rengî hene. Di xwe li hevrakişandina Pers-Grekan de dîsa du partiyên hevkar çêdibin: Sadûkî û Ferisî. Paşê berxwedana li hemberî Romayê, nefîkirina yekemîn û duyemîn (B.Z. û P.Z. salên 70î) destpê dikin; pêşî Misr û Anatolya, paşê li gorî rêzê li tevahiya deverên şaristaniyan belav dibin. Pers, Grek û di dorê de Roma heye.

Xilaskar û têtikilî Îsa derdikeve. Wî li çarmîxê dixin. Ji bo proleterên Romayê destpêka efsaneyekê ye, û dibe destpêka derketina dîne duyemîn ê Brahmî. Serhatiya bi bela ya qebîleya piçûk a Îbraniyan bi şaristaniya Greko-Romen û Ewrûpayê re dewam bike. Ji beşekî mezin ê

pêşengên xwe re gotinên nebî û rabbî bi maneya qasidê xwedê û efendî bi kar tînin. Bi vî awayî şecereyeke dirêj a pêxemberan didin destpêkirin. Îsa û Muhammed dibin pêxemberên dawî. Lê Mûsevî van pêxemberan qebûl nakin. Nakokiyên dînî bi pevçûnên siyasî dewam dikin. Dema nivîskarên bêhtir piştî serweriya Romayê dest pê dike. Heta roja me ya îro herî kêr bi qasî nîfşên pêxemberan rêûresmeke xurt a nîfşê nivîskar-rewşenbîran jî dewam dike. Gava berê ya piçûk a bazirganiyê, her çû di derketina kapîtalîzmê û serweriya finans-kapîtal a roja me ya îro de rola sereke list û dilîze. Hejmara wan kêr e, lê bi qasî împaratoriyan bandora wan li ser dîroka şaristaniyê ya dinyayê heye. Mijara qebîleya Îbraniyan divê herî kêr bi qasî şaristaniyan bi nazenînê hûr bê kolan. Mîna ku di mijarên zanist, qanûn û pereyan de împarator bin. Heman rola wan bi qasî di dîrokê de îro jî bi aliyên xwe yê balkêş hemûyan dewam dike. Çîroka min a şexsî jî hinekî dişibe ya vê qebîleyê. Ez jî mîna Brahmî ji Serûç a Ûrfayê derketim. Têkoşerîya me mîna Îsa bi alîkariya qralên sîstemê di çarmîxeke cuda de dewam dike. Qralên sîstemê ji bo Îsa qral Yehûda bû, ji bo min jî hevkarîya MOSSAD-DYE ye.

Pirsgirêkeke din jî êrîşên ji bakur ên Skîtan e. Van êrîşên ku di salên 800î B.Z. de xwe nîşan dan, ji qebîleyên bi koka xwe Qafqasî hatin. Ev qebîleyên ku ji nava Ewrûpayê heta hundirê Asyayê, ji destên başûrê Rûsyayê heta Mezopotamyayê li her deverê belav bûn, ji ber ku ji çandê zêdetir bi hêza xwe radibûn li dawîya xwe zêde şop nehiştin. Lê belê weke qebîleya Îbraniyan di damezrandin û hilweşandina gelek împaratoriyan de rola wan heye. Mirov fêhm dike ku weke eskerên xizmetê dikin û jinên qesran rol listine. Ev rol heta împaratoriya Osmanî û heta Komara Tirkîyê jî dewam dike. Lê diyar e bi qasî Îbraniyan nikarîbûne xwe biparêzin. Weke regekî nijadî tehm û regekî didin çandan û dikarin rê li xweşîkbûnê vekin. Dibe ku helwesteke wan a egîdane jî hebe. Di civaka şaristaniya nîfşê yekemîn de yek ji mijara divê baş were hûrkolan mijara Skîtan û yê weke wan in.

Di pêkhatina sîstemên dîrokî de mirov dikare têgîna navend-hawîrdorê weke feraziyeyekê bi kar bîne. Wexta mijar navenda şaristaniyan be, pîrsa li hawîrdorê çî diqewime girîng dibe. Di dîrokê de wexta cara pêşî navendên şaristaniya Sumer, Misr û Çînê çêbûn, ji bo Sumer û Misriyan hêzên hawîrdorê qebîleyên Semîtîk Aramî û Apîrû bûn; ji bo Çîniyan jî proto-Tirk Hûn bûn; ji bo Romayîyan jî Got bûn. Ev eşîrên ji qonaxa barbariyê bihurîne, kengî serekên wan hîn bûn sîlehên şaristaniyê bi kar bînin û bi dest bixin, timî şerekî mîna yê gerîlla yê 'êrîş bike û xwe biparêze' meşandine. Çarenûsa wan ew e ku yan di nava şaristaniyên serdest de bihelin, yan jî şaristaniyeke bi heman rengî li hawîrdorê ava bikin. Mînak Amorîtan hingî êrîş birin ser Aqadan ew jî bûn xanedan û dewlet ava kirin. Îbranî jî bi awayê ji Misriyan hîn bûbûn qraliyeta xwe ya serbixwe ava kirin. Yek ji tevgera herî bi hêz a hawîrdorê ku dîrokê nas kir, Hûn bûn, lê hem li Çînê, hem li Ewrûpayê û heta li Îranê nikarîbûn xwe ji helandinê xilas bikin. Serekên wan ên qebîleyan bi giştî li navenda çanda şaristaniyan weke şefên rêveber man û heliyan, ezbetên qebîlê yê xizan jî demeke dirêj marjînal jiyan yan jî heman pozîsyon bi serekên nû yê dîtin ceribandin. Gotan timî êrîş birin ser Romayê û bi vî awayî hîmên mîrtiyên Elman danîn. Carnan jî taca Romayê dan serê xwe. Di dîrokê de mînakeke manedar heye; serekên qebîleyên Moxol û Oxûz ên di nava damezrînerên pêşî yê xanedanên Osmanîyan de cih girtin bi çavên şaristaniya Bîzansê bi tevahî hêzeke hawîrdorê bûn, lê di têkoşîna sedan salan a navend û hawîrdorê de navend bi destxistin û ew êdî hêzeke hawîrdorê nebûn.

Skîtî jî nemaze ji bo navendên şaristaniyê yê nîfşa yekemîn, bi giştî weke hêza bakur û bi taybetî û giranî jî weke hêza Qefkasan a hawîrdorê rol listine. Kengî şaristanî nas kirin û bi sîlehên wan xwe bi sîleh kirin bûn hêzeke dijwar a êrîşê. Tê texmînkirin ku di navbera salên 800-500 B.Z. de gelekî çalak bûne. Tevî ku weke eskerên bi peran û weke xizmetkarên qesrê gelekî rol listine jî nikarîbûne ji bo xwe navendên şaristaniyê yê girîng damezrînin, û piraniya wan di dawiyê de nikarîbûne xwe ji helandinê xilas bikin.

2- Şaristaniyên Greko-Romen

Em wexta belavbûna şaristaniya bi koka xwe Misr û Sumerê bi hev re lêbikolin divê kes loma neke. Herdu jî şaristaniyên kok têne pejirandin. Di dîroka mirovatiyê de cara pêşî bi awayekî bandorê li hev bikin derketine û pêşketine. Di dema belavbûnê de jî ji nêz ve bandorê li hev dikin. Sedema yekîtiya wan ew e ku herdu jî weke kok ji Rojhilata Naverast in. Ji ber xisletên karakterîstîk ên herêmê hînê ji dema derketinê di zikhev de mezin dibin. Me dît herdu jî di

vedîtinên pêşî de xwedî rol in. Kes nikare înkâr bike ku belavbûnên piştî herdu şaristaniyan bi şêwe û naverokên wan pêk nehatine. Bi tevahî yek bi yek wekhev nebin jî di warê kokê de yek in. Bêyî Sumer û Misrê em nikarin ti şaristaniyeke din têra xwe analîz bikin, em bikin jî wê kêmbimîne. Weke ku di şaristaniya kapîtalîzmê de, modela şaristaniya koledar a pêşî ya esas li cem Sumeran e, û di rêza duyemîn de çawa di mînaka Misrê de tê dîtin bi guhertinên gelekî hindik dubare û belav dibe. Ka çi hikmet e, civaknas û dîroknas bêyî vê têkiliya nazik deynin şîroveyên xwe her dubare dikin. Em jî ji bo van têgihîştinên klîşe hilweşînin bi îsrar vê nuqteyê destnîşan dikin.

Di belavbûna vê modela pêşî de zehmetiyên em bi wan re rûbirû dibin me anîn ziman. Ya yekemîn ew e ku asta bandora Sumer û Misrê li hev kiriye. Ev mijarek e ku divê were rohnîkirin. Ya duyemîn, şaristaniya Med-Persan e ku şaristaniyek e, cara pêşî li derveyî Mezopotamyayê ava bûye, û gelo divê em wê weke şaristaniyeke cihê ya bi kok bihesibînin an na. Tê zanîn ku gelek kategoriyên xwe yên bingeşî ji Sumeran û dewamên wê Babîl, Asûr û Ûrartûyan girtine. Lê bi dîrokê sabit e ku reformên mezin kirine. Şoreşa exlaqî ya Zerdeştî ku nêzî exlaqê azadiyê ye, sîstema navend-eyaletan, û nîzama wan a artêşê ji wan reforman ên sereke ne. Lewma em neçar man weke xelegeke cuda û girîng di navbera şaristaniya Greko-Romen û şaristaniya Misr-Sumerê de şîrove bikin. Bi têgihîştineke rast a dîrokî, ev cudatî û girîngî di çareserkerina meseleyên qonaxên şaristaniyan de roleke kilit dilîzin. Naxwe em nikarin şaristaniya Greko-Romen rast analîz bikin yan jî em ê bi xisletên mûcîzevî îfade bikin û bi şîroveyên nezanistî em ê mijarê tevlihevî bikin.

Ya sêyemîn, pirsên der barê koka şaristaniya Çîn û Hindistanê de ne. Me destnîşan kir ku divê xweseriya van şaristaniyan bi pareke îhtiyatî li ber çav were girtin. Nêzîkbûneke bi vî rengî wê firsendê bide me ji bo em karibin cudatî û wekhevîyên di navbera şaristaniyan de rast şîrove bikin.

Şaristaniyên Başûrê Emerîkayê weke ku têne gotin xweser bin, dîsa şaristaniyên Harappa û Mohanjadaro jî xweser bin, şîroveya herî rast ew e ku mirov bibêje; hîne qonaxa bajarên pêşî yanî şeweyê Ûrûkê nebihurandine û vemirîne. Divê em bînin ziman ku li Efrîka, Ewrûpa (Greko-Romen ne tede) û heta Awûstûralyayê di gelek belavbûnên piştî de şaristanî pêş ketiye, Emerîka jî di navê de weke esas li ser hîmê kapîtalîzmê bûye xwedî şaristanî, şaristaniya Îslamî jî berê û di vê qonaxê de jî di şaristaniya van herêman de rol lîstîye. Bi vê kurtepêşekê em niha dikarin şaristaniya Greko-Romen rast bi nav bikin û belavbûna wê baştir şîrove bikin.

Bêguman şaristaniya Greko-Romen ji mînaka Med-Persê gelekî li pêş xwedî xweseriyekê ye. Lê mirov belavbûna berfireh a şaristaniyên piştî Sumer û Misrê yên Asûr, Mîtanî, Hîtî, Ûrartû û Med-Persan li ber çavan negire û xisletên wan ên karakterîstîk nehesibîne, û îddîa bike ku vê xweseriyê hema di nava şertên nîvgiravê de zîl daye û derketiye, ev yekê ji korfêhmîyeke dîrokî û berevajîkirinê bêhtir tiştê nebe. Vedîtinên di destê me de hemû, kategoriyên zêhnîyetê, pêşketinên dîmî, exlaqî, felsefî, hunerî, polîtîk, aborî û zanistî tev di pêvajoyên derketin, pêşketin, şer û nakokiyên şaristaniyên navbihurî de pêk hatine. Ji pêvajoya bi sazîbûna civaka neolîtîk ji wan re mîrateyêke mezin maye. Me hewl da em çîroka wê bibêjin. Nemaze jî desteserkerin, dizî, piştperdekirin û hewldanên vedîtinê rewakirinê ya beşê rêveberan me piştguh nekir û em ji nedîtî ve nehatin.

Rohnîbûn û zanista Ewrûpayê demeke dirêj mîna ku haya wê ji vê rastiyê nebe xwe nîşan da. Kokên xwe gihandin Ronansa xwe dispêre çanda Yewnan û Romayê, lê bi îsrar anî ziman ku pîrraniya vedîtanê wê ne. Ji lewra jî ji binavkirina şaş a şaristaniya Greko-Romen jî berpîrsiyar e.

Dîroka Herodot bi tenê jî were xwendin, zehmet nîne ku mirov bi giranî çavkaniya çanda Yewnan keşif bike. Bi tevahî belgeyên dîrokî yên di dest de hene nîşan didin ku ji salên 5000î B.Z. ve çand û zimanê Hind-Ewrûpî (Aryen) ketiye nîvgirava Grek û şoreşa neolîtîkê pêk hatiye. Ji bo xwendineke rast a dîrokê girîng e mirov çavkaniya wê qonaxê ji nedîtî ve neyê. Em dikarin şîrove bikin ku ji salên 1800î B.Z. pêlên koçberiyê yên nû vedîtinên şaristaniyê bi xwe re belavkirine. Cara pêşî di salên 1400î B.Z. de bajarên mîna yên Ûrûkê ava dikin. Ev qonax û pêvajoyê ji sê aliyên ve destekê û modelê digire. Bi giranî ketiye bin bandora Hîtîyan. Hîtî van herêman bi navê Ahîyeva bi belge dikin. Di ser Troyayê re ji salên 3000î B.Z. bi herêmê re çûnûhatineke bazirganiyê dest pê dike. Troya ji bo nîvgiravê di wê demê de (B.Z. 3000-1200) xwedî rola

bajarekî gelekî girîng dilîze. Ji lewra yek ji hedefên wan ê sereke ye. Hîtîtî hem ji aliyê îdeolojîk ango xweda, wêje û zanistê ve, hem jî ji aliyê materyal ve ango bi tevahî alavên bazirganiyê yên weke dîzik, berhemên tevnê û tiştên madenî, têra xwe pêşkêşî bazarê dikin. Di barkirin û destguhertina şaristaniyê de bi roleke girîng radibin. Fenîkeyî nexasim hunerê deryayê û alfabeza Fenîkî hîn dikin. Li gorî modela Rojhilata Naverast bajarên bazirganiyê ava dikin. Ji sedî sed pêşengiyê dikin. Misrî hem yekser hem jî di çarçoveya koloniyên de (şaristaniya bi tenê ya xweser a Misrê bandor lê kiriye) bi rêya şaristaniya Girîtan bandorê dikin. Her cure vedîtînen şaristaniya Rojhilata Naverast bi van çar rêyan ji salên 2000î heta 600î B.Z. timî şaristaniya Greko-Romen xwedî dikin. Herî dawî Solon, Pîsagor û Thales di sedsalên 7. û 6. B.Z. de li nava nîzam, dibistan û qesrên Misr, Babîl û Med-Persan digerin, pergala pîvan û dersên wan hîn dibin û vedigerin nîvgiravê.

Piştî ku Troya di salên 1200î B.Z. de ket, peravên Rojavayê Egeyê ji aliyê qebîleyên Îon, Aîol û Dor ên ji nîvgiravê hatin, hat dagirkirin. Em hatina van qebîleyan dikarin bi salên 1000î yên B.Z. bidin destpêkirin. Misrî xwediyên van êrîşan weke qewmên deryayê bi nav dikin û ev êrîşên pêşî bi ketina Troyayê ve têkildar in, û heta Rojhilatê Derya Reş û Misrê diçin. Ev komên giravên Egeyê tijî dikin ji bo şaristaniyên Troya û Hîtîtan weke 'barbaran' e. Qada wan a şaristaniyê welatê Hîtîtan û qraliyeta piçûk a Troyayê ye. Barbar kengî demeke dirêj di nava çanda xwecihî ya şareza de bimînin dikarin şareza bibin. Jixwe wisa jî dibe û piştî demeke dirêj çî li nîvgiravê û çî jî li girava Egeyê û peravên wê ji salên 700î B.Z. dest bi bajarvaniyê dikin. Homeros behsa qehremaniyên şer ên ji vê dema dirêj a bi cihbûnê dike, nemaze bûyerên li dora Troyayê diqewimin dike destan. Odyseia jî çîrokên bi cihbûna giravê ne. Rast e, bajarvaniya li peravên Egeyê heta astekê xwedî xisletên orjînal e. Mîrateya pirrçand a hemta û dewlemend, erdên ji aliyê nebat û heywanan têrûtijî, hêz û îmkân da wan ku vê sentêza bêhemkûf di nasnameya avakirina bajarên de nîşan bidin. Di warê veguherandina faktorên hem îdeolojîk û hem jî maddî yên Rojhilata Naverast de, hinekî jî bi cewherên nû û bi veguherîneke girîng a şikil afirneriya xwe ya mezin di warê sentêzkirinê de nîşan didin. Mirov dikare bibêje; keşif û vedîtînen di dema neolîtîkê yên salên 6000-4000î B.Z. de û bi qasî keşif û vedîtînen di dema Sumer, Misr, Hîtît, Ûrartû û Med-Persan alîkarî û kêrhatina xwe ya dîrokî jî li vê rastiyê zêde dikin. Pêngava çandî ya mezin a duyemîn an jî ya sêyemîn bi cih tînin.

Li vir yek ji pirsên girîng jî ew e ka di dîrokê de yek ji pêngava girîng a rohnîbûnê navenda wê li ku ye. Avakirina bajarê pêşî salên 1400î B.Z. mayînde nebû, pêvajoya paşê jî di tariyê de maye, wexta mirov tenê hin koloniyên bazirganiyê yên Fenîkiyan li ber çav bigire, mirov ê bibîne ku nîvgirava Grek heta salên 700î B.Z. ti şaristanî nehewandine. Şerên qebîleyan hene. Yên mîna Akayan nav û dengê wan hene, nexasim timî di ser Egeyê re êrîşan dibin ser herêmên şaristaniyê yên Anatolyayê. Ji sedî sed diyar e ku hînê di qonaxa barbariyê de ne. Yê li ser wan jî ji qralekî wêdetir (ji bo qral divê bajar hebe) di rewşa serek qebîleyekî de ye. Herçend em di salên 600î B.Z. de mezinbûna Athenayê (Atîna) dibînin jî di wê astê de nîne ku bibe navendeke şaristaniyê. Bi tevahî îhtîmal îşaret bi bajarên qebîleyên li peravên Egeyê dikin ku wan roleke navendî listiye. Di serî de Homeros, Heft Zanyar, Thales, Herakleitos, Parmenios, Demokritos û Phitagoras kesên navdar hemû ji peravên Rojavayê Egeyê derdikevin. Li pey hev weke zincîrekê bajar li vir têne avakirin.

Xusûseke din a girîng ew e ku di serî de Apollon pirraniya çîrokên derketina xwedayên navdar an koka xwe ji vê herêmê ne, yan jî koka xwe ji herêmên nêz in. Li vê herêmê şaristaniya maddî li gorî nîvgiravê gelekî pêş ketiye. Navendên kehanetê û perestgehên herî navdar dîsa li Rojavayê Egeyê ne. Gelek belgeyên ku hînê mirov dikare pêşkêş bike, nîşan didin ku piştî Hîtîtî, Frîgyayî û Lîdyayîyan an jî di heman demê de bajarên Îon navendên şaristaniya nû ya Egeyê ne. Yên li nîvgiravê dewama wan in. Nuqtaya nazik ew e ku di salên 545 B.Z. de împaratoriya Med-Pers ev der dagirkirin û pêre navenda şaristaniyê bû Atîna. Ji lewra salên 500-400î B.Z. mirov dikare weke serdema Athena ya bi heybet şîrove bike. Weke tê zanîn, berhemên maddî û îdeolojîk ên şaristaniyê yên li peravên Egeyê bar dikin Athenayê. Pirraniya rewşenbîran diçin wir û hinek ji wan jî xwe diavêjin Başûrê Îtalyayê û hin giravan. Herêm di bin serweriya Persan de hêdî hêdî girîngiya xwe ya berê wenda dike.

Şaristaniya Persan jî bêguman di wê demê de şaristaniyeke bi heybet e. Tenê ji herêma Grekê nagire, gelekî li wir jî zêde dike. Lê piştî ku Egeyê serxwebûna xwe ji dest da, herêmê şensê xwe

yê avakirina şaristaniyeke mezin belkî cara pêşî û cara dawî wenda kir. Eger wisa nebûya, bi hêsayî dikarim bibêjim ku wê ji wir heta Anatolyayê şaristaniyeke ji şaristaniyên Sumer, Misr, Hind, Çîn, Hîtît û Persan mezintir bihata avakirin. Belkî jî nîvgiravên Grek û Îtalyayê weke eyaletên pêve girêdayî bimana. Hem ji aliyê naverokê hem jî ji aliyê berfirehbûnê şensê avakirina împaratoriyeke qat bi qat ji Bîzansê mezintir wenda dikan. Hebûna Persan a li Egeyê hem dawî li wan anî, hem jî nehişt Egeyî pêşengiya sîstemeke mezin a şaristaniyê bikin ku ev yek mafê wan bû. Mirov çiqas li ber bikeve û dilê xwe bişewitînin li cih e. Makedoniyan ev şens di şexsê Skender de ceribandin. Di encamê de ya derket holê pirr parçebûn, navendek tinebû, gelek navend hebûn û çandeke senteza Rojhilat-Rojava bû. Herçiqas ji vê re dinya çandê ya 'Helen' jî were gotin, ji sentezeke bi serhevkirî û qetqetokî wêdetir tişteki din nîne. Ji afirîneriyeke orjînal a rastî gelekî dûr e. Paşê împaratoriya Romayê vedît hat û ji bilî bibe eyaleteke navend Bergama ti şens neda Egeyê. Ya Persan li rojhilat kir, Romayîyan li rojava dubare kir.

Şaristaniya navenda wê Athena, hem ji aliyê mezinbûna bajarê ve û hem jî ji aliyê zêdebûna hejmara bajarê ve mirov weke şaristaniyeke bi rastî şîrove bike, weke têngî rast e. Di qada şaristaniyê de ji aliyê îdeolojîk û maddî ve mohra xwe li serdemekê xistiye. Wexta mirov Athenayê dinirxîne, divê weke parzûnkekî şaristaniyên heta niha me navê wan jimartine têde hatibin dawerivandin bibîne û di encamê de tişteki nû derketiye holê, qebûl bike. Bi qasî dîroka şaristaniyê bi tevahî destketiyên dîroka çanda neolîtîkê, bi qasî vedîtînen wê yên maddî û îdeolojîk, bandorên xwecihî bi dema nû re dike yek û şoreşeke mezin a şaristaniyê pêk tîne.

Xisleta wê ya mezin a yekemîn ew e ku ji aliyê îdeolojîk ve felsefeyê weke şeweyê bawerî û fikrê ji dînen pûtperest zêdetir qebûl dike. Felsefe dibe sedem ku di warê mane û manedanê de pêngavên gelekî mezin werin avêtin. Tovê tevahiya êkolên felsefî di vê demê de hatine reşandin; tevahiya şeweyên fikrê yên xwedî naveroka Îdealîzm, materyalîzm, metafizîk û diyalektîkê mumkîn dibe ku peyda bibin û werin guftûgokirin. Beriya Sokrates 'felsefeya xwezayê' li pêş bû, lê bi Sokrates re 'felsefeya civakê' giraniya xwe çêbû. Bi mezinbûna 'pirsgirêka civakî' re ango zordestî û mêtîngerî di pêşketina van bûyeran de rol digirin. Xusûsek heye divê ez careke din diyar bikim, em wexta 'pirsgirêka civakî' dibêjin ango em dixwazin bibêjin; rêwezincîra bajar-bazirganî-dewlet-rêveberî hatiye avakirin. Her weha bajar weke şaristaniya maddî dihêle ku fikra felsefî ferz bike. Bajar bi xwe qutbûna ji civaka organîk îfade dike. Ji lewra zêhniyeteke ji xwezayê qutbûyî di nava bajêr de bi hêsanî dikare şikil bigire. Malzaroka her cure fikra mucered, metafizîka çor û fikra materyalîst, li ser hîmê bêbextiya bi hawîrdorê re şaristaniya bajêr e.

Hingê mirov dikare bibêje; felsefe ji aliyekî ve di warê fikrê de gavavêtinek e, li aliyê din şewekî fikrê yê xerîbketina bi xwezayê re ye. Sofîstên zanîna felsefî belav dikan bi awayekî mîna rewşenbîrên sedsala 18'an ên Ewrûpayê ne. Bi peran dersê didin zarokên malbatên halê wan xweş. Çawa ku rahiban vedîtînen dîni dikirin û mirovên perestgehên çêdikirin, filozof jî dibistanên xwe bi xwe çêdikan. Mîna ku dêrên (meclîsên) xwe bi xwe ava dikan. Fena dînen pirrxwedayî gelek dibistanên felsefî çêdibin. Ango mirov dikare her dibistanê weke dînekî yan jî selexaneyekê şîrove bike. Ji ber ku di dawîya dawî de dîni jî şeweyekî fikrê ne, mirov dikare wan weke felsefeya şeweyê baweriyê girtiye û bi sazî bûye qebûl bike. Divê mirov cudahiya di nava wan de bi temamî dijberê hevdu fêhm neke. Xwarina îdeolojîk a gelên tînen rêvebirin dîni e, ciwan û rewşenbîrên tebeqeya jor jî xwarina wan felsefe ye. Eflatûn û Arîsto bi awayekî dixwazin wezîfeya rahiban a avakirina bajêr, parastin û rizgarkirina wî bi riya felsefê serketî bi cih binin. Jixwe mijûliya bingehîn a filozofan ew e ka civak û dewleta sîte hîne baştir çawa tê rêvebirin, û beriya her tiştî çawa dikare li ser hîmekî baş bê danîn.

Xisleta duyemîn û girîng a şaristaniya Athenayê ew e ku cara pêşî ji aliyê teorîk û pratîk ve bi girîngî li ser demokrasîyê (cumhûriyet) sekinî ye. Bi awayekî giştî di dîroka şaristaniyê de ev qonaxê girîng e. Lê ev tenê demokrasîyeke ji bo arîstokrasîyê ye. Welatîbûna sîteyê pirr bi sînor qebûl dike, wexta mirov vê li ber çav bigire, belkî ji sedî dehê civakê jî nagire nava xwe. Lê dîsa jî nûbûneke gelekî girîng e. Di çêbûna hunerê polîtîka û felsefeyê de roleke mezin dilîze. Demokrasîyê weke têngî mijûliya gel bi polîtîkayê ango bi karên rêveberiyê re îfade dike. Di tevahiya pirsgirêkên civakî yên girîng de hizirîn, guftûgokirin û biryardan hîmê siyaseta demokratîk e. Ji lewra ev yek di şaristaniya Athena de tê maneya civaka vekirî û şefaf ku ev yek ji xisletên siyaseta demokratîk e, û kêrhatin û alîkariyeke gelekî girîng e.

Panteona xwedayan xwe bi mîmariyeke nû diyar dike. Bi şiklê xwe yê çargoşe û bi stûnên dor lê hatiye girtin û ji derve jî bi bircên berfireh ên xwe lê badane, şahane ne. Perestgehên Apollon, Artemîs û Athaneyê li tevahiya bajarên sereke mîna hevrikê hev bin, xuya dikin. Ji ber ku xweda hatine çêkirin û hûnandin di civaka Atînayê de hînê baş têne fêhmkirin. Baweriya dînî ya rêûresmî her diçe qîmeta wê ber bi nemanê ve diçe. Belkî jî damezrînerên xwedayên bajaran ên Sumeran di şaristaniya Athena û Romayê de mîna ku demên xwe yên dawî bijîn. Ji ber ku Atîna hatiye avakirin, ji avaker û parêzvan Xwedawend Athenayê jî navê xwe girtiye. Xwedawenda Ûrûkê Înannayê tîne bîra mirov. Ev mînak bi xwe jî wekheviya şaristaniyan û çawa bi rêûresmeke balkêş li pey hev tîne, nîşan dide. Beşên din ên bajêr weke Agora (bazar), dêr (meclîs), şano, stoal, jimnasyum (stadyum) û hwd. gelek sazî û dezgeh çêbûne. Bajar bûne xwedî gelek xisletên cihê, bajar êdî bêyî bircan jî dibin, gelek qesrê xwe û avahiyên xwe yên pêşketî hene. Hinekî dişibin Hîtîtiyan lê ji wan bihurandine. Şênîyên wan hînê zêdetir in.

Wêjeya devkî pêş ketiye. Belkî jî em di dîrokê de bi çanda edebî ya herî mezin a bi belgeyên nivîskî hatiye tomarkirin rûbirû ne. Şanoyê dema herî şoreşgerane di vê demê de dît. Destan û trajedî têra xwe tîne lîstin. Berhemên dîrokî tîne nivîsandin. Destana Homeros weke pirtûka dersê tê xwendin. Bûyerên balkêş dikin şano. Mîna ku mizgîniya hatine sînemayê bidin. Deryavanî û bazirganî pêş ketiye. Piştî Fenîkiyan şaristaniya herî zêde di warê keştiyan de hosta ye. Herçiqasî bazirganî pîşeyekî zêde balê nekeşîne be jî di civaka Athena de dendikên pêşî yên kapîtalîzmê bi hindikî be jî tîne danîn û hebûna wan xuya dike. Eger hinekî din gavê biavêjin, hema mirov dibêje qey wê gavê biavêjin sîstema kapîtalîzmê. Mîmarî pêş ketiye. Jixwe avahiyên bajêr têra xwe vê yekê îspat dikin. Heykeltraşî gihiştiye astekê mirov dikare jêre bibêje; îdeal e. Dîmenên mîtolojiyê yên li ser dîwar û keviran hatine niqirandin gelekî balkêş in. Em hema yekser divê bibêjin; bi tevahî ji mîtolojiyên şaristaniyên berê (baweriyên nedînî, şêweyên fikrê) sentezeke wan a xurt a wêjeya mîtolojîk heye. Mîtolojî hunerek e ku bûyerên civak nikarin wan ji hev derxînin û wan îdealîze dikin bi çîrokî îfade dike û ev şêwe di serdema destpêkê de gelekî belav heye.

Muzîk çî di warê hejmara enstruman û amûran de, çî jî di warê cureyên wan ên weke îlahî, qesîde, eşq û destanan de pêş ketiye. Lîr estrumanek e ku balê dikişîne. Şêweyê vegotinê yê helbestwarî bi qasî demên qehremaniyê ango qonaxa hema berî bajarvaniyê qonaxa di ser hovîtiyê re nebe jî hebûna xwe dewam dike.

Piştî Atînayê Sparta tê. Taybetmendiya Spartayê ew e ku rêûresma qraliyetê bi hişkî meşandiye. Di nava wan de timî şer û nakokiyan dewam kiriye. Modela Atîna û Spartayê li tevahiya nîvgiravê şop hiştiye. Belavbûna bajaran bi lez bûye. Li giravê û peravên deryayê yên li hember bi heman modelan bajar tijî bûne. Li peravên Derya Reş û Marmarayê jî bajar hatine avakirin. Şênîyên zêde û bazirganiya pêşketî rê li ber serdemeke kolonî ya nû vedike. Li Misrê jî dikare bajarek an jî kolaneke bi ser Grekê ve hebe. Paşê ev dibin bajar. Başûrê Îtalyayê jî bi giranî bûye kolonî. Mîna ku rola Fenîkiyan dewr girtine. Tevî van pêşketinan hemûyan û avakirina yekîneyên bajaran ên li nîvgiravê, nikarîbûye xwe bigihîne hêzeke împaratoriye ya weke Persan û Romayê. Li gorî ruhê demê, ya nikaribe bibe împaratorî dikeve bin serweriya împaratoriyeke din. Şaristaniya giravê ya bi pêşengiya Athenayê di salên 340î B.Z. de, bi gefxwarinên Makedonyaya li bakurê wê weke qraliyetekê mezin dibe rûbirû ye. Şaristaniya Grek a nikarîbû hêza xwe ya mezin a îdeolojîk û maddî bike navendî û xwe bigihîne sîstemeke polîtîk a ji sîteyan wêdetir, piştî çend şerên berxwedanê ji sala 330î B.Z. û pêve serxwebûna xwe bi awayekî wenda kir ku careke din nebîne. Lê mîna Babîlê wê weke navendeke nû ya çandê hebûna xwe demeke dirêj dewam bike.

Demokrasiya Athenayê derba herî dawiyê ji qraliyeteke nû mezin dibe ji yekîtiya Makedonyayê xwar. Jixwe berê jî di şerê dirêj ê sîh salî de ji Qraliyeta Spartayê derb xwaribû. Makedonî ji çanda Yewnan in, û zimanekî cuda bi kar tînin. Filîp û kurê wî Skender ên hewl didin serekeşîrên qebîleyên cihê li cem hev bigirin di sala 359'an B.Z. de kirin ku li tevahiya nîvgiravê serweriya wan were naskirin. Skenderê ku jiyaneke wî ya balkêş heye, demeke dirêj li ber destê Arîsto xwendekarî kir. Arîsto jî li bajarekî herêma nêzî Makedonyayê ji dayik bûbû. Diyar e, ji xwendekariyê wêdetir tîkiliyeke nêz di navbera wan de heye. Piştî mirina Skender reva wî ya yekser ji Atînayê vê yekê nîşan dide. Arîsto, Skender li bajarê peravên Egeyê perwerde kiribû. Di demên dawî yê serweriya Persan de, bi tevahî nixê çanda Yewnan û xwedayên mîtolojîk

mejiyê wî tijî kiribû. Ti siyasetvanê Yewnanan nebû ku nizanîbû dewlemendiya Împaratoriya Persan rê li çavbirçîtiya mirov vedike. Demekê berî demekê têkberina Persan weke xwestekeke xurt bi cih bûbû. Ev, hisek welê bû, dişibiyê xwesteka Îslamê ya ji bo têkberina Bîzansê. Li cem tevahiya eskerên beşdarî êrîşê bûbûna ev bîrûbawerî hebû. Artêşa Skender artêşeke rêûresmî ya ji koleyan nebû.

Divê mirov baş fêhm bike ku Skender bi çandeke serketina xwe îspatkirî û yekîneyên eşîran ên di bin rêveberiya serekeşîrên nû hewl didan ji barbariyê derkevin û çav berdane dewlemendiyên Rojhilat de bi rêxistina artêşeke nû ya ji yekîneyên falanj tevdigeriya. Li Anatolyayê bi şerê Granîkos, li Çûkûrovayê û Rojhilatê Derya Reş bi şerê Îssos, li Bakurê Iraqê bi şerê Arbella û bi şerekî bêyî bêhn bide herî dawî heta keviyên Îndûs ên Hindistanê fetih kirin. Dîsa bi meşa xwe ya bi bela ya Başûrê Îranê li navenda dinyayê Babilê ji ber sedemeke bi tevahî nayê zanîn hînê di sîhûsê saliya xwe de mir û wexta çavên xwe li jiyane miçandin li pey xwe ji Împaratoriya Persan berfirehtir cografyayek hişt. Ev, cografyayek bû ku bi tevahî li çanda Yewnan hatibû vekirin.

Ev cografya berê jî bûbû xwedî şaristanî. Lê hêmanên wê yên maddî û îdeolojîk xwe dispartin nîfşê pêşî yê koledariyê. Jixwe çanda Yewnan ji zû ve ji çanda vê şaristaniyê bihurîbû. Hînê gelekî ciwan bû û ji bo paşerojê xwedî nîşaneyên baş bû. Ji lewra qabîliyeta wê ya karibe biteamîne hebû. Çawa ku rahibên Sumeran çanda neolîtîk teamandin çîna pêşî, bajar û çanda dewletê ava kirin bi heman hûrûkûrahiyê nebe jî çanda Yewnan jî ji bo deverên şaristaniyên berê teamandineke ciwankirinê bû. Di vê demê de ku jêre 'Helenîzm' jî tê gotin û tê texmînkirin ku li derdora salên 330 B.Z. û 250 P.Z. de dewam kiriye gelek qraliyet hatin avakirin. Li Misrê qraliyeta Ptoleme, li Anatolyayê ya Bergamos, li Sûrî û Mezopotamyayê ya Selevkosan qraliyetên nû yên bal li ser wan bûn. Piştî têkçûna xanedaniya Axemenî xanedaniyeke nû bi navê Partan hewl da Împaratoriya Îranê restore bike. Di heman demê de Partên di salên navbera 250 B.Z. û 220 P.Z. de hukmê xwe meşandin tiştêkî nû temsîl nedikirin. Li derdora pêncsed salên 'Helenîstîk' nexasim di avakirina bajarên nû de gavên mezin avêtin, di serî de xwedayên Yewnan û Îranê panteonên çandên têkel temsîl dikirin çêbûn, çand û zimanê Yewnan li tevahiya vê cografya ziman û çanda serdest û fermî bû û di encama vê de sentezeke gelekî girîng çêbû. Jiyana Skender bi xwe sentezeke Rojhilat-Rojava bû. Bêguman senteza çandên wê demê serdest bûn, lê dîsa jî gelekî girîng bû. Dîrok ti carî nebûye şahidê sentezeke çandan a evçend mezin. Roja me ya îro jî di navê de ev welê ye. Belgeya herî berçav û hînê zindî ya vê rastiyê, xirbeyê qebriştana Qralê Komagene Antiochus a li Çiyayê Nemrûtê ye. Ev qraliyeta bi hêz a wê demê navenda wê Semsûr e. Paytexta wê demê bajarê Samosatê bû ku di binê ava Firatê de ma. Qebra li Çiyayê Nemrûtê yek ji harîqeyên dinyayê ye, û ji ber ku vê rastiyê tîne ziman, sembola senteza Rojhilat-Rojava ye.

Li vir a ji bo mijara me girîng ew nîne ku şaristaniya koledar belav bûye û di vê demê de deverên vala yan jî çanda neolîtîk û barbar xistiye nava şaristaniyê; li vir şaristaniyeke koledar a nû gihîştîye qonaxeke hînê jor ango şaristaniya Yewnan-Helen ji Hindisanê heta Romayê, ji peravên Bakurê Derya Reş heta Derya Sor û heta Kendava Îranê tevahî dever kirine bin serdestiya çanda nû û hewl dide di nava xwe de şareza bike. Li bajarê Romayê nûnerê ciwan û jêhatî yê çanda nû li ser heman xetê wê bi xurtî bimeşe û li gorî dema xwe wê Împaratoriya koledar a herî mezin ava bike.

Danasîna çanda Romayê, herî kêr bi qasî ya Atînayê girîng e. Sedema pêşî ya girîngiya wê ew e ku tepela şaristaniya koledar e, ji bo wê Çiyayê Everestê ye. Ji wir û pêve şaristaniya koledar serberjêr diçe. Ya duyemîn, di warê berfirehî û kûrahiya çanda Împaratoriye de nûnerê herî mezin e. Di dîrokê de ti Împaratorî bi qasî Romayê nebiriqiye û muhteşem nebûye. Ya sêyemîn, nûnerê herî bi hêz û dawî yê qral-xwedayên bi maske ye. Bi qasî Împaratorên Romayê ti kesî xwe hem mirov û hem jî xwedê nehesibandiye, hêza xwe ji îradeya xwe ya ferman û çalakiyê girtine, bi hêza xwe ya maddî û manewî hewce nedîtine hesab bidin ti kesî, lê dîsa ti îrade û hezeke din weke wan nehatiye dîtin ku li dinyayê hesab ji her kesî û ji her tiştî bipirsin û bigirin bin destê xwe. Çaremîn, ew dewlet e ku welatîbûn û huqûq bi komên mirovan ên berfireh dane naskirin. Pêncemîn, ew Împaratorî ye ku cara pêşî rê li welatîbûna dinyayê, kozmopolîtîzm û pêve girêdayî rê li dîne dinyewî (katolîk, ekumenîk) vekiriye. Şeşemîn, şeveqa şaristaniya Ewrûpaya mezin e, serê pirê ye. Heftemîn, demeke dirêj weke komar hebûna xwe dewam kiriye.

Bajarê Romayê bêguman ev pêşketinên mezin bi mûcîzeyan nekiriye. Beriya wê çar çandên mezin hene û wê jî weke nûnerê wan ê dawiyê hêzeke potansiyel û aksiyonel bi dest xistiye. Çanda yekemîn, çanda herî kevin çanda şoreşa neolîtîk e. Vê çandê di salên 4000î B.Z. de weke li tevahiya Ewrûpayê nîvgirava Îtalyayê jî kir bin bandora xwe û nûnerê dawî yê wê çandê qebîleyên Îtalîk yên Latîno bûn. Mirov dikare texmîn bike û bibêje; di salên 1000î B.Z. de destpêkirine nasname dane Îtalya îro û nasnameya wê ya etnîk diyar kirine. Bawer dikim tespîtek bi vî rengî wê nêzî rastiyê be. Mirov dikare diyar bike ku bi wê nasnameyê tevahiya saziyên neolîtîkê û zêhniyeta wê nas kiriye. Divê bi koka xwe Ewrûpî bin. Koma duyemîn a nasnamehilgir Etrusk e. Bi ihtimaleke mezin di salên 1000î B.Z. de ji Mezopotamyayê çand û zimanê Aryen di ser Anatolyayê re anîne. Koma em behsa wê dikin xwediyê şaristaniya nîv-neolîtîkê û nîv-koledar e. Ev kom, bi ihtimaleke mezin di salên 800î B.Z. de li bakurê Îtalyayê bi cih û belav bûye. Ji wan gelan e ku cara pêşî tovê şaristaniyê li Îtalyayê û bajarê Romayê reşandiye. Ya sêyemîn, çanda Grek a navend Athena ku di serdema xwe ya muhtesem de bû û hînê çêdibû, şaxekî xwe weke kolonî cara pêşî berda Başûrê Îtalyayê. Phitagoras û koma xwe di salên 500î B.Z. de li Başûrê Îtalyayê bi cih bû. Çaremîn, koloniya Kartaca û koloniyên din ên Fenîkiyan damezrandin di salên 800î B.Z. de çanda Misrê û Derya Spî ya bi koka xwe Semîtîk birine nîvgirava Îtalyayê.

Mirov dikare bibêje; ev her çar çand ji bilî Çînê weke hungivê tevahî çandan dawerivîbe û herikîbe nîvgiravê û ev jî bingehê çîroka Romayê ye. Mîna ava cewherî ya di malzarokê de be. Ya nêzî rastiyê mirov bibêje ew e ku sentezek gelekî di ser sentêza çandî ya Atîna û Rojavayê Egeyê de bi hatina cem hev a hêza potansiyel û aksiyonel a her çar çandan dibe. Mîtolojiya xuşk û bira Romulus û Romus ên ji dêlegurê bûyî û Roma ava kirî, çîrokbêjiyeke gel e, ji bo avakirina gelek deveran tê gotin. Ji bo kovîtiya çavkaniyê (ji der ve) û dawerivandina wê di parzûnkekê de (çandên cihê) îfadeyeke balkêş e!

Piştî şikestina Troyayê şaristaniya Romayê ji aliyê yek ji hevalên Parîs ên şer Aineais ve tê avakirin. Çîroka vê bûyerê bi awayekî mîtolojîk karakterê wê yê Anatolyayê nîşan dide û ji vî alî ve têra xwe kêrhatî ye, û mirov dikare jê hîn bibe. Nêzîkbûna me bi awayekî destanwarî îfade dike. Çîroka avakirinê ya qralên rahib li derdora salên 700î B.Z. li gorî tevahiya damezrandina bajarên şaristaniyê yên sereke li cih e. Li hawîrdora wê gelek çîrokên şerên qebîleyan hene ku ev jî di damezrandina bajaran de têkiliya dewletbûn-çînê zelal dike û tê fêhmkirin. Şer û xwelihevraşandina Etrusk û Latînoyan, dîsa di gelek damezrandinên mînak de tê dîtîn ku ev yek jî ji nakokiya navbera çanda neolîtîkê û çandên şaristaniyê yên xerîb tene hesibandin pêk tê.

Di mezinbûnê û bilindbûnê de şensê Romayê hebû ku li nîvgiravê bû, di xelesa şaristaniyan de li serê dawî yê rojava cih digirt û li bakur hêzeke şaristaniyê ya çavkaniya xwe parzemîna Ewrûpayê be, tinebû. Tehlûke ji du aliyan ve dikarîbû bihata: ji şaristaniya navend Atîna ya li nîvgirava Grek û ji koloniya herî bi hêz a Bakurê Efrîkayê ya Fenîkiyan ku ew jî Kartaca ya gihîştibû şaristaniya bajêr a serbixwe. Ji ber ku şaristaniya Yewnan nikarîbû ji serdema pêşdebirina koloniyên bibihure, ji ber ku ji rojhilat timî zexta Persan his dikir, ji ber hevrikiya zêde ya di navbera bajaran de dikir û nedikir rê nedida bibe împaratorî yan jî qraliyeteke navendî, ji ber ku di demeke kin de ket bin serweriya Qraliyeta Makedon, diyar dibû ku wê ji bo Romayê nebe çavkaniya tehlûkeyekê. Dibe ku Kartaca hevrikekî hînê ciddî bû. Ji ber ku nêzî hevdu bûn, li heman deveran belav dibûn û li gorî karakterê şaristaniyên wan timî li pey hukimraniyê dibezîn û wê yekê jî nêz an jî dûr wê wan bianiya beramberî hevdu. Şerê ji sedsalekî zêdetir di dawîya dawî de benda herî mezin a li pêşiya serketina Romayê ji holê radikir. Skender berî bi demeke kurt bimire hedefa xwe weke Roma destnîşankiribû û ev jî dikarîbû bibe tehlûke û gefxwarineke ji dil. Lê jixwe nîvgirava Yewnan serweriya wî bi navê xweda-qral qebûl dikir. Lê mirina zû ya Skender şensekî din ê mezin ê Romayê ye. Împaratoriya Skender a li şûna împaratoriya Romayê bihata damezrandin bi hêsayî dikarîbû bûbûya hêza herî mezin a dinyayê. Li cem Skender qabîliyetê gelekî mezin hebû. Piştî ango piştî şerê dawî yê Kartacayê di salên 150î B.Z. de bi tevahî şaristaniyên berê û dinya çanda neolîtîk li ber çavbirçîtiya Romayê li fethê vekirîbû. Ji bilî împaratoriya Îranê ya ji xanedanên Part û paşê Sasanî.

Gavavêtina Romayê ya komarê di sala 508an B.Z. de mîna dewama bisazîbûna demokrasiya Atînayê xuya dike. Di vê de bi qasî hebûna bingehêkî xurt ê çandî para arîstokrasiyeke bi hêz jî girîng e. Her weha di bihurandina ezmûna berê ya qraliyetê de, dibe ku mîna Spartaya li

beramberî Atînayê roleke pêşxistinê bi cih neanîbe. Qraliyet bi giştî muhafezekar in, û firsendê nadin ku arîstokrasî li dora wan cih bibîne.

Weke Cumhûriyet bajarê Romayê gelê xwe zêde serwext kiriye û di warê berjewendiyên wan de jî bi îrade kiriye. Avahiya ji du meclîsan a ji bo arîstokratên û welatîyên ji rêzê, konsultî, pêşketina dadgeriyê weke saziyeke cihê û bisazîbûna hêzên parastina bajêr nîşan didin ku Cumhûriyeta Romayê li gorî demokrasiya amator a Atînayê têra xwe profesyonel e, û bicihbûyî ye. Rêveberiya cumhûriyetê yek ji çavkaniya bingehîn a pêşketina hunerê polîtîkayê ye. Ev rewş di heman demê de tayê di navbera polîtîka û huqûqê de nîşan dide, ango huqûq bi sazî bûye, ji lewra ev mîna keke orjînal a dîrokî ye ku nîşan dide huqûq polîtîkayek e ku mirovan li ser li hev kiriye. Bi cumhûriyetê Roma di nava xwe de dibe xwedî pêşketineke bi heybet a çandî û li derve jî dibe xwediyê fethên mezin. Mirov dikare bibêje; şaristaniya Romayê bi cumhûriyetê gihiştîye sînoren xwe yên xwezayî. Çîroka gavavêtina ji cumhûriyetê ber bi împaratoriye ve, ya rastî mikurhatina li şer û tehlûkeyên derve û hundir ên mezin e. Pevçûna Julius Sezar û hevrikên wî, nakokîya di navbera pleb û arîstokrasîyê, navend Roma û hawîrdora wê de nîşan dide. Brutus ji bo îxaneta xwe veşêre weke bahane îdîa dike ku şerefa mezin a Romayê ji bo derve tê fedakirin. Bi vê îdîayê xwestîye xwe mafdar nîşan bide. Ji ber ku pleb piştî Sezar digirin û nûnerên neqane yên arîstokrasîyê di nava bêbextiyê de cih digirin û li eyaletan piştgiriya zêde ya ji bo Julius Sezar wer xuyaye vî hukmî piştrast dikin.

Li derve serhildan dewam dikin û Îranî jî heta Firatê hatine. Seferên Sezar ên Galya, Brîtanya û Germanyayê, serhildanên li Anatolyayê, kesê sêyemîn Crasius di şerê bi Îranê re serê wî hat jê kirin, li Rojhilatê Derya Spî serhildana Cihûyan, şerên bi dawî nabin ên li nîvgirava Yewnan û Balkanan, êrîşên Hûn, Skît û Gotan ên dest pê kirine û hema dibêjin em tîn, li herî başûr seferên xenîmetê yên qebîleyên Ereban, li Misrê bermahiyên qraliyetê yên hebûna xwe hîne bi xurtî dewam dikin, mezinahiya tehlûke û gefxwarinê nîşan didin. Diyar bû ku guftûgoyên bê dawî yên senatoya cumhûriyetê, xwe li hev rakişandina hizbên hevrik ji bo namzetên konsulên û rewşa gel a polîtîk a hîni xenîmetên derve bûyî, di têkoşîna li dijî tehlûkeyên derve û rewşên bi lez ên hewceyî biryardanê, rejîma cumhûriyetê tengav dikin.

Ji cumhûriyetê gavavêtina împaratoriye li serê dema mîladê rastê. Sembolê vê yekê Augustus di bingehê polîtîkayên wî de şert û mercên me jimartin hene. Ya ku şert ferz kirin ew bû ku li hundir aramî û li derve jî polîtîkayên ewlehiyê bûn. Serdema Aştiya Romayê (Pax Romana) ya muhteşem heta salên 250î P.Z. bi saya van polîtîkayan bû. Tê zanîn ku li ser hîmê van nîzam û sererastkirinan dimeşyan. Senato bi temamî ji hêzê hatiye kirin û ketiye rola meclîseke şewirmendan, li şûna hîlbijartinê serê saziyan bi wezîfedarkirinê tê destnîşankirin û rêvebirin, gel rojên xwe bi kêf û şahiyên dibihurîne, li derve jî eskergehên ewlekariyê yên bi hêz tîne avakirin, bi bircan kelehên qehîm tîne lêkirin û gav diavêjin şerên parastinê. Herçend ji aliyên me jimartin hemûyan êrîş hatibin kirin jî bi temamî seferên êrîşê bi armanca parastinê ne. Ji vir û pêde em xwediyê lîsteyê împaratorên navdar in. Lîsteyên kesên nîv-mirov û nîv-xweda ne! Ya balkêş jî ew e ku împaratorên Romayê bi xwe jî roj bi roj pê dihisin ku panteona xwedayên klasîk bêmane ye. Pêşiya xwe baş didîtin ku wê bi maskeya van xwedayan nikaribin hebûna xwe bi awayekî rewa dewam bikin.

Împaratoriya bi pirr seriyan dihat meşandin û aloziya mezin a piştî salên 250î P.Z. îşaretên dabeşbûnê didan. Qralîçeya navdar a Palmyrayê Zennûbeyê jî li Misr, Sûrî, Anatolya û Iraqê ji bo xwe li pey avakirina împaratoriyeke bû. Navên deverên min jimartin wê demê tinene, lê ji bo were fêhmkirin bi kar tînim. Çîroka wê ya xembar mîna klasîkeke Romayê ye. Li Rojhilat damezrînerê Xanedaniya Sasanî ya nû Ardeşîrê Yekemîn û hemtayê Augustus împarator Şahpûrê Yekemîn li pey hev artêşên Romayê şikandin. Tê zanîn ku Sasanî heta bi Rojhilatê Derya Spî û Torosan çûbûn. Di vê navberê de, bajarê eskergehê yê navdar Zeugma yê li nêzî Firat-Bîrecûkê, di salên 256'an P.Z. de bi awayekî ku careke din bi ser xwe ve neyê ket bin erdê. Di navbera împaratoriye Îranê Sasanî û Partan, û împaratoriya Romayê de, nexasim Mezopotamya Jor bi temamî bûbû devereke şer û destguhertina deveran. Ev erdên pîroz ên lê şaristaniyên pêşî yên bajaran derketin û şoreşa neolîtîk lê pêk hat, bûbû qutbekî berevajî mentiqê diyalektîka xwe, ew erdên jê şaristanî derketibûn bûbûn erdên şer û pevçûnê. Ev erdên ku piştî Ūrartûyan bi ti awayî nikaribûn nîzamekî xwe yê navendî çêkin, heta roja me ya îro ji aliyê hêzên şaristaniyê yên din ve hatin dagirkirin, îlhaqkirin û weke rejîmên mêtîngê hatin rêvebirin ku ev yek ji bûyerên

herî trajîk ên dîrokê ne. Mîna jin-dayikê ye ku çawa şoreşa çandê ya herî mezin afirand û paşê bû hebûnek e ku herî zêde hat bînpêkirin.

Artêşên Romayê dîsa jî bi êrîşên dijber heta peravên Dîcleyê diçûn. Împaratorê navdar Julianus ku mîna teqlîda Skender bike tevdigeriya sala 365'an P.Z. li peravên Dîcleyê di şerê herî dawî yê mezin de bi awayekî trajîk mir û bi vê êdî serdema împaratoriya mezin a Romayê jî bi dawî dibû. Şerên li rojhilat û parzemîna Ewrûpayê nîşan didan ku êdî nabe împaratorî ji Romayê were rêvebirin. Wexta împaratorê navdar Diocletianus di sala 306'an P.Z. de mir, li serê împaratoriye di heman demê de şeş împarator hebûn. Yê karîbû xwe ji nav wan derxîne û derkeve pêş Konstantînê Yekemîn di sala 312'an P.Z. de dîne împaratoriye, di sala 325'an de jî paytexta wê guherand. Piştî împaratorê dawî Julianus ê ji silaleyê Konstantîn, bi awayekî fermî di sala 395'an de parçebûnê destpêkir. Împaratorên Romaya Rojava êdî bûbûn pêlîstokên şefên êrîşkar ên Gotan. Sereke Hûnan Atîlla jî bixwesta dikarîbû di sala 451'ê de Roma bigirta. Di sala 476'an de bi destê Qralê Gotan Odoakr Împaratoriya Romayê ya Yekemîn dawî lê hat, çanda wê demeke dirêj di binê axê de li benda derketina xwe ma, lê nemir.

Romaya Duyemîn ango çîroka Bîzansê hîne tepisokî û teqlîdker demeke dirêj hebûna xwe dewam kir. Hem Rojhilat û hem jî Rojava teqlîd dikir, nikarîbû sentezekê çêke ango împaratoriyeke berdar nebû. Ji bo deverên berê yê împaratoriye di destê xwe de bigire hewldanên mezin ên Justinyen (P.Z 527-565) Herçend bi tesîr bûn jî dîsa eyalet hêdî hêdî ji dest diçûn.

Bîzans xwe weke Romaya Duyemîn bi nav dîke. Konstantinopolis ji bo bibe Romaya Duyemîn xwe zêde mezin dikir ango ev îddîaya wê li cih nîne. Li ser deverên berê yê Romayê xwe dubare kiriye û ji vê wêdetir tiştekî din nekiriye. Rengê wê yê Xiristiyantiye jî dabaşeke din e. Divê mirov cihê li ser rawest e. Piştî Osmanî û heta Slavên Rûsyayê ên navend-Moskow gelekî hez dikin ku xwe weke serdema Romayê ya sêyemîn bi nav bikin. Weke çanda îdeolojîk Xiristiyantî û pêre Îslam îdîaya wan a di warê Romaya sêyemîn de welê îdîayeke tewş nîne, dem û çandên cihê tevlihev tene kirin û bi vî awayî rê li ber aloziyeke mezin a maneyê vedibe. Ez ê di beşê piştî vê de têgînên bi pîrsgirêk ên weke 'şaristaniya Mûsevî, Xiristiyani û Îslamî' bigirim dest û hewl bidim şîrove bikim.

Li ser bîranîna Romayê ji Ingilistanê heta Derya Reş gelek împaratoriye nû zêde bûn. Bi Romayê re pûtperestî jî hilweşiya, lê ji bo şoreşeke nû ya dîni valatiyeke mezin çêkir. Mîtolojî û pûtperestiya Ewrûpayê li hemberî ya Romayê bejinbihostî bû. Jixwe pûtperestiya dîni fermî yê Romayê bû û pêre hilweşiya, diyar bû, wê weke îdeolojî Ewrûpayê têr neke. Herçiqaş hewcedariya serdemê bi şoreşên maddî, polîtîk û ekonomîk hebû, ew qasî jî bi şoreşên dîni û manewî hebû.

Ez berî ku behsa mane û derketina şoreşên Xiristiyantî û piştî Îslamî bikim, ez ê hewl bidim bîlanço ya maddî û çandî ya Romayê bi xetên stûr rave bikim.

Li deverên şaristaniye yê herî mezin ên dinyayê ku tene zanîn, bazirganî, pîşesazî, maden û cotkarî di bin banê împaratoriye de hîne mezintir bûye. Gotina 'Rê hemû diçin Romayê' berê çavkaniyên aboriye diyar dîke. Dinyayê Roma xwedî dikir. Bi vê kurtêlxuriya mezin di serî de Roma bajarên bi heybet hatin avakirin. Bajarên dema Helenîstîk hatin parastin û hatin mezinkirin, pêşdebirin. Piştî Romayê, Antakya, Skenderiye, Bergama, palmyra, Samosat, Edessa, Amîd, Erzenî Rûm, Neo Kayser û Kayserîa, Tarsûs, Trapezûs û hîne gelek bajarên din ên Helenîstîk weke stêrkên Rojhilat bûn. Li Ewrûpayê di serî de Parîs, em dibînin hîmên pêşî yê bajarên nû yê dinyayê tene danîn ango Ūrûkên nû derdikevin, hiltên. Mîmariya wan heman mîmariya bajarên Yewnan bû. Lê hîne mezin û hîne bi heybet bû. Dîsa kêmbere avê yê muhteşem, çerx û cihok gelekî pêşketibûn. Tevn û nîzama rêyan bi awayekî nehatibe dîtin hatibû danîn. Ewlekarî temam bû. Bi rastî Pax Romana hebû. Amûrên mîmariye û yê madenkariye pêşketibûn. Di warê kanên kevîran û niqirandina wan de mirov dikare bi Misra berê re bide berhevdu û qiyas bike. Rûkêşkirina zirxê madenî û sîleh çêkirin, bi awayekî xwezayî pîşeyên herî pêşketibûn. Bazirganî bi temamî bi sazî bûbû. Li gorî çanda Yewnan bûbû xwedî paye û li rewacê bû. Bazirganên navdar hebûn. Di bazirganiye de demeke welê ye ku gavên girîng tene avêtin.

Di dîrokê de huqûq belkî cara pêşî evqasî pêşketiye û bi sazî bûye. Navlêkirinên huqûqê ewçend hosteyane bûn ji bo îro jî hîne numûne ne. Encama xwezayî ya huqûqê saziya welatîbûneke bi hêz e. Welatîbûna Romayê cihêwaziyeke mezin bû. Li tevahiya dinyayê bazirgan

û arîstokratan dixwest mîna Romayîyan bijîn û ev weke cihêwazbûnekê didîtin. Mîna jiyana modernîteya kapîtalîst a di roja me ya îro de şêwazê jiyana Romayê jî weke şewbekê belav dibû. Belkî jî bandora modekariya Îtalyayê li tevahiya dinyayê ji vê rêûresmê tê.

Spor gelekî bi awayekî hov dihat kirin. Şerên gladyatoran, şerê bi şêran re û êsîrên zindî yên li arenayan diavêtin ber şêrên birçî gelekî hov bûn. Gel hînî van şahiyên hovane dikirin û bi vî awayî ew ji exlaq dikirin. Panteon û perestgehên li ser navê xwedayan hatine avakirin jî di demên dawî de girîngiya wan gelekî kêmtir dibe. Teolojiya Romayê bi tenê navên teolojiya Yewnan guhertibû û qebûl kiribû. Vergilius, Destana Troya ya Homeros ji xwe re kir mînak û destana damezrandina Romayê Aieneis nivîsand. Wêjeya Yewnan jî di navê de bi tevahî hêmanên çandê bi tenê kirin Latînî û bi vî awayî hatin qebûl kirin. Nivîsandina şano, dîrok û felsefeyê jî di navê de. Dîsa jî gelek berhemên girîng derketin holê. Xîtabkirin hunerekî xurt bû. Romayî di heman demê de uslûbeke axaftinê bû. Tevî ku di kincan û li xwekirinê de bandoreke hûrûkûr a Rojhilat hebû jî gelekî xweser bûbû. Latînî hêdî hêdî li şûna Grekî weke zimanekî standart di dîplomasiyê û qada navneteweyî de tê bi karanîn û dibe zimanê fermî. Di wendabûna klasîkên Yewnan de bandora wergerên bi Latînî gelekî heye. Polîtîka di vê demê de bûye mîna hunerekî.

Em wexta ku çanda Roma û Atînayê bidin ber hev û qiyas bikin, em ê bi hêsayî bibînin ku aliyê îdeolojîk yê çanda Atînayê girantir e, li hemberî vê jî aliyê maddî –polîtîk yê çanda Romayê girantir e. Lê girîng e ku mirov bibîne herdu çand yekpare ne. Mîna ku berhemên hîmdanîna çandî ya Atînayê berê pêşî Skender û qraliyetên piştî wî û paşê jî Romayîyan berhev kirine. Bêyî ku mirov çanda Atînayê bifikire nikare Romayê di hişê xwe de çêke û bihûne, jixwe xuya ye, hiç nikare vê yekê weke împaratoriyeke dinyayê bihizire.

Lê ya hînê girîngtir ew e ku ev herdu çand di pêşketina çanda Rojhilat de qonaxa dawî ne. Weke tê zanîn, Atîna û Romayê çand û împaratoriyeke orjîn neafirandine. Herduyan jî çavkaniyên çanda Rojhilat li gorî şert û mercên xweçihî û xwemalî di asteke jor de sentez û bi encam kirine. Ewrûpayê jî bi çavkaniyên van çandan, bi senteza Roma û Atînayê ve bi hev ve kirin û di şoreşa xwe ya mezin a çandê de bi ser ket. Li derveyî dergûşa mezin a Rojhilat Mezopotamya û Misrê mirov nikare li çandeke Ewrûpayê bifikire.

Di aliyê maddî de jî bûyerên dîrokî yekpare ne. Çêbûn û zêdebûna bajaran bi Ūrûkê destpêkir û weke xelekên zincîrekê bi hev ve girêdayî ne. Me dît ku hema hema her şaristaniyek ‘Ūrûk’êke xwe heye. Ev xusûseke xweber nîne. Diyalektîka bajaran e. Di derketin û belavbûna neolîtîkê de jî heman bûyera diyalektîkî derketibû pêşberî me. Em di vê nirxandin û tomarkirina xwe ya li ser belavbûna şaristaniyan de dibînin ku em nikarin maneyê bidin bûyerên civakî yên ji zemînên dîrokî û mekanî qut in.

Fetihkirina dinya me ji aliyê sîstemên şaristaniyan ve bi giranî bi şaristaniya Romayê temam bûye. Jixwe ji nû ve li fetihkirina deverên berê vegeyane û xwe bi awayekî bê ber dubare dikin. Di navbera şaristaniyan de fetihkirin a rastî xwedî karakterê desteserkirin û talanê ye. Ji ber ku karakterê şaristaniyan wekhev in. Ji ber ku şaristanî hemû jî li pey kurtêlên ketine ser hev in, û dixwazin wan bi talanê bikin milkê xwe. Ez wexta dibêjim; ‘kurtêlên ketine ser hev’ mebesta min ji vê têgînê hatina ji milk e. Çi milkê taybet dibe, çi jî yê dewletê be, piştî nanozikiya mirovên li nava zeviyan têne xebitandin bi tevahî nirx û buhayên têne berhev kirin kurtêl têne hesibandin. Ji lewra belavbûna di encama şeran û destgurtina deveran de pêk tê, nirxên nû bi xwe re peyda nakin, tenê nirxan têk dibin û hildiweşînin.

Em wexta vedigerin, li pey xwe dinêrin, pêvajoya bi Asûran destpêkiriye, em dibînin ku bi desteserkirina nirxên şaristaniyên berî xwe, xwe ji yên berî xwe cihêwaz kiriye. Împaratorên Asûran ên bi hovîti şaristaniyên Hîtî, Hûrî, Fenîke û Misrê zevt kirin bi lêkirina birc û keleşan ji serê mirovan pesnê xwe dan û ya esas bi vê yekê, li rastiyeke eşkere mikur hatin ku ew jî ev bû: şerên şaristaniyan hovîti ne. Hegel heman mentiq bi gotina ‘selexaneyên dîrokê’ bi nav kiribû. Ji ber ku wexta mesele destguhertina milk û kurtêlxuriyê be, mumkîn nîne ev yek bi awayekî din pêk bê. Li aliyekî civakeke jiyana wê bi temamî girêdayî çanda şaristaniyê, li aliyê din jî civakeke şareza ya din ku dixwaze wê desteser bike heye: eger yek a din ji tevahî nirxên wê yên maddî û manewî qut bike, digihîje armanca xwe; ango ji yekê ji wan re ji bilî tinebûnê ti rêya din namîne. Jixwe teslîm bibe jî wê beşê civakê yê herî hoste û kêrhatî ji tinebûnê xilas nebe. Erê teslîm bibin jî weke rêzîkekê, zarok û jin ê bêne desteserkirin û mîrên gihiştî jî wê bêne kuştin. Jixwe ya trajîk ev e.

Rewşenbîrên Yewnan ev xusûs baş ji hev derxistine û çîrokên herî trajîk ên serdemê yê klasîk nivîsandine. Destanên Sumeran jî heman çîrokên trajîk in. Lorîka Mirinê Ji bo Nîppûrê û Destana Lanetkirina Agadeyê mîna ku ji Bexdaya îro xeberê bide. Împaratoriya Persan jî xwedî heman nav û dengî ye. Nemaze rênedana ji bo pêşketina peravên Egeyê bi awayekî serbixwe, yek ji trajediyên dîrokî ye. Piştî Skender heman mentiqê şaristaniyê mîna gundorekî di ser moriyan re derbas bibe bi kar aniyê. Xwedatî-qraliyet her tim ji bo mirovan mîna moriyan bipelixîne navnîşanek e. Hin bûyerên bi vî rengî dibe ku di egoya hin mirovan de bi cih bibin. Ya Romayê di vî warî de kir, belkî ev mentiq bi tenê gihand xisleteke herî bi huner û hostatiyê. Her tim di ber singê xwe de rûniştin, vî mentiqî bi awayekî bêber her xwe dugêsinî kir, hovîtiyên destguhertinê, xwediyên berê yê tevî xizmetkarên xwe hatin tinekirin an jî mîna êsîrên kêrhatî hatin bikaranîn, ma ev çalakî guvaştina wijdanê mirovatiyê nîne çi ye?

Wexta ku dînen yekxwedayî bêne lêkolîn wê were dîtin ku bi zêhniyet û pratîkeke nû li ber rejimên şaristaniyê yê bi pûtperestî û pirrxwedayetiyê wekhev dihatin dîtin rabûne ku ev yek di dîrokê de yek ji pêşketinên herî manedar e. Herçiqas belavbûna hin şaristaniyan li ser hîmê van dînan devam kir jî diyar e, em bi bûyerên nû yê dîrokî re rûbirû ne. Em ê di bin sernavekî cuda de van gavavêtinên nû şîrove bikin.

e- Civaka Dewletparêz a Feodal – Civaka Koletiyê ya Stewiyayî

Pir girîng e ku mirov di dîrokê de dewletê wek zêhniyet û herikîna saziyan bibîne. Naxwe ku mirov dewletê, wek car ava dibe û car xira dibe, saziyek ji aliyê çîn û koman ve tê damezrandin û yan jî bi regekî dîmî û netewî tê avakirin bibîne, wê ev yekê me ji nêzîktirkirina rastiye wêdetir, bixe nav nertineke mijgîr û qetqetokî. Eger mirov dewletê wek saziyeke daîmî û têgîneke bingehîn a civakê binirxîne û wek “gulokeke berfê, gulokeke agir” ya her ku diçe mezin dibe, carnana dora xwe dişewitîne û carnana jî dicemidîne bibîne, bawer dikim wê ji bo hînkirinê bi kêr be. Dewlet, ji roja ku pêk hatiye û heta îro mezin bûye, rengên cuda wergirtine. Lê ji aliyê cewher û naveroka xwe ve neguheriye û navber nedaye meşa xwe. Ev rastiyeke welê ye, em nikarin behsa bêhndayînek wê ya du saniyan bikin. Eger navber û bêhnê bide, wê bikeve pêvajoya tinebûnê. Ev rewş dişibe veqetîna ruh ji bedenê. Yek saniye be jî wexta ruh ji beden derket, ew beden êdî nikare hebûna xwe devam bike. Piştî saniyeyeke din em nikarin bang li ruh bikin û bixin hundurê beden. Dewlet jî hebûnek wisa zindî ye. Pîrbûna reng û şewazên wê jî em dikarin bişibînin cureyên famîleyan. Ji heman famîlya heywan û nebatan gelek cureyên din dikarin bi hecmên cuda zêde bibin. Lê taybetiyên wan yê bingehîn wek xwe dimînin. Eger mirov behsa cureyên wê yê baş û xirab jî bike, li dijî heman şewazê ravekirinê nîne. Wexta Lenîn digot; “Li dijî dewleta bûrjûwa, dewleta proleter” bawer dikir ku tarîfeke rast û durust kiriye. Lê ya rastîn, wek formeke civakî, forma dewletê ya “proleter” nabe. Ji Spartakus vir ve, gelek kesî ceriband, lê hemû tewş bûn. Ceribandina Sowyetê bi xwe jî, tevî ku ji sê paran parek cîhanê zevt dikir, nekarî xwe ji hevdeketinê xilas bike. Emê sedemên vê yekê di beşê pêwendîdar de bi firehî rave bikin. Lê divê baş were zanîn, forma dewletê, şewazekî jiyane yê zordar û mêtîngeran e. Wisa hatiye avakirin. Çîneyetî û komên li mêtîngerî û zordariyê rast werin, formên wan yê azadî û wekhevîyê nabin. Cewherê wê vê yekê qebûl nake, şewazê wê jî li gorî wexevî û azadiyê nîne.

Guloka me ya agir û berfê ji Sumeran ve gindirî û her çû mezin bû. Gelek agahî îspat dikin ku mînakên Başûrê Emerîka û Çînê jî bi havênê ve modelê hilatine. Bêguman bi şert û mercên derdora xwe jî mezin bûne. Lê wek fikir û sazî, bi giranî çavkanî dewleta rahîb a Sumeran e. Dîsa sererast an jî ne sererast ji modela yezdanî re jî bûye çavkanî û ev bi giştî wek tespîteke zanistî tê pejirandin. Lêkolîna vê pêvajoyê, bi agahiyên ilmî, karê dîroknasî ye. Ya divê ku em bikin ev e; em cewherê mijarê zevt bikin, ruhê wê rast bixwînin û eşkere bikin. Modela koletiya seretayî ya dewletê ku ji Sumer û Misrê destpêkir, bi Hitît, Medya, Îran, Hînd, Çîn, Grek, Roma, Aztek û hê di astên jêr de, li zeman û mekanên cuda derket holê, mîna famîlyayekê mezin û pir bû û bi qonaxa forma feodaliyê stewiya û heta vê qonaxê, hewl daye biçizire û dawerive nav her şane û hucureya civaka xwezayî, gelek qad ji xwe re vekirine û karîbûye stûtewandin û mêtîngeriyê bike hunerekî muhtesem. Di bin navê “hunerê polîtîka û eskeriyê” de bi awayekî sistematîk, hunerê her cure kuştin, mêtîngerî û zordariyê hatiye afirandin. Ji bo vî hunerê xwe rewşa bike, serî li hunerên bingehîn mîtolojî, destan, beşek ji naveroka pirtûkên pîroz, peyker, resim û muzîkê daye.

Bêguman derketina van huneran bi destê çîna koledar nîne. Lê ya rastîn, baş tê zanîn, ji bo van huneran bixin xizmeta xwe meharet û hostatiyeke mezin nîşan dane. Hunerê wan ev bû; karîbûn zêhniyeta mirov ji binî ve veguherînin. Ev yek jî, bi amûrên maddî û manewî yên ku mirovatiyê bi keda hezarê salan afirandibûn, kirin. Sîstema koledar aliyê wê yê afirîner nebû, berovajî ji rê derxist û belovajî kir. Di vî warî de dubare bibe jî divê em balê bikişînin ser şîroveyan şaş ên di warê azadî û wekhevîyê de ku ev yekê her tim bibe wezîfeyek ji bo em erkên xwe yên azadî û wekhevîyê bi cih bînin.

Ka em bi kurtî careke din çavekî li saziya dewletê bigerînin ku heta em digihîjin qonaxa dewletê ya feodal. Qral-xwedayan Sumer û Misriyan, wexta dimirin, xizmetkarên jin û mêr, ji bo li wê dunya din jî ji wan re xizmetê bikin, bi saxî tevî xwe defin dikirin. Ji bo avakirina her qebreke xwe bi sed hezaran kes di asta mirinê de xebitandin. Ji bo zumreyeke piçûk kesên li hawîrdora îqtîdarê quncikek ji cennetê ava kirin û bi kesên din re danûstendineke ji kerî û heywanan wêdetir kirin. Klan, qebîle û saziyên din ên civakî yên li dijî koletiyê derketin, li siyaseta îmhayê qewimandin. Ji serê mirovan qesir û birc ava kirin, û ev yek wek karekî bi şan û şeref dîtin. Di nav civaka mirov de yekem car kuştina sîstematîk wek hunerekî xwezayî vedîtin. Bi awayekî serketî karîbûn jinê bixin qefesê. Hemû xeyalên xwezayî yên zarokan berbend kirin. Li ser navê azadiyê, mirov neçar kirin, li çolan, çîyan û di kûrahiya daristanan de bijîn. Ne tenê keda koleyan, her weha hemû bedana wan kirin amûrekî hilberandinê. Ji mejiyê analîtîk, li ser hîmê derewan mîtolojiyeye muhtesem pêk anîn. Wek mêtîngerî û zordariya efendiyan têrê nekiribe, rahîban jî cîhana manewî ya xwedayan a zordestî û mêtîngeriyê kirin îbadet û weke baweriyeke bingehîn di mejiyê mirovan de bi cih kirin. Ferz kirin ku exlaq û huner, timî pesnê wan bide û wan xweşik bide xuyakirin. Di şûna têgihîştina hawîrdora xweza û têgihîştina civaka mirov a gerdûna zindî de, têgihîştina mirov bi xwedayan li ezman û li bin erdê yên ceza û bêruh dikin, tijî kirin. Ji bo kulmeke efendiyan xela û tinebûn nebû, lê komên din timî di nav birçîbûn û nexweşiyê de digevizîn. Di şahiyên xwe de jî lîstikên tê de mirov dihatin kuştin esas digirtin.

Em vê tabloyê hê jî dikarin dewlemendtir bikin. Lê hinavê dewleta koledar bi vî awayî hatibû tijîkirin, ev bi hemû bermayî û bîranînan di hişê me de ye û li ber çavên me ne. Ji mezinê heta piçûkê, bê îstîsna, hemû cureyên dewletê yên di neqebên demê de hatine avakirin, tabloya me destnîşan kir, pêdiviyên wê bi cih anîne û heta lê zêde kirine, ev yek jî ji erk û wezîfeyên hunerê eskerî û polîtîk hesibandine. Eger em tenê kirinên împaratoriya Bîzans û Romayê rêz bikin, tabloya hovane ya derbîkeve holê û zehmetiyên aqil û wijdanê ti mirovê asayî ranake bi bîr bixîne, wê rastî hinekî din baş were fêmkirin. Wexta Pirtûka Pîroz rastiya dewleta koledar wek “Levîathan” bi nav kiriye, pir bi hostayî li hedefê xistiye.

Analîzkirina jihevketina forma civaka vê dewletê pêdiviyek mijara me nîne. Lê dîsa jî em dikarin bibêjin; qebileyên wek “barbar” têne bi navkirin û taybetiyên civaka xwezayî di xwe de dihevin, berxwedan û êrîşên wan ev civak ji hêzê xistiye. Wek navendên şaristaniyên koledariyê; li rojhilat Çîn, Hînd û Îran, li rojava împaratoriyan Roma; li bakur Germen, Hûn û Îskît, li rojava di serî de Ereb û Berberî, êrîş û berxwedanên gelek qebîle û qewmên bi navên cuda, kirin ku êdî nikarîbûn hebûna xwe dewam bikin. Di lîteraturiya koledariyê de ji van koman re “barbar” têne gotin, naxwe di cewherê xwe de ev kom herî zêde nêzî azadî û wekhevîyê ne. Lewra ya rast ev e; ev kom wek hêzên şoreşger ên dikarin rê li ber pêşketinan vebikin, werin bi navkirin. Serekên qewm û qebileyên dilê xwe dipijandin efendiyan, girîng e mirov serekan û girseyê ji hev bike. Di hundur de jî di serî de Xiristiyanî, Manîzm û Îslamê, bi giranî êkolên dînî yên bûbûn hêviya xizan û azadîxwazan, binê civaka koledar kolan û kirin ku nikaribe dewam bike. Her çend zehmet e em bibêjin ev êkolên dînî bi zanebûn xwe dispartin azadî-wekhevîyê jî, dîsa di cewherê wan de xwesteka xilashûna ji koletiyê êşkere xuya dike. Di nav vê êkolê de xilasî û xelasker têgînên berçav in. Navekî din ê Hz. Îsa “Mesîh-xilaskar” e. Manî bi xwe hawariyekî pir rengîn û aştxwaz e. Gotina Îslamiyê tê maneya “teslîmbûna aştiyê” Daxwazên bingehîn ên dibin sedema jihevketina sîstemê xilasî û aştiyê. Şewazê formulekirina daxwazan dînî ye, ev yek jî zêhniyeta wê demê ye. Lewra mirov dikare fêm bike, ka çima bi sînor rê li ber rizgarî û aştiyê vedikin.

Ev fêslêse, mezheb û êkolên gnostîk ku li ber siya împaratoriyan mezin bûn, bêguman hem ji aliyê zêhniyet, hem jî ji aliyê eskerî û polîtîk ve ketine bin bandora sîstemê. Wê careke din koletiya klasîk ava nekin. Ji ber ku bi şîdet lanet lê anîne û baş wê nas dikin. Lê nizanin wê di

şûnê de çi û çawa ava bikin. Jixwe gelek kesayetên ku sîstema koletiyê di asta huner de pejrindibûn, wê bi hêsayî karibin siyaseten van dînan qebûl bikin û ji bo daxwaziyên xwe bikin zemînekî rewa. Ji lewra Konstantînê mezin PZ di sala 312 de Xirîstiyaniyê qebûl dike, pêre dikeve Romayê, xwe împarator îlan dike û paytexta wê dibe Stenbola îro. Di sala 325an de jî Xirîstiyaniyê wek dînî fermî îlan dike. Yê bi qasî sêsed salî li dijî sîstema koledar şer kirin, bi sîstema koledar a dînî re li hev kirin. Manî bi xwe wê bikeve bin dawa duyemîn împaratorê mezin ê xanedaniya Sasaniyan Şahpûr. Hz. Mûhammed ku hê zêdetir radîkal e, wê karibe bi teolojiya Cihû û Xirîstiyaniyê li ser mîrateya împaratoriya Bîzans û Persan hîmê sîstema xwe deyne. Gişê wan, wê bi zanebûn li dijî sîstema koledariya klasîk têbikoşin û wê karibin vê sîstemê li dawiyê bihêlin. Lê qalibên ku bi giştî dikevinê, qalibên dewleta rahîbên Sumeran vedîtibûn. Lê wê van qaliban hinekî din nerm bikin, ji bo mirovatî karibe xwe li wan rabigire. Naxwe hîç nayê hişê wan bi şertên nû civaka xwezayî nû bikin, heta wê vê sîstemê ji sîstema koledariyê zêdetir bi “pûtperestiyê” mehkûm bikin. Rastiya dewletê ya nû ku bi van aliyên xwe derdikeve pêşiya me, eşkere xuya dike ku dewleta kevin e reng guhertiye. Komên barbar ên hê nêzî civaka xwezabûn, bi saya şefên xwe yê zû de bi sîstema koledariyê şerefdar bûne, ewê jî bi formeke nû ya dewletê razî bibin. Ev pêvajoya ku di dîroka mirovatiyê de serûbinbûneke mezin îfade dike, PZ di navbera sedsalên 5. û 6. de diqewime. Pêvajoyeke din mîna vê, BZ di navbera sedsalên 6. û 5. de li dijî koledariya klasîk diqewime. Di vê pêvajoyê de dîn û ekolên felsefîk û exlaqî yê Sokrates, Zerduşt, Konfuçyûs û Bûda hene. Di encamê de sîstemên civakî yê Grek, Roma, Hînd û Çînê formên hê pêşketî afirandin.

Marksîzm ji bo pêşketinê dîrokî yê bi vî rengî, rola diyarker dide amûrên hilberandinê û têkiliyên di navbera wan de û roleke duyemîn dide şerê zêhniyetê. Dîsa giraniyê nade têkoşîna komên olî û etnîsteyê. Wek şîroveya dogmatîk a rêbaza diyalektîkê, bi vî awayî mirov nikare bi tevahî li dîrokê serwext bibe. Mirov heta tevgerên mezin ên siyasî û zêhnî yê civakê nebîne, şîroveyeke di çarçoveya sînorên aboriyê de wê kêmbimîne. Eger maneya tevgerên mezin ên koman neyê dîtin û wek hêza veguherînê teknîk û hilberandin were bilêvkirin, dibe ku bêyî hay jê hebe di çarçoveya dewletê de asê bimîne. Eger tevgerên mezin ên etnîsteyan – rastiya qebîle, eşîr û qewman – ji hev neyê derxistin û dîrok were şîrovekirin, heye ku hem di warê rêbazê, hem naverokê de şaşiyên mezin bêne kirin. Şîroveyên dîrokê bi rêbazên Marksîst bi sedema vê rastiyeke sîdmend nînin û rê li ber şaşiyên girîng vedikin. Em, ji bo ku îdealîzma pesnê civaka jor a kevneşop dide li dawiyê bihêlin, hewce nîne em berovajî, dîrokê bi nerîneke teng a çînî û aborî analîz bikin. Yanî pêwîst nîne em meteryalîzmeke hişk wek rêbaz bi kar bînin.

Pirsgirêkeke din a civakî dîrokî ku divê were zelalkirin ev e; gelo wexta em dibêjin; “dema buhurî li dawiyê ma” em çi fêhm dikin? Li gorî qanûna pêşketinê ya bi veguherîna xwezayê û di biyolojiyê de bi tekamuliyet îspat bûye ku rastiyeke berê, hebûna xwe di ya piştî xwe de dewam dike. Mînak, wexta atomeke hîdrojenê dibe cot werdigere helyûmê, lê hîdrojen hebûna xwe di nav helyûmê de dewam dike. Eger atoma helyûmê were parçekirin, hîdrojen ji nû ve derdikeve holê. Lê ev veguherîn ji bo helyûmê cuda ye û dibe rastiyeke din. Di biyolojiyê de suwarbûna xelean li hevdu pêvajoyeke bi heman rengî ye. Ya berê di ya piştî xwe de veşartîye. Di civakê de jî guhertinê bi vî rengî hene. Civaka jor, civaka jêr di hinavê xwe de hildigire, lê berovajiyê wê rast nîne. Civaka jêr, civaka jor di hinavê xwe de hîlnagire. Ji ber ku rastiyeke nû nîne. Ji lewra, di encama êrîşên der ve û hundur de li sîstema koledariyê hatin kirin, civaka feodal bi barê nû yê hilgirtî, reng da xwe. Di hinavê xwe de gelek nîrxên sîstema koledar dihewîne. Bi awayên berê najîn, di encama sentezekê de bi nîrxên nû û bi formên nû dijîn. Ji holê ranebûne, bi reng û awayên xwe yê guhertî dijîn. Jixwe sîstema koledar a Romayê bi xwîna teze ya barbaran û Xirîstiyanan karibû di xwe de hêza nûbûnê bibîne. Ji bo mirov di nav diyalektîka dogmatîk de nefetise û bûyerên dîrokî rast şîrove bike, divê mirov vê rêbazê bi kar bîne.

Li dijî civaka xwezayî, sîstema civaka feodal jî veguherîna zêhnî kûrtir dike. Bi rêya mejiyê analîtîk gavên mezin diavêje. Şêwazê fikrê hem ê felsefî, hem jî yê dînî, zêhniyeta civaka serdest a nû pêk tîne. Her du awayên fikrê jî li ser hêmanên civaka berê yê vediguherin, serdestiyê bi dest dixin. Wek civaka Sumer çawa nîrxên civaka neolotîk ji bo sîstema xwe ya nû sentez kir, civaka feodal jî hem ji hundurê sîstema berê û hem jî ji derveyî wê, nîrxên çînên bindest û nîrxên manewî yê etnîsteyan li ber xwe dida sentez kiriye. Di vê pêvajoyê de herikîna pratîkê diyarker e. Bi gotîneke din, pratîk dibe hêzeke ku hebûnê dide demê. Dem êdî pratîk pêk hatiye. Zêhniyet

taybetiyên xwe yên mîtolojîk bi têtînen felsefî û dînî nû dike. Hêza împaratoriye ya mezin dibe, di şûna pir-xwedayên qels û bêhêz de, ber bi xwedayekî mezin ê ku gerdûnê temsîl dike ve diberide. Bûyerên di jiyana maddî de diqewimin di zêhniyetê de jî bersiva xwe dibînin. Yek ya din xurt dike. Di vê pêvajoyê de pirxweda cihê xwe ji xwedayekî bi tenê re dihêlin. Pratîka dewletê ya hezar salan êdî têtîna qral-xwedê rizandiye. Bi taybetî senteza Rojava-Rojhilat a bi Îskender destpêkir, bi vê maneyê qonaxeke girîng e. Îskenderê bi zêhniyeta Arîsto mezin bûbû, bi tevahî li fikra qral-xwedê hayil bûbû. Îskender bi xwe, bi derdora xwe û bûyernivîsên xwe dida hiskirin ku fikra qral-xwedê li hev çêkiriye. Tevî vê yekê, ji bo otorîteya xwe biparêze, ew jî dewam dike, vê fikrê bi kar tîne û xwedabûyîna xwe dide îlankirin. Xwedabûna xwe bi darê zorê, bi Atîna ya li ber xwe dide, dide erêkirin. Di serdema împaratorên Roma de kulta qral-xwedê êdî di dema xwe ya dawî de ye. Wexta împarator dimirin, digotin; “derket qatê xwedê”, bi vê yekê jî êşkere dibû ku êdî hêdî hêdî ev kult li dawiyê dima.

Eqîdeya xwedê ya teslîs – kur, bav, ruhê pîroz – a Hz. Îsa di dîrokê de bû sedema çelqîn û germoleyan mezin. Şoreşa zêhniyetê ya bi Îsa destpêkir pêşketineke mezin e. Pêvajoya derbasbûnê ya di navbera qral-xweda û însan-qralan de pêk tîne. Qralan heta wê rojê xwe wek xwedê nîşan dabûn û Hz. Îsa jî di bin vê bandorê de dilê xwe bijandibû qraliyeta Qudsê, lewra xwedê nebe jî wek kurê xwedê tevdigere. Ya rastîn, têtîna kurê xwedê ya di pirtûka pîroz de xwediyê maneyeke kûr a sosyolojîk e. Di şûna xwedê de kurê xwedê pêşketineke nû ye. Ruhê pîroz jî tê maneya zurriyeta xwedê.

Hz. Îsa ku di nav zêhniyeta demê de derket, ya esas hewl dide tevgereke reformê biceribîne. Lewra hem di dînê Cihûyan de, hem di kulta Romayê de rê li ber cihêrengbûnê vedike. Ji ber ku hewldana Îsa li gorî demê xwedî taybetiyên şoreşgerane bû, hem qraliyeta Yahûda, hem bi hevkarîya waliyê Romayê, ew li çarmîxê xistin. Girseyên mezin ên bêkar û xizanan ku wê demê pir bûne, oldar û karmendên dewletê yên asta jêr, eleqeyê nîşanî Îsa didin. Jixwe Hz. Îsa di nav rojekê de dernakeve. Bi terîqeta wê demê ya girîng “Esseniyan” re di nav têtîliyê de ye. Dîsa ji Hz. Yehya ku wek peyxember tê zikirkirin, xelîfetiye werdigire. Berî ku Îsa li çarmîxê were xistin, serê Yehya tê jêkirin. Di vê demê de girseya bêkar û xizan her mezin dibe. Bi kurtî, sistema koledar di nav krîzeke mezin de ye. Şoreşa zêhniyetê ya bi awayê Xirîstiyani, encama beridandin û tekamula sedsalan e. Bi awayekî, dişibe tevgerên serdema nêz ên Marksîst, Sosyal Demokrat û Sosyalîstan. Xirîstiyani li ser rêya Romayê dimeşe û wek siya wê tevdigere, belav dibe. Mirov dikare, vê tevgerê di dîrokê de wek yekemîn partiya xizanan a herî mezin jî bibîne. Ne etnîsîte, humanîzm esas wergirtiye. Bi vî aliyê xwe, li pey kozmopolîtîzma Romayê çûye. Îdîaya wan a berxwedanê ya herî girîng li dijî împaratorê Romayê ev bû; digotin, “împarator nikare bibe xwedê.” Xwedayê bav û kurê wî Hz. Îsa heye. Di vê hevokê de ya esas ew e ku zêhniyeta împaratoriya Romayê ji hev were derxistin. Şerê dînî xuya dike, di esasê xwe de şerekî siyasî ye. Di serî de şagirtên –hewariyên – Îsa, bi fedekariya gelek ezîz û ezîzeyan, rahîb û rahîbeyan, zêhniyeta manewî ya Romayê tê fetihkirin. Bi Konstantîna mezin fetha siyasî tamam dibe. Xirîstiyani, êdî îdeolojiya fermî ya dewleta nû, ya Bîzansê ye. Ji serî heta dawiyê şerekî dijwar ê mezhebbûyîne jiyaye. Ev hevrikî heta îro jî dewam dike. Di cewherê dabaşê de şerê berjewendiyên çîn û etnîkên cuda heye.

Tê destnîşankirin ku Xirîstiyani wek mezhebekî Mûseviyetê pêş ketiye, Mûseviyet jî ji kevneşopiya peyxemberiya serhildêr a li dijî qral-xwedayên Sumer û Misriyan tê ku ew jî çavkaniya xwe kevneşopiya peyxember Îbrahîm e, bi Hz. Mûsa gav diavêje, piştî xelekên mezin ên mîna Dawût û Îşa wek tê gotin bi Hz. Îsa dewam dike û teolojî bi vî rengî têra xwe li ser vê mijarê radiwest e. Mezhebekî dawî yê vê kevneşopiyê jî wê bibe Îslam.

Tevgerên peyxembertiyê, tevî ku aliyê wan ê zêhniyetê li pêştir e, aliyê wan ê civakî siyasî jî xurt e. Qral-xwedayên arkaîk li dijî koletiyê li sistemeke nermtir û mirov karibin xwe lê rabigirin, digeriyan. Pir zêde ketine bin tesîra mîtolojiyên Sumer û Misriyan. Lê têtîhiştina xwedê û hûnandina mîtolojiyan, bi tesîra demê re wek moda wan derbas bûye, nirxandine. Dibînin ku koletiya arkaîk bi rengê heyî nabe dewam bike û mirov nikarin xwe lê rabigirin. Her weha armanc heye derfet û îmkân werin amadekirin ji bo bazirgan û pîşesaz karibin ber xwe bibînin û bi awayekî xweser çînayetiya xwe pêş de bibin. Ji bo vê yekê jî, pêdiviya xwe ya îdeolojîk ji mîtolojiyên berê tedarik dikin. Ji ber ku ji tebeqeyên jêr ên bajêr tînen, di nav civaka xwezayî ya derveyî bajêr de cih nabînin. Dişibin bûrjûwaziya piçûk a roja me ya îro. Ji ber şert û mercên jê

tên, bi awayekî xwezayî xwediyê îdeolojiyê serbixwe nînin. Dibe ku îdeolojiyê wan a pevzeliqandî hebe. Zêhniyeta wan wek ji awayekî îdeolojiya çîna navîn be. Îdeolojiyê hem ji tebeqeya jor, hem ji tebeqeya jêr girtine. Karîbûne têtîngên azadî û wekhevîyê yên komên etnîk ên çîna jêr û têtîngên rêveberiyê yên çîna jor a rêveber bi hev bikin û kevneşopîya zihniyeta xwe, çandeke cihêreng biafirînin.

Versiyona kevneşopiyê Îslam, hê zêdetir cih dide mejiyê analîtîk. Ji îddîaya qral-xwedê bi tevahî qut bûye. Hz. Îsa ne wek kurê xwedê, wek peyxemberekî, qasidekî xwedê rave dike. Cudahiya di navbera Însan û xwedê de pir bi hostayî têtîngên destnîşnakirin. Îddîaya bingehîn a pirtûka pîroz Quranê ew e ku têtîngên xwedê gerdûnî ye. Xwedê pir mucered têtîngên teswîrkirin. Weke ku enerjîya gerdûnê têtîngên fêmkirin. Aliyê vêtîngên yê zêde derdikeve pêş, têtîngên wê ya bi rastiya civakê re ye. Di navbera dewleta navendî ya mucered dibe û xwedayê mucered ê tenê de têtîngên xurt heye. Bi pêşketina têtîngên "El" têtîngên "Allah" têtîngên xwe xurt bûye. Ya esas, teolojiya Sumer gihîştîye qonaxa xwe ya dawî. Çîroka xwedayan a wek hebûnên mîtolojîk dest pê kir, bi Allahê ku her gotina wî fermana mutleq e bi dawî dibe. Wexta mirov bi vî awayî li gotina Hz. Mûhammed a "peyxemberê dawî" binere, têtîngên fêmkirin. Mîtolojiya Sumeran hundurê wê wer têtîngên pûçkirin, êdî wê ji bo dînen nû neyê bi karanîn. Metafizîka serdemê wê were pêşdebirin. Ji ber pratîka zêde ya civakê, xweza pirtir têtîngên naskirin û dest pê dike, pêvajoyên xwezayî bi awayekî îlmî têtîngên tarîfkirin. Lewra zêhniyeta sîstema feodal êdî digihîje wê qonaxê ku bibêje; "karê dunyayê cudane, karê dîni cudane." Ji bo zêhniyeta mirovatîyê têtîngên "qasidên xwedê yên li rûyê zemîn û siya xwedê ya li rûyê zemîn" xweştir têtîngên. Zehmet e, mirov bawer bikin însan dibe xwedê. Hemû dînen pêşketî encama gihîştinê ew e ku xweda nabe mirov û mirov jî nabe xwedê. Êdî xwezayê bi têtîngên yezdanî neyê ravekirin, ewê bi têtîngên eqlî bê tarîfkirin. Jiyana dunyawî û uxrewî wê bi tevahî ji hev werin cihêkirin. Lê belê dîsa jî têtîngên xurt a xwedayekî ku bersiva emelên qenc û xirab dide, hemû tevgerên mirov kontrol dike, heye. Ya esas, saziya dewletê ya navendî dibe û têtîngên xwedayê mucered zêde zêde dikevin zixevdu.

Hegel, di sedsala 19. de wexta digot; "dewlet cismê xweda yê li rûyê zemîn e" pir eşkere bal dikîşand ser vêtîngên. Di navbera dewleta navendî ya xwe ji qralên şexsî qut û muceredkirî û têtîngên yek xwedayê navendî yê xwe ji pir xwedayan qut û muceredkirî de têtîngên xurt heye. Li gorî vêtîngên, çî Xirîstîyanî, çî Îslam teoriyê dewleta navendî pêş de dibin. Ji lewra, Hz. Mûhammed hê sax bû dewleta Îslamê û teoriya dewleta xwedê ya papatîyê pêk hatin.

Zêhniyeta feodal di gelek mijaran de têtîngên xwe yê nû kirin û dogmayên wê bi mîtolojiya berê, felsefe û exlaqê Zerdûşt û Yewnan di nav hev de ne. Ji her sêyan jî bijartine û bi hev kirine. Ji taswîrên cennet-cehennemê heta têtîngên li gerdûnê, ji kiryarên qenc-xirab heta hûnandina teswîrên cin-melekan, gelek awayên îbadetê û rêzîkên huqûqê çavkaniyên wê yên bingehîn mîtolojiya Sumer, felsefeya Grek û exlaqê Zerdûşt ê azadiyê ye. Ev zêhniyet, PZ ji sedsala 4. heta sedsala 15. roleke sereke ya îdeolojîk dilîze. Li qadên bingehîn ên şarîstaniyê serdestiya xwe dewam dike. Di serî de Ewrûpa li hemû parzemînan belav dibe. Lê di sedsala 15. de bi destpêkirina Ronasê re pêvajoya şoreşê nû ya zêhniyetê dest pê dike û êdî zêhniyeta feodal dikeve pêvajoya paşveketinê. Lê mirov nikare bibêje; ev zêhniyeta serdema navîn bi tevahî li dawiyê hatiye hîştin. Di serî de Rojhilata Navîn, li gelek deveran bi pir rengên cuda, ji bo hebûna xwe dewam bike, hewl dide.

Civaka dewletparêz a feodal di warê sazîbûna eskerî û siyasî de jî ketiye qonaxê gihîştî û stewiyayî. Dewlet heta dawiyê ji xwe piştrast e. Li rûyê zemîn hebûna xwedê ya herî pîroz e. Eskerên wê cengawerên xwedê ne. Maskeya pîrozbûnê pir baş li rûyê wê rûniştîye. Hêza yekemîn polîtîk, ya duyemîn nûnerê dîni, ya sêyemîn esker, ya çaremîn jî burokrasî ye. Saziyên bingehîn ên dewletê cihê xwe baş girtine. Xanedanên têtîngên derbas dibin, lê ji sazîbûna dewletê ti tişt kêr nabe. Ya esas ne xanedan, sazî ne. Ji bo kesan jî heman tişt derbas dibe. Rûyê zemîn, dîsa wek milkekî xwedê yê ji hukumdaran re beşandîye têtîngên. Yên ebd divê bi vêtîngên bin û heta şikir bikin. Mora pîrozbûnê li şeran hatiye xistin. Şer li ser navê nîzama yezdanî têtîngên kirin. Tevî ku bi navê azadî û wekhevîyê radibin û bang li hemû mirovatîyê dikin, xenîmet û xûkîgirtin saziyên binehîn ên mêtîngeriyê ne. Bi vî aliyê xwe, koletîya klasîk dewam dike. Artêşên wê zêdetir bi rêkûpêk û bi awayekî domdar bibin dihatin amadekirin. Ji saziya şervanên berdest, ji zû ve artêş hatiye damezrandin. Sîstemên Pers, Helen û Romayê esas hatine girtin û artêşên herî

mezin û xurt hatine amadekirin. Suwar û şûr simbolên artêşa vê serdemê ne. Saziya şovalyetiyê bi hemû heybeta xwe di vê serdemê de dijî.

Burokrasî gihîştîye sazîbûnê. Statuya karmend û wezîran hatiye destnîşankirin. Eskerî û îlmiye ji hev hatine kirin. Bac stendin li ser hîmên tîkûz hatiye danîn. Saziya ragihandin û îstixbaratê baş belav bûye.

Şer şeweyekî hilberandin û debarê tê dîtin. Sefer û fetîh çavkaniyên karê ne. Zevtkirina erdên nû, tê maneya berhemekî nû yê zêde. Dewleta herî xurt, dewleta herî baş şer dike û zevt dike. Debara bi xwîn û mêtîngîyê sînor nas nake. Şerê li ser navê xwedê êdî tenê dikare bi zevtkirina hemû dunyayê bi dawî bibe. Ev jî tê maneya, cîhadeke bê dawî û gerdûnî. Sîstema dewletparêz êdî ji vê zêdetir nikare pêş de biçê û ji vê zêdetir nikare bistewe. Êdî gihîştîye qonaxa dawî ya mezinbûnê. Yanî saziyên dewletê di nav pêvajoya dîrokî de gihîştine qonaxa stewînê. Pêvajoyeke piştî vê, dibe ku êdî rewşa krîzê be.

Di jiyana civakî de ebdiyet wek rewşek xwezayî ya xwedê dabe tê hesibandin. Gotina ebdiyetê kes dema ji dayika xwe dibe pê re heye, ne tişteke ku pişt re digire. Mirov ebd tê dinê û dimire. Ji bilî ebdiyetê şeweyekî din ê jiyane nayê fikirîn. Xwedayekî bi tenê heye û ebdên wî hene. Melek û peyxemberên di navberê de jî qasid in, fermanan tînin. Eger em van tespîtan bi zimanê sosyolojîk bibêjin; xwedê otorîteya mucered a dewletê ya bûyî sazî temsîl dike. Melek artêşa karmendan, peyxember û melekên sereke wezîran û burokrasiya jor simbolîze dikin. Civak bi sîstemeke simbolan a xeternak tê birêvebirin. Di navbera rêveberiya simbolan û rêveberiya xuya dike de, tîkiliyeke xurt heye. Heta tîkiliya di navbera rêveberiya simbol û rêveberiya berçav de ji hev neyê derxistin, em bi awayekî durust nikarin li civakê serwext bibin. Eger em dixwazin li rêveberiya berçav a civakê serwext bibin, divê em perdeya li ser panteonê – sîstema xwedê – rakin. Wê demê, wê baş were dîtin ku bi hezar salan di bin navê qûtsiyetê de rûyê kirêt û zalim ên mêtînger û zordaran hatiye veşartin.

Ebdiyeta civakî tenê rastiyeke çînî nîne. Ji bilî despotan – ku ew jî di destê sîstemê de dîl in – her kes, hemû tebeke û çînên civakî pê ve hatine girêdan. Ji sîstema koledariyê kûrtir, nîzamekî stûxwarkirinê ya veşartî heye. Çendîn nerm dike ew çend jî sîstem kûr dibe. Paradigmaya bîngêhîn a civakê, sîstemeke ebdiyetê ya pêşî û paşê wê nîne. Ev nîzamekî ji ezel heta ebed – ev her du tîgîn zêdetir ên serdema dewleta stewiyayî ne – wek heyî dewam bike. Cihê guherîn û îmtîhanê dunya din e. Lewra dijderketina sîstemê ne tenê emelî, her weha rûhî û fikrî jî gunekî herî mezin e. Ebdiyeta mezin, ji bo kesê bizanibe îtîd bike fazîlet û payeberziyeke mezin bû. Kesên afirîner ên di civaka xwezayî û serdema hiyarereşîk a erênî ya serdema qehremaniyê de ji civakê re baş xizmet dikirin, di serdema ebdiyetê de li hemberî xwedê – efendiyan – wek kesên herî xeter, gunehkar û wek kesayetên şeytanî yê divê werin cezakirin, tîne lanetkîrin. Tîgîna şeytaniyê ji bo koma mirovên ebdiyetê red dikin hatiye bi kar anîn. Ev tîgîna ku koka wê ji Rojhilata Navîn e, ji bo komên mirovan ên bi sîstemê re nabin yek, tê bi kar anîn. Ji ber vê yekê ye, ji komên Kurdan re yê ku ji kevneşopiya civaka xweza qut nebûne dibêjin; “şeytanperest”. Ev beşê Kurdan ê şeytan dihebîne û pîroz dike watedar e.

Li gorî sîstema ebdiyetê ya di serdema xwe ya stewiyayî de dunya cihekî wisa ye her kîlî dibe ku guneh lê bibe. Lewra reveke mezin ji jiyane heye. Çiqas xwesteka te ya jiyane hebe, tu ew çend dikevî guneh. Jiyana herî baş ew e ku tu bi her tiştê xwe ji mirinê re xwe amade bikî. Xwediyê vê helwestê xwezayê wek miriyekî ku divê mirov nêzîk lê nebe dibîne û yekser afirandinê bêîmkan dike. Ji bo ebdan xwezaya zindî nayê fikirîn. Ya rastîn di derketina vê sîstematîkê de şopên zordarî û mêtîngîyeyeke xeter hene. Eger îro jî civaka Rojhilata Navîn nikare bi ser xwe ve were, sedemê bîngêhîn ê rûhî, ev helwest e, em behsa wê dikin. Li aliyê din, ji bo efendiyan, li ser rûyê zemîn, cîhaneke rengîn a ji cennetê ne kêr heye. Ew û xwedayên xwe – Reb – yê bi heman navî – tîgînen rêveberiyê – gelekî xweşhal û razî, jiyana xwe mîna “çîrokên hezar şevan” dijîn. Çîrokên hezar û şevkî, sîstema dewleta stewiyayî ya serdema navîn, bi awayekî mîtolojîk îfade dike.

Di rewşa jinê ya qefesê de tenê di warê deng û xemlê de hin pêşketin hene. Di asteke dûrî aqilan de koletî kûr bûye, û veşartî ye. Jina serdema navîn, ji aliyê civaka cinsiyetparêz ve cara duyemîn di warê çandê de tê şikandin. Em şikestina yekemîn a jinê di warê çandî de, di qonaxa derketina dewleta koledar de, di rewşa xwedawend Înanna-Îştîr, şikestina çandî ya sîstema stewiyayî di warê jinê de mînaka wê, xuşka Mûsa Mariam û di mînaka dayika Hz. Îsa Meryem,

jina Hz. Mûhammed Eyşe de bi awayekî balkêş dibînin. Êdî ti şopên xwedawendiyê nemane, her weha cihê jinê yê tê fikirîn nêzî şeytên e. Nerazîbûneke wê ya herî piçûk dikare wê bike şeytan. Her kêlî dibe ku ruhê xwe bifiroşe şeytên. Dikare mêr ji rê derbixîne. Rewşa wê ya pîrasêr û sihêrbazî şewitandina wê ferz dike. Zarokên keçik bi saxî têne binaxkirin; bi awayekî cinsî mêran ji rê derdixîne; girseyeke mezin bi keviran jinê dikuje. Bi vî awayî çandê kuştinê pêk tê. Di civakê de koletiya herî kûr a bi hezarê salan e daweriviye heta roja me ya îro. Êdî wer giran bûye ji binî derketin zehmet bûye. Eger em dixwazin asta koletiyê ya sîstemê fêhm bikin, divê em mijara jinê analîz bikin. Qulp, xelek, qelen, xemil û xêzên bi jinê ve hatine kirin çanda koletiyê îfade dikin. Mîna ku zimanê wê hatibe jêkirin bêhiş û bêmeji hatiye kirin. Bûye dayikeke zûha ya mîna zewiyekî ku mêr kengî bixwazin dajon. Êdî ew di civakê de kirdar nîne, tenê eşyayek e. Ji xwedawendiya civaka xwezayî ti eser û nîşane nemaye. Ji jina rêveber a zana ya ciwan û zarokan, ji jina mêr li dorê dizîzikîn ti nîşane nemaye.

Rewşa zarok û ciwanan jî zêdetir dişibe ya jinê. Nîzama giştî ya ebdiyetê, zarokê xwezayî yê hîne nabe heft salî zevt dike. Ciwanê nû digihîje, ji aliyê sîstemê ve bi rêbazên perwerdê yê awarte, kesayeteke mîna berxikan diafirîne. Hemû tevgerên wî ji berê ve têne destnîşankirin. Bi gotinan be jî nikare azadiyê bifikire.

Em dikarin bibêjin di vê serdemê de civak bi tevahî ji aliyê rûhî û fikrî ve hatiye pûçkirin. Tenê dengê civaka jor a bi “Ella, nal û şûran” dike gurîn û xumîn heye. Hemû destan li ser dramatikeye zevtkirin û kuştinê hatine avakirin. Belkî ev tablo hinekî zêde hat mezinkirin, lê rastiya rûhî ya serdemê bi awayekî guncaw îfade dike. Di şûna koletiya arkaîk de sîstema koletiya klasîk rûniştîye. Civak û dewleta temsîl dike, di asta jor de serdema xwe ya stewiyayî dijî. Ji bo sîstemê hemû sazî û têgîn hatine avakirin. Mizgeft, dêr û hawra, her roj bi naqoz û azanan, pîrozbûna sîstemê îlan dikin. Ji vir û pêve dewleta pêş de bikeve dewleta kapîtalîst e. Her çend dewleta kapîtalîst bi hêz xuya bike jî, di cewherê xwe de wê qonaxa dawî ya civak dikeve krîza giştî îfade bike. Wek tê zanîn di serdemên herî bi heybet de pêvajoya ji hevdeketinê bi krîzokan e. Ev qanûna giştî ya xwezayê ji bo pêvajoyên civakî jî têra xwe tê qebûl kirin.

Hin têgînên din ên serdema navîn wek serftî, gund û bajêr, me zêde bi kar neanîn. Ji ber ku encam û rêbaza bi navê “analîza çînan” tê zanîn me dubare nekir. Bêguman bi vê rêbazê jî mirov dikare gelek rastiyan eşkere bike. Serf, gundî, bazîrgan, bajarî, pîşesaz, kesên bi huner û ilim re mijûl dibin, mirov dikare van beşên civakê wek têgîn bi kar bîne. Ax wek amûrê hilberandinê û têkiliyên mulkiyete yê li ser axê pêk tînin, hewce ye bi huqûqa pêş dikeve, bi firehî were nixandin. Ax amûrekî girîng ê hilberandinê ye, şer û pevçûn li ser axê bûne, lewra divê bi girîngî were destnîşankirin ku çîna navîn hêzê bi dest dixê û dikare di pêşketina civakî de roleke esasî bilîze. Lê ji ber ku armanca me tarîfkirina giştî ya dewletê ye, em tenê li ser xetên sereke û beşên tabloyê eleqeder dikin, rawestiyên.

Sîstema dewleta koledar a serdema navîn, sedemên bingehîn ên rê li ber jihevketina wê vekirin, sedemên hundurîn bûn. Ji bo jihevketina wê, hewceyî ne bi êrîşên nû yê etnîk, ne jî hewceyî bi dînên nû yê hundurîn hebû. Ji bo jihevketinê têra xwe potansiyelên hundurîn stewiyabûn. Asta jor a etnîsîteyê ku di nav sînorên dewletê de hatibûn hewandin, beşê navîn ê bûrjûwaziya nû mezin dibû, beşên serhildêr ên qewmên cuda û mezhebên dînî ku hêzên bingehîn bûn, wê li dijî monarşiya wek dewleta mutleq dihat fikirîn, serî rakin. Tevgera etnîsîteyê ya bi daxwaza dewleta netewî rabû, bi daxwaza sînorên netewî ya bûrjûwaziya bazîrgan û çîna navîn a bajêr re li hev kirin. Vê yekê bi xwe re qonaxeke dîrokî ya veguherînê anî û rê li ber derketina dewletên netewî û civaka kapîtalîzmê vekir. Ev pêvajoya PZ di sedsala 15. de destpêkir û heta roja me ya îro hat, wek dewlet, qonaxa dawî ya civaka jor temsîl dike. Bi zêhniyet û asta xwe ya teknîkê, wê karibe hûr bikole. Êdî ji bo civakê şewazê dewletê – herî kême wek şeweyê klasîk û arkaîk – hewce nabîne û wek kelemên sazîbûnê dibîne.